YE - TIRKIYE / PÊVAJOYA ENDAMETİYÊ Û PİRSGİRÊKA KURD · Prof. Dr. Gülistan Gürbey · ▶ 11

Kurd li ser bircên Newroz'ê
Faysal Dağlı · ▶ 2

Li İraq'ê şerê ereb û kurdan
Joost R. Hiltermann · ▶ 20

LE MONDE diplomatique kurdî

Almanya: 3,50 Euro
Welatên din: 4,00 Euro

Adar 2010 - Hejmar 5 www.lemondediplo-kurdi.com · info@lemondediplo-kurdi.com 32 Rûpel

Hertişt ji bo Goldman Sach e!

Serge Halimi

Dewletan banqe rizgar kirin, beyî ku berdêla wê bixwazin. Banqeyan jî hêza xwe ya berê ku li hember dewletan bi kar dianî ji nû ve bi dest xist. Niha jî, ji ber derdê ku wan bi xwe anîbû serê wan, dewletan tengezar dikin. Lewre, gava ku krediya fermî kêm dibe, faîza deynan bilind dibe…

Goldman Sachs'ê alîkariya Yûnanistan'ê kir ku bi dizî bi milyaran euro deyn bike (1). Bi dû re, bi armanca ku bi zagonên ewrûpî ku sînorê deynên fermî datanîn bilîzin, şîrketa Wall Street'ê ew şîret da Atîna'yê ku bikeve nava karine ecêb yên muhasebe û aboriyê. Fatûre ya van karan bi dû re deynê yûnanî yê nepixî nerm bike. Kî qenzec dike, kî heqê wê dide? Birêvebirê Goldman Sach'ê, Lloyd Craig Blankfein bonûseke 9 milyon dolarî kar kiriye; karmendên yûnanî wê ji ber vê, beranberê maaşekî xwe ji maaşê salane wenda bikin.

Dewletek, ji ber ku piçekî dişibe banqeyan, "ji bo topavêtinê zêde mezin e." Mirov dikare alîkariya wê jî bike, lê belê, ji bow ê, berdêla vê rizgariyê wê buha be. Ji xwe, birêvebirê Banqeya Ewrûpa'yê ya Navendî, Jean-Claude Trichet li hember Atîna'yê gellekî tûnd e û dezgeha wî hindik maye ku zexeliyên ku Wall Street'ê di vî warî de kirine kişf bike. Birêz Trichet da zanîn ku Yûnanistan divê bi "ciddiyeteke mezin" a herî bilind vê "rêka bêwate" sererast bike. Di bin "çavdêriya xurt û hema hema daîmî" ya Yekîtiya Ewrûpa'yê de, yanî bi terikandina desthilatdariya xwe ya aborî, divê ziyana xwe ya bruta alavên navendî (BAN) ku sala 2009'an % 12.7 bû heta sala 2012'an bigihîne % 3'an. Wergirtina deh pûanên BAN'ê li ser hesabê butçeyê lu tu deveran nehatiye dîtin, bi taybetî jî li herêmeke weha ku pêşketina wê qels ketiye. Hingê, ev kar nabe "ciddiyet", lê belê dibe ameliyateke giran. Nakokî ew e ku dixwazin euroyê biparêzin û pişta wê xurt bikin, lê vê yekê di demeke weha de dikin ku Amerîka û Çîn hewl didin ku, ji bo ku ji wan re nebe asteng, qiymetê pereyê xwe kêmtir bihesibînin (2).

Angela Merkel da xuyanî ku "şerm e" ku "banqeyên ku em anîn qiraxa qeyranekê, herweha tev li zexeliyên îstatîstîkên butçeya Yûnanistan'ê jî bûbin." Ev lîstikên li ser lêkeran qet ne di bala Goldman Sach'ê de ne. Gava ku pirsa bonûsa Birêz Blankfein jê hate kirin, Serok Barak Obama hewl neda ku bide dû vê mijarê û got: "Weke pirraniya amerîkiyan, ez li dijî serkeftina serwetê napeyivim. Aboriya bazarê weha tev digere." Ev serwet -herkes pê dizane- li xêra seranserê herêma xwe ye: Sala bihurî, ma Goldman Sach'ê % 0.6'ê kara xwe weke bac nedabû? (3)

Werger ji fransî
İbrahîm Seydo Aydoğan

(1) New York Times, 13 Sibat 2010, behsa 300 milyon dolaran dike ku Goldman Sach'ê ji bo vî karî wergirtiye. Kar jî ew bû ku Yûnanistan derefteke peyda bike ku bi dizî pereyan deyn bike. Armanc jê ew bû ku rê li ketina Yûnanistan'ê ya Yekîtiya Ewrûpî ya Pereyî neyê girtin, lewre deynê ji berê de têra xwe hebûn.

(2) Yves de Kerdrel, "Le problème ce n'est pas la Grèce, c'est l'euro" (Pirsgirêk ne Yûnanistan e, euro ye), Le Figaro, 16 Sibat 2010.

(3) Harper's, New York, Sibat 2010.

BAŞÛRÊ KURDISTAN'Ê

Opozisyon di navbera desthilat û hêviyan de

Cewher Namîq Salim*



Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî
(Derbarê hunermend de rûpel 31)

Sedemê serekî yê hebûn û pêşveçûna bizava rizgarîxwaziya gelê kurd, dagirkerî û dabeşkirina Kurdistan'ê, înkarkirina hebûna gelê kurd û binpêkirina mafên kurdan e. Encama serekî ya vê yekê jî berxwedan û parastina vê bizavê ji xak û mafên kurdistaniyan re ye. Sedem û encam, yanî dagirkerî û berxwedan, mohra "opozisyon"ê liser bizava navborî çespand, û ew û hevrikê wê di navbera dû bereyan de dabeşkirin: Bereya gel û bereya dagirkerên xak û binpêkerên mafên gelê kurd. Hevkêşeya behskirî, çend derfetên kurt ên dîrokî ne tê de, hê liser ra û nerînên çarçoveyek berfireh a serkirdayetî û binkirdayetiya bizava kurd li Başûrê Kurdistan'ê, serdest e.

Taybetmendiya dagirkerî û berxwedanê û dabeşkirina hevrikiyê liser dû bereyan: Bereya gel û bereya dijminan, navbera jidayikbûn û pêşkeftina xwezayî ya opozisyona navxweyî nedabû, ger derketibe holê jî yan hatiye paşguhxistin û kedîkirin û yan jî bi awayekî tund hatiye binpêkirin û yan jî bi îxanetê hatiye tohmetbarkirin û hatiye neçarkirin ku tevî bereya dijminan bibe. Rewabûn û qedexebûna vê oposizyonê herdem bi rewş û derfetan ve girêdayî bûye.

Piştî bextreşiya 1975'an û serhildana buhara 1991'ê û bi taybetî piştî qonaxa 2003'an, gelek derfetên baş bo bizava rizgarîxwaza Başûrê Kurdistan'ê, nemaze herdû hêzên wê yên serekî PDK û YNK'ê û piştre desthilata fermî ya Herêma Kurdistan'ê, hatin pêş bo serrastkirina hevkêşeya navborî û dabînkirina rewş û keş û hewa-

* Siyasetmedar

▶ 15

JI EDÎTOR

Kurd li ser bircên Newroz’ê

FAYSAL DAĞLI

Obama’yê reşik ku bi hilbijartina xwe hîmên dîroka jiberkirî ya mirovahiyê hejand, bi vekirina deriyê naskirina Komkujiya Ermeniyan gavekî mezin avêt. Sergirtina Komkujiya Ermeniyan, neqûbûlkirina wê leke ya dîroka mirovahiyê, dûrsekna mutefîkên NATO’yê ji vê neheqiyê, ji damezrandina Komara Tirk vir ve, bûbû yek ji sedemên domandina wê rejima şedîd û faşîzan.

Newroz belav dibe li dilê me. Tav rûyê xakê dagir dike, li dilê me hil tê. Şev li ber hîvê, li hember rûhîvan berxwenade. Tarî perçedibe, tarîstan dibiriqe. Jiyan diweje. Welatê nav dû çeman ber bi tav û hîvê ve diherike. Şêxsiwar li dilê însan hildide.

Ji roja ku cîhan afiriye ve careke din çerxa felekê berbi 21’ê Adarê ve digere. Careke din roj û şev dibin yek, careke din serma cîhê xwe dide germê, careke din tarî reşistana xwe ji rohaniyê re dihêle… Careke din Newroz silav dide me. Newroz a cîhanê pîroz be!

***

Di van rojên ku em şahidiya wan dikin de li Kurdistan’ê gelek pêşveçûnên girîng diqewimin. Hilbijartinên 7’ê Adar a sala 2010’an yên Îraq’ê, bi neheqiyên li dijî kurdan destpêkir. Beriya hilbijartinê ji bo ku hêza kurdan li beramber ereban bê kêmkirin, hin yasa hatin guhertin. Li gor van guherînan hejmara parlamenterên Meclîsa Îraq’ê ji 275’an derxistin 325’an. Hejmara parlamenterên ku ji bajarên Kurdistan’ê derdikevin wek xwe man. Yanê di meclîsa Bexda’yê de 50 parlamenterên ereb hatin zêdekirin. Balkêş e partiyên Sunî û Şîa bi yekdengî vê yekê pejirandin.

Helwest û taktîka siyaseta ereben Îraq’ê di sala 2010’an de jî neguheriye. Xwedanê Bexda’yê hîn jî lewazkirin û xapandina kurdan difikirin. Ji ber vê yekê jî di derbarê çareserkirina pirsgirêka Kerkûk û deverên nakok de hikûmeta navendî heta niha gavekî navêje. Wiha xuyadike ku herçende partiyên Sunî û Şîa nêzî hevdibin, li dijî maf û daxwazên kurdan xeşimtir û xetertir dibin.

Bersiva, pirsa ‘Kurd wê bi 70 kursiyên ku bidest xistin di parlamena Bexda’yê de bikaribin di nav yekîtiya Îraq’ê de bimînin’ ne hêsan e. Malîkî, Elawî û siyasetmedarên din yên ereb hîn jî ji taktîkên Saddam Husên yên lewazkirin û perçekirina kurdan nehatine xwarê. Ew bi texîrkirin û jibîrkirina pirsgirêka Kerkûk’ê heman awayê sala 1970’an yên rejima Baas didomînin. Siyasetmedarên Bexda’yê herçiqas çavkorê xwendina dîrokê bin jî, divê jibîrnekin ku hêzên pergala 1970’an serûbino kir, îro cîhaneke din û Îraq’eke din dîzayn dikin.

Herwiha yek ji encamên heremî yên hilbijartinên Îraq’ê teyîdkirina muxalefeta Goran bû. Goran ku cara dûyem de tevlî hilbijartinan dibe, êdî li ser asasekî zexm yên dengdêran rûdine. Bi vî awayî li Kurdistan’ê dîmeneke nû rûdide. Kurdistan êdî ne fîft fiftî ye, bileks ger partiyên desthilata Kurdistan’ê di demeke zûtir de guherinên pêwîst yên ku gel li bendê ye pêk neynin, wê refleksa demokratîk ya gel xanedanan hilweşîne.

***

Di 4’ê Adarê de serdegirtina hêzên ewlekariya dewleta Belçîka’yê ya ser saziyên kurd ku di nav wan de çend şîrket û studyoyên hevkarên ROJ TV’yê jî hebûn, di derbarê hêviyên tevlîbûna Ewrûpa’yê ya proseya çareseriya aştiyane û demokratîk ya pirsgirêka Bakurê Kurdistan’ê de dîmenek pesîmîst afirand.

Di dema ku li Tirkiye’yê hikûmeta AKP’ê li dijî desthilata milîtarîst têdikoşe, rêvebiriya Obama ji bo demokratîzekirina dîroka Tirkiye’yê ber li pêşyasa ya Komkujiya Ermeniyan vedike, ajotina ser saziyên ragehandina kurdî û saziyên dîasporaya kurd li Belçîka, Îtalya û Fransa’yê di derbarê nirx û têgihiştinên alema Rojava de hin gumanan peyda dike.

Ew dewletên ku yasa û mafê mirovan li jor hemû nirxan dihesibînin bi awayên ku demokrasiya wan dixe bin sîberê li dijî kurdan tevdigerin. Ew dîmenên ku ji operasyona tîmên dij-terorê yên dewleta Belçîka’yê hatin ser ekran û rûpelan di derbarê rola Ewrûpa ya tevlîbûna çareseriya aştiyane ji bo pirsgirêka Bakurê Kurdistan’ê hêviyan lewaz dike.

Ji provakekirina kurdên dîasporayê, yek encam derdikeve holê ku ew jî pirsgirêkê ber bi kolan û korîdorên siyaseta Ewrûpa’yê berfirehtir dike. Ev yek jî ji bilî mezintirkirin û tevlîhevkirina pirsgirêkê tû encam nade.

Ji tecrûbeyên dîrokê diyar e ku ji bo sivikkirina tirsa tirkan, ji bo palpiştiya hewldanên hikûmeta AKP’ê ya li dijî pergala Kemalîst û milîtarîst, ajotina ser kurdan, berewajiyê encamên bendewar derdixwe holê. Demokrasiya Ewrûpa ji bo teşwîkkirina damezrandina pergala demokratîk ya li Tirkiye’yê nikare stûyê kurdan bide ber kêrê. Lewra heta kurd xwe di nav ewlebûn û hevpariya demokrasiyê de nebînin li Tirkiye’yê ne aştî ne jî demokrasî mimkûn e.

Li aliyê din rêvebiriya Obama, bi heman fahm û ferasetî nêzîkî pirsgirêkê dibe. Di roja ku pêşyasa ya Komkujiya Ermeniyan ji komîsyonê derbasdibe, li çend peytextên Ewrûpa li dijî sazî û siyaseta kurdan operasyonên navnetewî tên lidarxistin. Mirov ev helwest nikare tenê wek hewldanên li dijî ‘‘PKK’ê an jî kurdên radîkal’’ binirxîne.

Ev yek di carekî de nirxên demokrasiya alema Rojava tîne ser maseya nîqaşê. Li aliyekî Obama, dixwaze heyf û neheqiya dîrokê paqij bike, lê bi neheqiyeke din encamên vê helwesta xwe sivik dike.

Obama’yê reşik ku bi hilbijartina xwe hîmên dîroka jiberkirî ya mirovahiyê hejand, bi vekirina deriyê naskirina Komkujiya Ermeniyan gavekî mezin avêt. Sergirtina Komkujiya Ermeniyan, neqûbûlkirina wê leke ya dîroka mirovahiyê, dûrsekna mutefîkên NATO’yê ji vê neheqiyê, ji damezrandina Komara Tirk vir ve, bûbû yek ji sedemên domandina wê rejima şedîd û faşîzan.

Beriya herkesî raya giştî ya Ewrûpa baş dizane ku faşîzm ji bo bibe strûktûreke domdar ya dewletî dîrokeke taybet diafirîne. Eger warîsên dewleta tirk AKP jî di nav de di sala 2010’an de hîn jî komkujiya dijî netewa ermenî înkar dikin, û demokrasiya Rojava ji bo tevlî vê helwesta wan ya faşîzan bibin, wan bi jeostratejîya xwe, bi hevkariya xwe ya NATO’yê an jî bi amilên din tehdîd dikin û ewçend wext jî biserdikevin, hingê di nirxên demokrasiya Rojava de jî mirov dikare bahsa xeletiyên erjeng bike.

Obama niha bi vê helwesta xwe kulmeke xurt li rûyê dîroka faşîzan ya rejima tirk dide. Lê bi xeletiyeke din! Kulma Obama ne tenê dixwaze neheqiyekî serrast bike, herwiha di rûyê kurdan de jî dibe sedemê êşeke neheq…

Divê stratejên Rojavayî baş nasbikin ku terapiya rejim, têgihîştin û pergala tirk û Tirkiye’yê bi vî awayî naçe serî. Dema ku xezeba demokrasiya Rojava bi ser rejimên kevneperest û statukoparêz ve dibare, nabe ku qurbanê wan rejiman jî mexdûr bike.

Gelek balkêş e, dema hikûmeta AKP li Tirkiye’yê li dijî leşkerên darbexwaz an jî ergenekoniyên kujêr rêyên yasayî bikartîne û wan derdixîne ber dadgehan, di heman demê de berê xwe dide kurdan. Roja ku generalekî sûcdar tê girtin an jî çend kujerên ergenekonê derdikevin pêşberê dadgehan, an partiyên kurdan tên girtin, an siyasetmedarên bijartî yên kurdan tên kelepçekirin an jî zarokên kurd li kolanan tên kuştin. AKP qaşo bi vî awayî balansekî siyasî dide Tirkiye’yê. Balans ji bo çi? Ji bo ku kolanan, ji bo dengderan ji xwe nede xeyidandin an jî ji bo hêrsa li dijî xwe hinekî kêm bike!

Rojava dema ku dixwaze sûcekî rejima tirk an jî dîroka tirk darezîne heman tişt tîne serê kurdan! Diyar e ku fêrî awayê hevûdû bûne. Di herdû rewşan de jî yê dibe bi kurdan dibe. Yanê sîleyekî li tirkan kulmekî li kurdan dixin. Ev jî dibe edalet!

Ger rojavayî dixwazin rejima hov ya ku xaka Tirkiye û Kurdistan’ê dîl girtiye ehil û terbiye bikin, nabe ku aliyekî vê rejimê mizdin û aliyê din bitepisînin.

Li aliyê din kurdan îsbat ki-

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

rine ku êdî çi ji xeletiya siyaset û siyasetmedarên wan, çi ji zext û hêza dijberê maf û destkeftiyên wan, ew naxwazin heta hetayê wek zarokên mexdûr yên dîrokê bimînin!

***

Xwînerên hêja, di Newroz a sala 2010'an de em dixwazin çend mizgîniyan jî bidin we. Ji vê hejmarê pêve Le Monde Diplomatique kurdî êdî ji aliyê İndepent Kurdish Media Group GmbH (İKMG) ve tê weşandin. İKMG, bi armanca deng û rengek nû yê serbixwe di ragehandina kurdî de biafirîne, ji aliyê karmend û rojnamevanên kurd ve hatiye damezirandin. Armanca sereke ya İKMG ew e ku weşanên navneteweyî yên di asta Le Monde Diplomatique de bi zimanê kurdî bigîjîne ber destê xwînerên kurdîaxêf. Di demên pêş de wê çend govarên paşgo yên Le Monde Diplomatique jî ji aliyê me vê bi zimanê kurdî bên weşandin.Herwiha wê malpera Le Monde Diplomatique kurdî ji nûh ve bê dîzaynkirin û ji vê hejmarê pêve xwînerên rojnama me li ser malperek ciwantir rojnameya xwe bişopînin. Weşana Le Monde Diplomatique kurdî ya bi zarava soranî li Başûrê Kurdistan'ê jî wê bidome. Hevkarên me yên li Kurdistan'ê ji bo rojnameyeke gurtir hewlên xwe didomînin. Herwiha em ji niha ve mizgîniya weşana Le Monde Diplomatique kurdî ya li Tirkiye û Bakurê Kurdistan'ê jî radegehînin. Di demekî nêzîk de wê rojnama me bigîje destê xwînerên li Bakurê Kurdistan'ê jî. Em hêvîdarin ku hemû xwîner, dost û aboneyên me ji bo geşkirin û pêşvebirina Le Monde Diplomatique kurdî alîkarî û piştevaniyê bidomînin.

Newroz a we pîroz be, hemû rojên we Newroz bin!

ABORIYA CÎHANÊ

Îflasa banqayan ‘stratejiya şokê’ anî rojeva bazarê

FRÉDÉRIC LORDON*

Di demekê de ku şokên “asayî” yên Naomi Klein behs lê dike, bi piranî ji derve tên –derbeyên leşkerî, dij-şoreş, felaketên xwezayî–, û dibin sebebê bêserûberiyekê ku bi tenê bi dû wê re bernameya neolîberal bi rêk dikeve, şoka niha em behs lê dikin bi temamî berhema nava malê bû û halê heyî ew hêz jê îstifadeyê dikin ku diviya heta hetayê jê hatibana dûrxistin... lê hêj jî ew hêz xwedanê wê cesaretê ne ku ji wê bêserûberiyê ji xwe re avanseke zêdeyî bi dest ve bînin.

Çend sebeb hebûn da ku mirov bi temamî qanih nebe bi teza Naomi Klein ya li ser “stratejiya şokê” (1). Bêguman teza navborî gelek kêrhatî ye ji bo ravekirina gelek rewşan, nemaze ji bo rewşa welatên başûrî an jî aboriyên di rêya veguherînê de. Lê belê, ew ne xwediyê wê hêza ravekirina giştî ye ku bi awayekî nepenî dozê lê dike; û herwiha, gelek aşkera ye ku bicihkirina neolîberalîzmê di ekonomiyên goya pêşketî de, nabe bersiv ji bo modêla “şok”ê –lê bêtir tê me’naya birêvebirina biqedeme û “bi xwînsarî” ya ajandayekê ku her ku tê sepandin xwe sîstematîze dike û kûrtir dibe. Lê belê, divê bê selmandin ku, bo cara yekem, îhtîmal e tehlîla wê di nava kapîtalîzma “pêşketî” de jî pir bi serfirazî bê piştrastkirin. Bi xêra biryardariyeke bêeman a mekanîzmeke hevaheng, qeyrana fînansa taybet xwe qelapte qalib û kakilê qeyrana fînansa giştî. Mesele, bi kêmî ji ber du egeran pir xeter bû. Ya yekem, qet îmkana wê hindê nebû ku hêz û saziyên giştî bêliv û bêelaqe bimînin beramber rîska nêzîk a têkçûna temamî ya sektora bankan. Hêrsa rewa ku ji ber şanoya fînansê radibe û dipingure, ji nû ve dibe bar ser pişta welatiyên bacê didin (bacder), tu tiştî ji vê rewşê naguhere û jê kêm nake: pîlana rizgarkirina bankan opsiyonek nebû, mecbûrî bû. Herçend şik tê de nebe ku rizgarkirina bankan bi kefaletê, hevgirtina çînan û îltimasên cihê (2) têkel kiriye digel pêwîstiya pêdiviyên heyatî, ev yek, haşakirina hêmanên vê têkeliyê rewa nadêre, nemaze hêmana duyê, anku îltimas û layengiriyan.

Hikûmetên ku qet ji xwe razî nîne ne ji ber rizgarkirina fînansê û ne jî ji ber ku nekarîn beramberî vê qenciyê şertên cidî û girîng li ser wan dasepînin –munaqeşeya rasteqîn ev e–, bi qurretî derdikevine pêş raya giştî û ji wan re diyar dikin ku, piştî çakbûna fînansê û vegerandina deynan, pîlanên rizgarkirinê di rastiyê de qet nabe zerer ji wan re, belkî bi pêçevane, carinan wê zêdetir “pere bînin ji bacderan re.” Divê bê selmandin ku ev qise ne sirf pesnê-xwe-dan e û ne jî sextekariyeke edetî ye. Mesrefên rastî yên hikûmeta fransî diyar e gelek kêm bûn, avakirina giştî ya fînansê, garantî pêkanîn ji bo rihettir hereketkirinê, û fînansekirinên acîl ên li bankan hatî bexşandin bi wî şertî pêk hatine ku bêne vegerandin, û di wê vegerandina deynan de budce ya dewletê wê qazancê jî bi dest bixe (3). Bihayê rizgarkirina sektora fînansê wisa diyar e ku ji bo DYA’yê gelek kêmtir e. Trouble Asset Relief Program (TARP, anku bernameya alîkariyê bo karsazên tengav, neolojiyeke biçêj…), ku serê pêşî di nav zerfeke 700 milyar dolaran de hatibû rojevê, her ji ber sebebên manend, di dawiyê de ketibû 100 milyaran –ku rêveberiya Obama biniyet e wê jî bi temamî dîsa vegerîne li ser qaseyên dewletê bi xêra baceke taybet ku wê bo maweya deh salan ji bankan bê wergirtin.

Lê belê, ev pêşkêşiya pesndar û xulaseya xweşbext hinek detayên bêsiûd li derve dihêle, nemaze meseleya rola diyarker a saziyên para-hikûmetî (organîzmên nêzîkî dewletê lê ji dewletê cuda) yên wekî Fannie Mae, Freddie Mac û Federal Housing Agency (FHA), ku ji bo strîna ji têkçûna temamî ya emlaq û mezinbûna aborî gelek caran lava û daxwaz ji wan dihate kirin. Biha û meblaxê wan ê ji bo pîlana rizgariyê bi hişyarî ji hesabê hatibû derxistin ji ber ku ew meblax –400 milyar dolar sercem– her qet nehatine derdestkirin da ku bêne vegerandin. Fînans rizgarkirî ye û paşketina aborî sînorkî ye, lê belê bi rêya paşvedana kêşe û nerihetiyên mezin berev nav cihekî berteng ku tu tişt nikare teqez bike ku teqîneke mezin lê naqewime (4).

Hesab û helsengandinên pozîtîf, ji ber ku bi tenê berê xwe didin bihayê mudaxeleya dewletê ji bo rizgargkirina enstîtûyên fînansê, meseleya bingehî ji bîr dikin an jî nabînin: Bihayê ku li budceyê dibe mal gava ku hewl dide xwe bide ber pengiya (pengî an mendbûna aborî) warê kar û xebatê û ber zererên bêhed û hesab ên bi dû re tên. Lewma, rastî ew e ku zêdebûna zerer û kêmasiyên budceyî û deynên giştî, ji “pîlanên rizgarkirinê” bêtir xema navbeykariyeke berfireh a makro ekonomiyê ye –û li wir, ne rê û derfet hene ji bo jê revînê û ne jî îmkan hene ji bo veavakirineke sêhrî.

Ji ber ku rêya herî hêmin ji bo windakirina têkilî û girêdanên wê tevahiyê berfirehkirina wan kanalan e ku sebeban digihînine netîceyên axir, fînans niha di wê baweriyê de ye ku dikare wisa hereket bike heçko wê bi xwe biha û mesrefa helatin û tengaviyên xwe yên biçûk daye, û bi vî awayî hewl bide meseleya mayî (bêkarî, paşketina aborî, zerer û kêmasiyên budceyî) hewaleyî binkeyên dûr ên makroekonomiyê bike –belê xemgîn e, lê kar û xema wê nîne.

Û ji ber ku bêşermane peyvek e ku nakeve nav ferhengoka wê, va ye hêz û taqeta xwe dide hev, û mîna berê, qet natirse dersan bide dewletan, ku li pêş çavên wê ew dewlet tim bêpere û heta hetayê bêberpirsyarî ne. Hilçûn û zêdebûna heta vê dereceyê ya deynên sektora giştî kêşeyeke mezin e, dubare dikin, bi eniyên qermiçî, rêveberên departmanên “fixed income” (5)… ku di şêlûbêla sekeratê de bi pereyê bacê hatibûne rizgarkirin.

Bank niha qismen jinûve geş dibin ji ber ku piştgiriyên dewletî û mezin ên ji bo xatirê şert û mercên heyî wan diparêzin ji xetera têkçûneke duyem li jêr lehiya deynên xerab, ku bêguman di rewşeke bêalîkarî de wan deynan wê derbeke kujende li wan bixista. Wisa diyar e ku li ba bankan xem û endîşeyek nemaye, tenduristî çak, êdî wê spekûlasyonan bikin li dijî dewletên ku ew ji kûrika tarî xelas kirin, da ku bihayê qerzên giştî bilind bikin, û bi vî rengî kêşeya kêmasiya budceyî bişarînin… ku ew bi xwe serkaniya wê kêşeyê ne.

Ev e êdî ji vir û pê de “şok” dest pê dike şiklê xwe digire. Mûçegir ji destê paşketina aborî dikêşin? Ji ber ku bacder in her ew wê pere bidin ji bo hevahengkirina budceyê! Lewma wê du caran wan biêşîne. Îdeolojiya neolîberal, bi qabiliyeteke ku mirov hew dikare teqdîr neke, xerîk e ji wê rûdana ku îhtîmal hebû bibe sebebê mirin û têkçûna wê bi xwe, rê û derfetên

** Aborînas. Nivîskarê La crise de trop. Reconstruction d’un monde failli, Fayard, 2009*

destxweş durist dike ji bo dewam û serkeeftina xwe: Dûr ji qayilbûna bi doz û daxwazên xwe yên edetî yên "deqîqî û hesabduristiyê", vê carê bernameya jihevxistin û jêkvekirina dewletê radigihîne ku heta niha bernameyeke ewqas berfireh nehatiye dîtin –heta dereceya rabûna lehiya kêmasî û deynên giştî ku ji ber kar û kiryarên wê bi xwe derhatine. Judokarekî jî ji vê çetir nedikir.

Di demekê de ku şokên "asayî" yên Naomi Klein behs lê dike, bi piranî ji derve tên –derbeyên leşkerî, dij-şoreş, felaketên xwezayî–, û dibin sebebê bêserûberiyekê ku bi tenê bi dû wê re bernameya neolîberal bi rêk dikeve, şoka niha em behs lê dikin bi temamî berhema nava malê bû û halê heyî ew hêz jê îstifadeyê dikin ku diviya heta hetayê jê hatibana dûrxistin… lê hêj jî ew hêz xwedanê wê cesaretê ne ku ji wê bêserûberiyê ji xwe re avanseke zêdeyî bi dest ve bînin. Kerem kin îcar bibînin ka çawa têkçûna projeya neolîberalîzmê bi xwe, bi xêra netîceyên xwe, dibe sebeb û hêceta jinûve birêkxistina wê ya li ser zemînekî berfirehtir! Lewre aşkera ye ku ji bo vegeriyana ji rêjeyên du-reqemî yên kêmasiya budceyî (li gorî rêjeyên HNN: Hasilaya nesade ya navxweyî) bo % 3'yê pakta îstiqrarê, şert e ku biryarên mezin û bêrehmane bi çavtarî û bêyî lêkdanên dûrûdirêj bêne wergirtin. Bi vî rengî dev ji gotara "reforma" zêdeker berdidin, ku ev du dehsal in li kar e, da ku têkevine nav rejîmeke taze ya serûbinkirina bilez, lewre vê carê gihiştiye derazînga "hevahengkirin û lêanînên" wisa ku êdî li wir mesele nema guhertina dereceyê ye lê bêtir guhertina xweza û awayê karkirina wê ye.

Û di demekê de ku fînans qayil e bi ragirtina gotara teknîk a li ser rîskên kêmasiya dewletê (rîskên bi dewlet û saziyên wê re eleqedar, bo nimûne, gumana li ser şiyana dewletê ya vegerandina deynê xwe) û dubendiyên li ser faîza deynên demdirêj, amrazê îdeolojîk yê berfireh –bisporên rêkxistî, medyayên ku ji bo behskirina pêvajoyeke dirêj an jî bêtir ji bo behskirina nakokiyeke nêzîk hatine terxankirin– jixwe dest bi pêşkêşkirina xizmetên xwe kiriye. Îmkan nîne ku rojek derbas bibe bêyî ku ji rexekî re dengekî derwêşane bilind bibe û derbarê felaketê de me agahdar bike û banga hewl û xebatê bike. Lehiya propagandaya li ser "deynê giştî" bûye dengedengeke kûr û daîmî, û di dîroka nûjen de zehmet e mirov emsala hewlên evqas xîretkêş û berdewam ên ji bo "duristkirina" raya giştî bibîne –em dikarin herwiha îşareta berfirehî û ezameta gorankariyên di halê amadekirinê de jî bibînin.

The Economist a ku piştî saleke depresyona fikrî, ku di maweyê de wê bi xwe jî bawer kiribû ku kapîtalîzma wê ya delalî gihiştiye ber rûxîn û têkçûnê, niha bi awayekî seyr ji nû ve bihêz bûye, biniyet e ku pêşengiya reconquistayê (jinûve dagîrkirin) ji kesî re nehêle. Ev qederê dewreke çarmehî ye ku metodên nû dadirije û bi berfirehî dosyeyên taybet ên "fînansa giştî" tîne rojevê. Brîtanya, Dewletên-Yekgirtî, û helbet nimûneyên herî seyr, ku îmkan nîne rast bin, Îrlanda, Spanya, Yûnanistan, hemû ketine heyra dubarekirina heman coş û peroşê: "daxistina bihayan." Ji bo her çi kesê ku bixwaze biçespîne ku lîberalên gewre ji heyama xwe ya şermnak derdikevin û jinûve pozîsyona êrîşkirinê digirin, bes e ku li "heftenameya referans" binihêre û bibîne ka bi xîtabeke çawa pêşniyarên xwe vedireşîne: "Di cîhana şîrketan de, daxistina hejmara xebatkaran bi rêjeyeke % 10 di rewacê de ye. Tu sebebek nîne ku Hikûmet jî nekarin eynî tiştî bikin (…) Mûçeyên sektora giştî dibe bêne daxistin beramber ewlehiya karî (…) Di sektora giştî de, mûçeyên teqawut û feqîran gelek sexîtir in (…) (6)", hemû di sernivîsarekê de bi serenavê "Stop!" û di dawiyê de hatiye zelalkirin ku: "The Economist wê di mehên tên de vegere ser van hemû pirsan» –qet gumana me ji vê yekê nîne.

Mirov dikare herwiha bi temamî hevbîr nebe digel vê qedera ragihandî û ne jî xwe bihêle ber ba û bahoza guleyên astengên îdeolojîk –hema bila netîceyên maddî yên "şokê" bi xwe li aliyekê bin. Ji ber vê hindê, girîng e ku îşaretên pêşrew ên belave li ser maseyeke hevaheng berhev bikin da ku fikreke zelaltir li ser bernameya ku tê dariştin bi dest bikeve. Mûçegirên îrlandî yên sektora giştî, ku dewletê ji wan re % 10 daxistina mûçeyan "pêşniyar" kir, dizanin bê ka sebebê rastî çi ye; bi heman sebeban, soza heman cezayî ji hevpîşeyên wan ên yûnanî re dane (digel prîma piştgiriya dilxwaz a Komîsyona Ewrûpa'yê); heçî fransî ne, heta kurtedemekê wê reforma teqawudan encam bidin, herwiha projeya jikarderxistina memûran û fikra (bêmentiq) a bicihkirina di destûrê de ya hevsengiya budceyî wê li wan eyan bike ku bingehê dewleta wan a sosyal tê hilweşandin; lê belê îhtîmal heye ku di netîceyê de li wan hemû welatan, bi şiklê ku ji tradîsyona baweriya bi gorankariyên tedrîcî biqete, tundûtîjiya di nav kakilê "şokê" bi xwe de berhevbûyî nahêle ku laşên civakî bêliv û bêreaksiyon bimînin.

Dîsa her ji ber vê hindê ye ku, herçend zehmet be ku mirov haşayiya kêşe û kêmasiyên budceyî bike, aşkera ye ku rêya çareseriya wê ne tenê çend tedbîrên bêrehm in û divê çareseriyên alternatîf (ku bi awayekî sîstematîk têne piştguhkirin) bêne bibîrxistin.

Hema em bi tenê li yekê binihêrin: Bêguman ya yekem zêdekirina berhevkirina darayî ye lê belê ev yek divê gelek bi hişyarî bê kirin da ku mezinbûna aborî nekuje ne jî bihayê qeyranê bi wan bide dan ku qet berpirsyariya wan di derketina wê de nîne.

Wisa diyar e ku ev rê bi tenê hejmareke berteng a kesên ku wê bacê bidin dihêle. Xelet nîne ji bo hejmarê lê belê –xwedêkirî– di praktîkê de pir bikêmas e. Ya rastî, kesên ku wê bacê bidin dikevine nav kategoriyên gelek cihê, û ji ber ku gelek warên darayî dikevine navê, mirov dikare li hêviya netîceyên baş be. Muameleyên darayî, saziyên darayî û "şexsên darayî" berendamên serekî ne ji bo tehmîrkirina nerihetiya xwe, ji ber ku em gihiştine wê qenaetê ku tenya fikra karger a qebûlbar ji bo çaksazî û hevahengiya darayî li ser wê bingehê ye ku dana bihayê qeyranê bi tenê bibe xema beşê darayiyê lewre qeyran ya wê bi xwe ye.

Herçend mirov gumanê li fezîletên baca Tobin'ê bike jî wekî amrazê veguherandina radîkal a "daneyên" spekûlasyona darayî ya navneteweyî, divê neyê jibîrkirin ku wekî bac, ew tu tiştî darayîbûna xwe ya rebît kêm û winda nake: lê vedigerîne (7)! Hetta gelekê vedigerîne ji ber ku, her wekî ku bi gelek helkeftan hatiye diyarkirin, mîqdara astronomîk a muamele û danûstandinên darayî dibin derfetên kêmpeyda û hema ji bac-berhevkirineke gelek kêm jî xêreke baş bi dest dikeve.

Herçend baca li ser muameleyên darayî serê pêşî ji kîsê saziyên darayî derkeve jî, saziyên navhatî wê di rêza duyem de bin û roleke wan a duhemî wê hebe. Niha ku rêveberiya Obama jî dide ser wê rêyê, zehmet e mirov bifikire ku baceke li ser bankan (û fonan) bikeve nav şêtiya aborî ku mexsûs e bi binhişê şoreşger; û meydaneke fireh e ku divê teheyyula darayî lê şert û şirûdên deqîq ên wê bac-wergirtin an jî pere-hildanê destnîşan bike: Li ser bingehê qazancê, tevahiya xebatkaran, xebatkarên herî zêde li jêr rîskê, koma mûçeyên wan kesên herî baş pere werdigirin, bi tenê ji bo dagirtina kuna heyî an avakirina foneke zêdeyî ji bo garantîkirina dahatûyê, hwd.? Û ji ber ku tu sebeb nîne ku xebatkar û xwedan û berpirsyar muaf bin ji birêkxistina çend hûrde-karên tehmîrê li bankên xwe, pir mentiqî ye ku di wê heyamê de her çi xelat û bonûsek bê qedexekirin.

Dawiyê em behsa şexsan bikin. Kadirên rêveber ên bankan, midûr (gelek caran em wan ji bîr dikin), bazirgan û karsaz, û herwiha saziyên darayî yên serbixwe û yên xwedanê heman sedêkê (8). Hingî nerihetî û nerazîbûn wê rû bidin ji ber ku wê diyar be ku tedbîrên ewqas bi hurgilî hatî dariştin di rastiyê de netîceyên pir bêqîmet bi dest ve tînin, hemû karîgeriya wan bi tenê sembolîk e, û bi vî rengî, tebîetê wan ê bi taybetî cezaker û nerihetker wê bê ber çavan. Lê belê bila qet neyê jibîrkirin ku ev koma bacderan, rast e gelek berteng û hûrik e ji bo hejmara xwe, ev panzdeh sal in mezintirîn para ji zêdebûna global a dahatên neteweyî zeft dikin û bi tenê para wê komê ewqas zêde ye ku bi xalên HNN'yê tê hesabkirin.

Hêja ye em careke din bêjin ku herçend pirsa bonûs û dana heqê mûçeyan (di sektora bankan de) meseleyeke duhemî be jî di aboriya giştî ya qeyrana darayî de, ji aliyê siyaseta edaleta civakî û îmkanên darayî ve ji hemû pirsên din girîngtir û sertir e. Ji ber ku –gotara fînansê û ya hevkarên wê pir aşkera ye û mirov dikare pêş bibîne– muheqeq behs wê bê ser çîroka "koça mêjiyan", em ji niha ve diyar bikin ku ew mesele dikeve nav devera netîceyên daketina aborî û êdî nema gelek kesan ditirsîne, hetta êdî bi tenê pîçek nerihet dike, û ya rastî, her çi gava çend îtirazên cidî bêne pêş nema dikare li rêya xwe bikudîne (9).

Ji bo bêtir ronkirina kêşeyan niha jî meseleya hişyariyan. Prosesa ku qeyrana fînansa taybet xist qalib û kakilê fînansa giştî wiha di nîveka rêyê de ranaweste: sefheya paştir ew e qeyrana fînansa giştî bixe qalibê qeyrana siyasî. Çend kesên di nav "sîstemê" de her ji niha ve hest bi tirseke pîroz dikin, ku ev yek nîşaneke pir watedar e lewre dijminên navdar ên fînansê wekî Dominique Strauss-Kahn û Jean-Claude Trichet divê bi aşkerayî nerihet bin ji ber ku bi ihtimaleke mezin laşên civakî wê pir nerihet bin heke careke din ji wan bê xwastin ku barê qeyraneke fînansî ya nû hilgirin. Ya herî seyr jî ew e ku hîpoteza "qeyraneke din" bi temamî nehatiye vederkirin, lê belê heke hat û qeyran rû bide, vê carê wê ji beşê deynên giştî dest pê bike; yanî rasterast wê ji ber netîceyên rêvebirin û mudaxeleya qeyrana borî pêk bê –êdî hingî sebra kesî li ber vê şanoya seyr namîne.

Em şertê digirin ku bi mebesta aştkirina xelkê nerihet, sendîkayên herî zêde binecih, ku li nav refên rastgir û "çepa" sosyal-demokrat de ne, û binkeyeke hêza yekgirtî pêk dîînin wêdeyî duseriyên xwe yên duhemî, wê çend xwepêşandanan bêguneh bi rê ve bibin bi qewlê geştekê, rojekê ku dinya tav be, di navbera Republique û Nation'ê de. Lê belê, îhtîmal heye ku opsiyona "geşta nav-bajarî" nema têrê bike û xelkê nerihet, ku êdî westiyaye ji geşt û geryanê, pê bihese ku êdî bêzar bûye ji wan geryanan.

Bêyî ku em hukmeke pêşîn bidin derbarê tiştên ku îhtîmal e hingî biqewimin, belkî yûnanî heta kurtedemekê bihêlin em qet nebe bizanin çêja wê çawa ye, hêja ye em bi bîr bînin ku komeke ku di tebîetê xwe de xerab nîne, qet xerab nabe heta ku muameleya xerab digel neyê kirin û nemaze xwe di rewşekê de nebîne ku jê re eyan be rêder (rêya derketinê) jê nîne –û tenya rêder ew be ya ku muameleya xerab pê re dike. Rêderên din, belê hene (10). Ew rêder û rêbaz hinekî din hişktir bêne pêşkêşkirin, tê heye ku qalibê şokeke dijber bigirin.

Wergera ji fransî
Ergîn Opengîn

(1) Naomi Klein, La stratégie du choc. La montée d'un capitalisme du désastre, Actes Sud, Arles, 2008.

(2) Şertên rizgarkirina AIG'ê, di rastiyê de veguherîne rizgarkirina telafî û qerebûyên AIG'ê, û bi taybetî (lê ne tenê) yên Goldman Sachs'ê.

(3) Ji ber ku SFEF'ê deyn, bi rêjeyeke bilindtir ji 400 xalên baz (ji bo faîzan; yek xala baz= % 0,01) dabû bankan.

(4) Herwekî ku betalkirina sersînorê alîkariya ku berê hatibû diyarkirin (du caran 200 milyar dolar ji bo Fannie-Freddie) û dirêjkirina garantiya dewletê ji bo zererên wan heta 2012'an nîşan dide.

(5) Beşê karên li ser berhemên faîzan, ku pareke girîng jê terxankirî ye ji bo muameleyên li ser navê deynên giştî.

(6) The Economist, 23 Çile 2010.

(7) André Orléan, "Beaucoup mieux qu'une taxe Tobin", Challenges, Paris, 29 Cotmeh 2009.

(8) Wate, bi heman awayî % 1 sertir ji xelkê asayî.

(9) Bixwînin bo nimûne "Bonus et primes: le (résistible) chantage des compétents", û "Bonus: les faux-semblants de la régulation Potemkine", blog "La pompe à phynance", Le Monde Diplomatique.

(10) Bixwînin "Au-delà de la Grèce: Déficit, dette et monnaie" û "Si le G20 voulait…", blog "La pompe à phynance."

ÊRIŞA OLAN

Ronahî tên hawara sedsala 21’ê!

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

Carinan, li hember jiyîna li vê mîlenyûma sêyem ku bergeha reş û tarî ye, mirov dikeve nava xeman. Baweriya ku pêşketin êdî ne weke ku mirov digot qey weha ye, û dem êdî bi şûn ve diçe bi ser yên din re dikeve. Gellek caran, ji aciziyê li hember xêrxwaziya ku di nava xelkê de belav bûye, giriyê mirov tê û mirov bi tirs ji xwe dipirse gelo bi rastî jî xatirdayin û tevlêbûyina hemû fikir û baweriyên ku hene bi tenê nîşana mecbûriyetên toleransê ye, an nîşana bêhişketina xeternak e… Bi kurtî, ev dewr mirov aciz dike û mirov dide pey hişyariya fikrî. Ji xwe, Ronahiyan (1) jî di eslê xwe de tim behsa vê dikir: Beyî ku mirov bifikire, xwendina fîlozofên wan, Voltaire (2) û Diderot (3) û Hume (4), ku çapa berhemên wan ya bêrîkan tam li gora demê hat kirin, û bêtir behsa baweriya ji Xwedê dikin, kêfeke weha ye ku bi rastî jî mirov tîne ser hişê xwe.

“Sapere aude”: li gora Kant slogana Ronahiyan ev e. “Ceger bike û guh bide dilê xwe”: dayina pey vê sloganê, di eslê xwe de tekane rê ye ku mirov nehêle ku baweriyên hinin din rêyê bi ber mirov bixin. Hema mirov dibêje qey fîlozofên sedsala 18’an bi hişê xwe ve êdî kamil dibûn û diyarde, daxuyanî û cihên hevpar ku dibûn alavên hişmendiya dema xwe di nava têgihiştineke rexneyî re derbas dikirin. Bê guman, pirsa olê, bû mijara wan ya sereke, him bi nêrîneke fîlozofîk (gelo wateya baweriya ji Xwedê heye?) û him jî bi nerîneke axlaqî (gelo mimkun e ku mirov ji derveyî tirsa Xwedê jî dilrehm be?)

Berî nuha bi salan, mirov digot qey êdî dema van mijaran bi rastî jî derbas bûye. Bi awayekî ecêb, ev mijar dîsa ketin rojevê û hatin nîqaşkirin: serokkomar Nicolas Sarkozy bi vî awayî keşe pîroz kirin, lewre li gora wî ew ji mamosteyan baştir li perwerdehiya axlaqî dikin ; parlamenterekî ewrûpî yê portekîzî jî ji hêla xwe ve doz li José Saramago kir ku, ji ber ku romaneke bi navê Caín (5) nivîsandiye, dev ji hemwelatiya xwe berde, lewre ew roman li dijî perwerdehiya Încîl’ê ye. Ji bilî van herdu bûyerên gellekî navdar, gellek işaretên din jî hene ku vegera êrîşa olî diyar dikin. Ev işaret ji aliyê hin berpirsên oldar jî dikarin bên û ji aliyê hişmendiyeke bi awayekî zîrek tevlihev jî bên.

Tiştê ku kêfa mirov tîne û dibe sedem ku, digel ku li ser mijareke ciddî ne jî, mirov di ber xwendina nirxandinên Voltaire, Dîderot û Hume re ji kêfan bikene ew e ku ev pirsgirêka bingehîn –bawerkirin an bawernekirin- bi awayekî radîkal û aşkerebûneke rewşenbîrî ya ji derveyî hemû tirs û xeman hatiye nirxandin û nîqaşa wan jî li ser lêgerîna rastiyeke maqûl hatiye sazkirin. Mirov weha kêfa saf ya nîqaşan bi dest dixe… ku nîqaşên metafîzîk in, lê hewl didin ku li derveyî fikrên rûhanî bimînin. Di vira de, kêfeke xemgîn heye, lewre xebitandina ramaneke azad wê demê ji binî ve xeternak bû: Voltaire, gava ku Fîlozofê Cahil nivîsand, ji bîr nekiribû ku çend sal berî wê, cezayê mirinê li şovalyeyê bi navê de La Barre ku wî ji dil û can parastina wî kiribû hatibû birrîn û Ferhenga Fîlozofîk ku wî bi xwe nivîsandibû teva wî hatibû şewitandin. Dîderot jî bi xwe dît ku pirtûka wî ya yekem hat darizandin, afarozkirin û şewitandin, ji ber ku li dijî olê û adetên baş bû. Herçî David Humeyê ingilîz e, bêguman tedbîra xwe girtibû û ji ber wê pirtûka wî ya Diyalogên Li Ser Ola Xwezayî piştî mirina wî hate çapkirin.

Lê, ya herî baş, belkî ji ber wê ye ku ev lêgerîna sêqolî ya li ser wateya baweriya ji Xwedê ku mirov nikare bersivên wan bide ber hev, bi awayekî hevpar mirov ber bi şikbiriyê ve diajo (bingeha rasyonalîzma kartezyen), û bi vî awayî mirov herweha ji fanatîzma pêşderazîbûnê jî rizgar dike. Lewre, fîlozof serê xwe bi rehmê re naêşînin ji ber ku ew bi baweriyê ve girêdayî ye. Mijarên ku bala wan dikişînin, mijarên warê zanînê ne. Gelo mirov dikare çi li ser Xwedê bizane? Mirov nikare tu tiştekî jî bizane. Lewre, hişê mirov, yê ku xwedan sînoran e, nikare Xwedê fahm bike, lewre ew bê sînor e. Ecêb e. Lewre, piştî vê bêderfetiya hişî, tu qiymetê olê namîne: herkes di baweriya tiştên ku wî aş dike de serbest e. Di destê mirov de, ji ber bitenêtiyê, êdî bi tenê ew dimîne ku mirov bi rêzgirtina ji mirovahiya xwe re bijî. Hevaltiya bi Dîderot’ê ateîst, Voltaire yê bawermend û Hume’yê şikbir re, bi van hersê rewşenbîrên bêtirs re ku tê de xebitîn ku em derfeta peydakirina nirxên xwe bi dest bixin hê jî weke hercar kêfeke bêhemta ye.

EVELYNE PIELLER

Werger ji fransî
İbrahîm Seydo Aydoğan

(1) Ji bo fîlozof û rewşenbîrên sedsala 18’an digotin “Ronahî”, lewre nemaze li Fransa’yê mezintirîn rewşenbîran wê demê berhem dane. (Jêrenota wergêr).

(2) Voltaire, Le Philosophe ignorant, présentation et notes de Véronique Le Ru, Flammarion, Paris, 2009, 242 p.

(3) Denis Diderot, Entretien d’un philosophe avec Madame la Maréchale de***, présentation et notes de Jean-Claude Bourdin et Colas Duflo, Flammarion, Paris, 2009,106 p.

(4) David Hume, Dialogues sur la religion naturelle, traduction de l’anglais, dossier et notes de Magali Rigail, Folioplus Philosophie, Paris, 2009, 240 p.

(5) José Saramago, Caín, Edicions 62, Barcelone, 2009, 144 p.

MAFÊ KURTAJÊ

Paşila Dayikê

SABINE LAMBERT*

Mirov nikare xetera li dijî mafê jiberxwekirinê (kurtajê) bi tenê bi dema bendêmanê yan jî dema li ser lîsteya navendên dawî yên kurtajê mane xulase bîne ziman, tevî ku hemin gihiştina materyalên kurtajê pirsgirêkeke girîng dimîne. Ev xeter para bêhtir xwe bi awayekî neyekser nîşan dide û ne ji bereyê ve. Ev tehlûke ji ketina nav hev a gelek faktoran pêk tê. Di nava van de jihevcihêkirina di navbera "şexsî" û "siyasî" de jî heye ku bi awayekî bêqisûr tê kirin

21'ê Çile di bername ya "les maternelles (paşila dayikê)" ya kanala televîzyona France 5 de, jineke hestyar, kurtaja bêtevizandin a ku li nexweşxaneyekê hat serê wê, vedibêje. Em behsa kurtajeke ku beriya 40 salan pek hatiye nakin: Jina em behsa wê dikin emrê wê ji 25 salan kêmtir e û li keviya Parîsê (li banliyokê) dimîne. Bi rijandina hêsirên çavan keçik rêyên ku diviyabû ji wan derbas bibe kite bi kite vedibêje: Ji zor û zehmetiyên klasîk ên ji bo standina randevuyekê heta bi kurtajbûna wê ya bêanestezî ya li ser maseyekê di korîdoreke di nava çûn û hatina bêdawî ya xebatkarên nexweşxaneyê de. Di bernameyê de, dema keça ciwan behsa çîroka xwe dikir, rojnamevan ewqasî matmayî bû ku beriya ku ji doktorê tevlî programê bûyî bipirsê çawa tiştekî wisa hê jî li Franseyê dikare pek bê, pir caran li ser hev got "ev çi ecêb e!" Bi awayekî diyar doktorê jinan aciz e û weha li xwe mikur tê: Hin doktorên li dijî kurtajê hene û tolê ji jinên kurtaj dibin distînin. Ew kurtajên xwe bi zanîn bi awayekî jin pê biêşin û li ber çavan şerm bikin, pêk tînin.

Maneya vê ne ew e ku hejmarê kurtajên bêanestezî pir zêde ye – ango em dikarin hêvî bikin wisa ye. Li aliyekî weha xuya ye ku dema berê ya bikaranîna amûrên weke şûjin û ya vegirtina nexweşiyan bi dawî bûye. Lê belê wextê em hîna rastî hinan tên ku li ser ekografiyê "pitika" we nîşanî we dikin û bi awayekî ku we piçûk bixin ji we dipirsin "çawa çêbû hûn bi paşil û ducanî bûn? (Bi maneya, ma hûn nizanin xwe li dijî ducanîbûnê biparêzin?)" Divê beramberî vê em çi bifikrin? Li ser rêbazên kurtajbûnê divê çi bejin? Weke ku carinan tê gotin, bikaranîna dermanan ji bo kurtajbûnê, ji ber ku li şûna ameliyatê alternatîfekê pêşkeş dike, weke pêşketinekê tê qebulkirin, dikare hedî hedî bibe awayekî "xwe xilaskirina ji dema di odeyên nexweşxaneyê de"- bi taybetî van rojan ku cih li nexweşxaneyan kêm dibin.

Valakirina nexweşxaneyan ji jinên kurtajbûyî, dûrxistina van cahilan ji van odeyên nexweşxaneyan ku îbadetxaneyên bêqisûr û paqîj in, destûr dide doktorên me ku mirovên mezin in, xwe ji zehmetiya kurtjakirinê hêsantir xilas bikin û zêdetir wext dide wan da ku hêkdankê neqilî jinên wêrek bikin, yên ku zarok ji wan re çênabin. Ev jî ji IVG'yeke (kurtajkirineke) klasîk ya bi awayê kişandinê karekî bi kêrtir û bi rûmettir e.

Kurtajbûn weke xweparastina ji ducanîbûnê jî "karê jinên qenc e". Dema jin dibîne testa ducanîbûnê pozitîf e û biryar dide kurtaj bibe, tiştên ku li piştderiyê serşokê diqewîme, eleqeyê kesî pê nîne, kes serê xwe jê naêşîne. Yên ku difikirin berî her tiştî ev pirsgirêk ya jinan e hemû yek dengî dibêjin: Helbet, madem hilbijartin a wan e, beden a wan e, wan bi xwe daxwaza vê azadiyê kir, çi pê dikin bila bikin. Wisa xuya ye ku bi tenê cinsiyeteke exotîk û hinekî dijber, derveyî exlaqê dikare ji qada "şexsî" derkevê. Tevî ku jin ji lîstîna bi "sex toy" ên nû derketî bêhtir, piraniya wexta xwe bi paqîjkirina avdestxaneyan, bi mezinkirina zarokan û bi şepirzebûna ji bo mûçeyekî ji ya heqê wan hindiktir derbas dikin.

Wisa xuya ye, bi tenê wexta jin bedew û seksî ye maneya jiyana wê heye. Lê piranî ev ne xisleta mezin a kurtajê ye ku gelek caran pêkanîna wê di destê mîlîtanên dijberî kurtajê de tê hiştin. Ew jî bi kêfxweşiyeke mezin û bi awayekî gelekî cidî dest diavêjin vê mijara kurtajkirinê. Bi rastî jî ew li Franseyê kêm in (li gorî hêjmara wan a li Spanya, Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê û Emrîka Latîn ku ji ber giraniya dîn bêhtir dij-kurtajvaniye dikin) lê belê gotinên wan digihêjin guhên kesên amade ne alî bigirin û belav dibe. Rohniyên nerm ên ku çapemenî bi kar tîne piştgiriya wan bi awayekî rojane dikin, û ji bo afirandina amûrên modern ku dikin jin di tarîtiya psîkolojî û derûniya xwe ya lawaz de bi tena serê xwe bimîne, alîkariya wan dikin. Yên "jiyan-perest" ku ev rewş bi kêrî wan tê, li ser malperên xwe yên înternetê bi awayekî pir nazik bersivê didin jinên "bêçare û bêgav" ên ku dema dixwazin kurtaj bibin vê medyayê her diçe zêdetir bi kar tînîn.

Nirxandina wan weke komeke zanyarên muhafezekar wê bibe şaşiyek: Hêdî hêdî dev ji derewên zêde eşkere, sloganên hişk û provokasyonên neqanûnî berdidin û malperên xwe yên înternetê her diçe zêdetir dişibin pêvekên rastî yên wezareta tenduristiyê. Dikare mirovekî bi hêsanî şaş bike.

Bi ser de jî navên weke "navenda neteweyî ya guhdarîkirinê (centre national d'écoute)", xwendina zanîngehê ya bi ingilîzî û hejmarên telefonê yên belaş bi kar tînîn û rewabûneke rastî ji xwe re ava dikin.

Bi vî awayî destên xwe bi hêsanî digihînin qada "pirsgirêkên psîkolojîk" a jinên kurtaj dibin. Yek ji wan "sendroma piştî kurtajbûnê" ye ku qaşo jinên kurtajbûyî hemû pê dihisin.

Di van malperan de jinên ku biryar dane zarokê ji ber xwe bikin, weke erdên talan bûyî ku bi tevahiya tehlûkeyên cihanê re rûbirû ne, behsa wan tê kirin. Dibêjin kurtajbûn rê li ber alkolîkbûnê vedike, jinên kurtaj dibin zêdetir xwe dikujin, hêsantir dikevin nav lepên tenetiyê, xizaniyê û bêhtir dikarin ji karê xwe bên derxistin. Ev terîfên reş û tarî piranî bi nivîsên gelekî helbestvanî li ser "daxwaza dayikbûnê" ku hêzeke veşartî ya di xwezaya her jinê de heye, tê dîtin. Dibêjin her jina rêzê ji xwe re digire xwediyê vê hestê ye û divê carinan hin kes zorê lê bikin da ku vê hestê derxin holê. Di vê çarçoveyê de nîqaşên dijberî kurtajê tevlî fikrên ji aliyê pir kesan ve hatî qebûl kirin dibin. Li gorî wan dayikbûn ne hilbijartinek e belê hêzek e ku ne di destê jinan de ye. Nîqaşên heyî yên li ser mijara "redkirina ducanîbûnê" vê nêrîna ku rewşa psîkolojîk dinirxîne, xurttir dike û kapasîteya jinan a biryardana, ya ji wan re baş an jî xirab, tine dihesibîne. Ji bo vê bike jî teknîka gelekî hêsan "bandora mercekê" bi kar tîne (rastîyeke piçûk gelekî mezin dike û dike rastîya bi tenê).

Eger em vê yekê li loda gotarên bi awayekî birêkûpêk xîtabî rêjeya bilind a zarokanînê ya fransiyan dikin zêde bikin, çawa em matmayî bimînin ku di rewşeke bi vî rengî de zehmet e mirov biryara jiberxwekirina zarokê bide? Çawa mirov karibe di encama vê de kurtajbûnê ne weke "trajediyeke mecbûrî" bibîne? Lewra pispor hemû li ser kaxezên spî ji me re weke birîneke nakewe û jênaçe ya li ser xwezaya jinê û binketina jiyaneke weke jin, rave dikin. Li hemberî êşandin û arandina bi rastî ya buyêreke ku bi tenê karîbû biêşîne, em ê çawa mat-

** Hevpara malpera Les Entrailles de Mademoiselle "zikê dayikê yê keçê" (www.entrailles.fr)*

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

mayî bimînin? Da ku em karibin encamên van pêşdîtinên xwe bi xwe bibînin, divê em çavên xwe li ser malperên foruman ên înternetê bigerînin yên ku di wan de jinên kurtajbûyî gazinan ji rewşa xwe dikin. Yên ku cesaret kirin li dijî ya ku xweza û “ajoyên wan ên jinane” li ser wan ferz dike di ser xwe re bibihurînin, wisa xuya dike ku bêqisûr cezayê xwe qebûl dikin. Ev yek xwe bi xewnereşkan, hebûna zarokeke xeyalî ya mezin dibe, a ku rojbûna wê heye dide der. Ev yek xwe bi hesteke giran a gunehkariyê, tirs, tenêbûn û şermê nîşan dide. Armanc ew e ku yên naxwazin vê êş û poşmaniyê hîs bikin jî, werin bêdengkirin, helbet eger naxwazin weke anormal, bêdil (bêrehm) û nexweş werin dîtin.

Mirov nikare xetera li dijî mafê jiberxwekirinê (kurtajê) bi tenê bi dema bendêmanê yan jî dema li ser lîsteya navendên dawî yên kurtajê mane xulase bîne ziman, tevî ku hemin gihiştina materyalên kurtajê pirsgirêkeke girîng dimîne. Ev xeter para bêhtir xwe bi awayekî neyekser nîşan dide û ne ji bereyê ve. Ev tehlûke ji ketina nav hev a gelek faktoran pêk tê. Di nava van de jihevcihêkirina di navbera “şexsî” û “siyasî” de jî heye ku bi awayekî bêqisûr tê kirin. Weke mînak xwe di helwesta Buroya Parastina Penaber û Bêwelatan a Fransewî (OFPRA) de dide der. OFPRA îdîa dike ku destavêtin û şîddeta jin pêre rûbirû dimînin ne sedem in ku ji bo mafê paneberiyê werin qebûl kirin. Îdîa weha dewam dike “lewra ev pirsgirêkên eleqedarî “jiyana wan a şexsî ne (1)”.

Vê dubeşbûnê derfet da peydebûna qederên dîrokê, û ferzkirinên qanûnên taybet û di nav xwe de hilgirtî. Vê jî, bi riya pêvebûn û girêdana jinan a bi xwezayê û qada malbatê ve ya her tê nûkirin, dike. Hingî jî jin weke ruhberên ji mêr “hindiktir civakî” tên dîtin. Ev jihevcihêkirin e ku her jina lêdan xwarî li berpirsiyariyên wê vedigerîne yan jî destûrê dide mirov li ber hejmarên giriyê mirovan bi wan were yên dabeşkirina karê nava malê, neçar bimîne milê xwe kilke.

Ev pirsa dawî pirî caran dibe sedema henekpêkirina tahl a wan kesên ku gelekî kêm caran radihêjin melkesekî. Ev pirs anektodîk (bi şêweyê serboriyê) nîne: Ew derdixe holê ku têkiliyên di navbera cinsan de, dibe ku ferdî bi aheng bin, lê pêwendiyên civakî li hesabê evîndarên bêgiraniya civakî neyê jî ne wisa ne. Ew berhemên têkiliyeke hêzê ne. Eger mijar bi awayekî nerm guhertina “mentalîteyê” be, çawa femînîsta fransewî Colette Guillaumin gotî “divê em li ser pêkanîna perwerdekirina patronan û rêveberan bihizirin da ku ew wezîfeya xwe di hilberînê yan jî nivîsîna bi mekîneyan bi cih bînin” da ku her weha “bi riya reformên mentalîteyê” em bikevin ser riya veguherîna “civakeke dibişire (2)”. Ev dubeşbûn e ya ku destûr da tibê ku li gorî daxwaza xwe û rewşa xwe ya wê kêliyê, bi ser de jî ji her cezayî parastî, biryarê bide ku jêrnexweşa (nexweşa nirxê wê kêm) li ser maseya wî, dikare her weha gelekî rihet were bêruhkirin (bi anesteziyê tevizandin).

(1) Binêre li Jean-Marc Manach, “Le viol des réfugiées “relève de leur vie privée” (destavêtina penaberan “nîşana jiyana wan a şexsî”), Bugbrother.net, 11’ê Kanûna 2009’an.

(2) Colette Guillaumin, Sexe, race et pratique du pouvoir, L’idée de nature (cins, nijad û bikaranîna desthilatdariyê), weşanên Indigo et Côté femmes, Parîs, 1992, rûpel 231.

DO-ÎRO

Japonya di nava Şerê Cîhanê yê Yekem de

CHRISTIAN KESSLER*

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

Vekirina deriyên Japonya'yê ku di sala 1854'an de bi zora keştiyên reş yên amîralê amerîkî Matthew Calbrait Perry pêk hat, berê Japonya'yê da pêşbirkeyeke mordenîzasyonê. Heta wê demê, bi tenê lengergeheke japonî ji bo bazirganiya navneteweyî hebû. Perry'ê ku fermanderê hêzeke deryayî ya weha bû ku jê re digotin "keştiyên reş" û ji amerîkî, brîtanî, fransî, holandî û rûsan pêk dihat, peymana bazirganiyê ya yekem li ser Japonya'yê ferz kir (1). "Dîplomasiya bi topan" (gunboat diplomacy) ku bû sedema piçûk- xistin û êşandina Japonya'yê, herweha bû sedem ku ev welat ji nû ve berê xwe bide hêza çekdariyê. "Welatê dewlemend, artêşa xurt" êdî bû yek ji sloganên dema Meiji. Ji ber ku li gora Rojava'yê gellekî li paş mabû, Japonya'yê ji binî ve berê xwe da dibistana Rojava'yê û zanîna wê ya di hemû waran de ji xwe re bi kar anî.

Piştî du sedsalên ku xwe ji dinyayê îzole kiribû, êdî bi tenê fikreke wê hebû: Bibe împaratoriyeke koloniyal. Ev projeyên xwefirehkirina ber bi dinyayê ve ku yek ji bingehên îdeolojiya Meiji'yî ye, ji berê de hene. Hê di sedsala 17'an de, Toyotomi Hideyoshi ku şogun'ek bû, ketibû nava maceraya weha ku Çîn'ê werbigire û tu paşeroja wê tunebû. Japonya ya ku dev ji ya xwe berneda, di navbera deh salan de kete nava du şerran: Berê li dijî Çîn'ê (1894-1895), bi dû re li dijî Rûsya'yê (1904-1905) ku serkeftineke gellekî mezin bi dest xist û bû serkeftina yekem ya li dijî neteweyeke ji "nijada spî." Wê Kore bi dest xist, Formos bi dest xist, Başûrê Sahalîn'ê bi dest xist û li Başûrê Mandşûrî'yê herêmeke ji hêla aborî ve gellekî balkêş xist bin parastina xwe. Yanî, hertişt ji bo vejandina wê maceraya mezin ya sedsala 1'an amade bû û ew

** Dîroknas, profesorê Athénée Français ya Tokyo'yê, mamosteyê zanîngehê.*

jî vegirtina Împaratoriya Navîn bû. Berî Şerê Cîhanê yê Yekem, hêzên rojavayî jî fahm kir ku divê hesabê vî welatî jî bikin.

Armanca japoniyan erda Kiao-Tcheou bû, yanî lengergeha Tsing-Tao (îroj navê wê Qingdao ye) û derdora wê ya herêma Shangtoung ku li Çîn'ê ye. Wê demê ew herêm di destê almanan de bû û almanan ew sala 1898'an ji bo nodûneh salan ji berpirsên çînî kirrîbû. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de derfeta bidestxistina vê herêmê peyda dibe. Ji ber wê, Brîtanya'yê sala 1902'an teva Japonya'yê hevkariyeke êrîşa vê deverê pêk anî. Peymana wan di 1907'an û 1911'an de hate nûkirin û li gora wê, hevbendiyeke xurt li dijî îhtîmala êrîşeke li ser herdu aliyan hate avakirin.

Herweha, gava ku di 7'ê Tebaxa 1914'an de London'ê ji Tokyo'yê xwest ku hayê wê ji hêzên almanan yên deryayî yên li Pasîfîk'ê hebe, desthilatdariya japonî ji rewşê îstifade kir û ultîmatomek şand ji Berlîn'ê re û jê xwast ku keştiyên xwe ji nav ava Çîn û Japonya'yê vekişîne. Digel ku Kayserê Almanya ev daxwaz qebûl nekir û brîtaniyan jî ji nişka ve xwe nerm kir, japoniyan bi dorpêçkirineke bejayî û deryayî û bi operasyoneke kirt Tsing-Tao bi dest xist. Digel ku hevkariya hêzên deryayî ya brîtaniyan re gellekî piçûk jî bû, berpirsên japonî guh nedanê û êrîşî welatekî weha kir ku hiqûqa wê destûrî û bingehê doktrîna wê ya milîter danîbû. Encama vê serkeftina meha çiriya pêşîn ya 1914'an: Nêzî pênc hezar girtiyên alman, herweha awusturî, macar û polonî di kampên Japonya'yê de hatin bicihkirin.

Di destpêkê de girtî li deverên gellekî bi qiymet û parastî diman ku bi awayekî ecele di nava perestgehên Bûdîst de an jî di nava avahiyên fermî yên şaredariyan de hatibûn avakirin. Nêzî duwazdeh avahiyên demkî li Başûrê Girava Honşû'yê û herweha li herdu giravên beranber Şîkokû û Kiyûşû'yê ji bo van girtiyên hatin avakirin. Meha Nîsan û Gulana 1915'an, nûnerkî alman N. Drenckhahn li ser vexwendina wezîrê japonî yê deryayan çû kampan sax bike. Vî nûnerî nivîsandiye ku du sed girtiyên Tokuşîma'yê rojnameyek û orkestrayek damezirandiye û hejmara vê rojnameyê ya yekem jî di nîsana 1915'an de derketiye (2).

Gellek ji van girtiyan ne leşker in û ji bêtir pispor in ku ji bo pêşketina erda kolonyal Almanya'yê ew şandine Tsing-Tao'yê: Teknîsyen, endezer, karkerên cotkariyê, yên înşaatan û gellek bazirgan. Herweha rewşenbîrên wek rojnameger û weşanger, hiqûqnas û mamoste û yên din jî di nava wan de ne. Ji ber ku li gora peymanên navneteweyî girtî nikarin bi zorê werin xebitandin, hingê ew jî ji xwe re meşgaleyan ava dikin. Bê guman, qet pêdivî pê tune ye ku mirov bibêje ku tu peywendiya van kampan û kampên dema Şerê Cîhanê yê Duyem bi hev re tune ye.

Balyozxane ya Awusturya'yê ya Tokyo'yê, bi mebesta salvegera peymana Versailles'ê, li kampa Aonogahara'yê ku sala 1915'an ji bo du sed û pêncî alman û du sed û sîh awusturiyên (awusturî-macarî) hatiye avakirin, pêşengeheke dîmenên wê demê vekir. Di dîmenan de tê dîtin ku girtî di çewlik û febrîqeyan de dixebitin, ji bo ku abora xwe baştir bikin berazan xwedî dikin an jî baxçeyê wan heye. Girtî, bi xelkê deverê re di peywnediyê de ne, bi xwendekaran re bi topê dilîzin û konseran didin.

Bê guman, hertişt ne pembe reng e. Mirov dikare bifikire ku ev zilam li wê devera ku nas nakin bi saw in, devera ku zabit û leşker ji hev cuda ne; mirov dikare li pevçûnên di navbera van welatparêzên ku bê cih û warê taybetî dijîn bifikire; wê devera ku şerê navbera alman û poloniyan lê heye û hêviya dawiya şerrî gellekî dûr xuya ye. Pêşengeh herweha dide zanîn ku Alzas'ekî ji ber ku hemwelatiyên wî yên alman gellekî tahde li wî kiriye, çûye û xwe xeniqandiye jî. Destpêka sala 1916'an, li ser daxwaza almanan, şandeyeke balyozxaneya Amerîka ya ku wê demê hê di pevçûnên navneteweyî de bêalî bû, diçe kampê û lê dinihere ku di derbarê hîjyenê de şertên jiyînê ne ewqasî baş in. Şande gazindên girtiyan jî ku ji rewşa xwe nerazî ne dinivîsîne.

Ji sala 1917'an û bi şûn de, berpirsên japonî hewl didin ku şertên jiyana girtiyan baştir bikin û bi xema maqûlbûnê, wan li şeş kampan belav dikin û heta serbestberdana wan ya sala 1920'an jî li wira dimînin. Hezar girtiyên ku li girava Şîkoku, Matsuyama, Marugama û Tokuşîma'yê diman, sala 1917'an li bakurê giravê, li kampa Bando'yê, ku li ser erdeke pênc hektarî ava bûbû ku berê garnîzonên artêşê lê bûn.

Weke kampên din, li Bando'yê jî rojnameyek heye û hema li nava kampê sê sed mînakên wê tên çapkirin û behsa çalakiyên navxweyî dike: Perwerdehiya laşî, futbola ku ew bi xwe dibin wê deverê, avjêniya nava çemê nêzîk, konferansên curbecur li ser şaristaniya çînî, û herweha li ser mijarên dîrokî, li ser jeolojiyê, li ser sosyolojiyê, lê herweha temaşaya şanoyê û weke hemû kampên din konser jî. girtî herweha dikarin alîkariya cotkarên herêmê jî bikin û bibin şêwirmendên wan jî. Ew dikarin teknîkên amadekirina goştê berazan li nava xelkê belav bikin, amadekirina alkolê nîşanî wan bidin û çêkirina penêr fêrî wan bikin, lê herweha wan fêrî çandina frîngiyan, petatan û lehanayan jî bikin.

Cara yekem li vê deverê orkestraya kampê teva koroyeke weha ku bi tenê ji zilaman pêk dihat Senfoniya Nehemîna Beethoven lêxistiye û li Japonya'yê bi xwe jî ev beste weha navdar bûye. Îroj bi xwe jî, zivistanan, li seranserê welêt, çi li bajarên mezin û çi li yên piçûk, di dema sersalê de li her deverê ev senfonî hevaltiya derbasbûna sale dike û êdî ewqasî belav bûye ku Michel Wasserman nivîsandiye ku ev sîrûd êdî bi awayekî bûye weke "ciwanokeke hemdemiya japonî (3)."

Sala 1970'ê, sala dusedemîn salvegera jidayikbûna Beethovenî, rexnegirê muzîkê Hidekazu Yoshida, di rojnameya Asahi de bal dikişand ser ku sirûda kêfxweşiyê êdî weha bûbû ku bûbû sirûda neteweyî ya duyem (4).

Hezîrana sala 1919'an, Peymana Versailles'ê rewşa girtîbûnê baştir dike; sala piştî wê jî girtî serbest tên berdan. Hin ji wan dîsa vedigerin Çîn'ê, hinên din ji xwe re li Japonya'yê bi cih dibin, weke Hermann Bohner'ê ku wê bingehên japonolojiya alman daniye. Îroj, bajarê Naruto yê kampa Bando'yê ya balkêş veguherandiye û kiriye sîteyeke dîrokî û tûrîstîk ku japonî gellekî jê hez dikin. Di vê sîteyê de navendeke lêkolînên li ser jiyana li kampê heye ku li "Mala Almanya'yê" ye û herweha parqek jî heye ku navê wê "Gundê Alman" e. Li muzeyê, Senfoniya Nehemîn bi dengê koroyeke zilaman hey lêdixe. Dostaniya Japonya'yê û Almanya'yê li her deverê bi pêş hatiye derxistin. Herweha, biratiya di navbera girtiyan û xelkê herêmê û gardiyanên wan jî û atmosfera kampê ya nedîtî di bin birêvebiriya berpirsê wê yê humanist jî li her deverê eşkere dibe... Nêrîneke balkêş ku bi awayekî zêde mubalaxakirî û bi vî awayê xwe, weke ku Wasserman jî bi mafdarî bale dikişîne ser, dîrokê jî piçekî diguherîne. Bi awayê pêşkêşkirina van kampên gellekî baş, nîherîna wan hewil dide ku rewşa kampên dema Şerê Cîhanê yê Duyem ku li gora van kampan "qezayeke dîrokê ya weha ku mirov li ber dikeve (5)" bide jibîrkirin.

Ji dema Şerê Cîhanê yê Yekem de bûyereke din ku nayê naskirin, peywendiyên wan yên bi Fransa'yê re ne. Herdu welat ji sala 1907'an ve bi du peymanên yek bazirganî û yek diplomatîk bi hev girêdayî ne. Peymana dîplomatîk rêzê li deskeftiyên herdu aliyan yên li herêmê digire ku ev jî li ser navê wê polîtîkayê hate kirin ku jê re digotin "break-up of China", yanî dabeşkirina Împaratoriya Navîn. Tokyo herêma bandora Parîs'ê ya li hersê herêmên Başûrê Çîn'ê (Guangdong, Guanksi, Yunnan) nas dike û sozê dide ku li dijî berjewendiyên Fransa yên Hîndûçîn'ê tevnegere. Fransa jî li dijî herêmên bin destê Japonya'yê tev nagerre, bi taybetî li Başûrê Mandşûrî'yê û li Moxolistan'ê. Ji bilî vê daxwaza birrîna baskên çînî, ev peyman ji bo Parîs'ê awantaja dortengkirina Almanya'yê bû. Weke ku bi dû re diyar bû, sebebên wê jî hebûn.

Ya jê balkêştir jî ew e ku Fransa ya ku bi awayekî eşkere li hêza japonî ya nû heyirîbû, weke ku Raymond Poincar'é di bîranînên xwe de radigihîne, kete nava hewldanekê ku di hefteyên şerrî yên pêşîn de alîkariyeke Japonya'yê ya leşkerî wergirta û ev alîkarî wê bi şiklê şandina yekîneyan ya ber bi eniya ewrûpî ve pêk bihata (6). Bi vî awayî, berpirsê leşkerî yê li Tokyo'yê, fermandar Lerond, bi Serokê Konseyê René Viviani dide fahmkirin ku Japonya amade ye ku "gellek yekîneyan" bişîne. Viviani hema di cih de vê agahiyê digihîne Konseya Wezîran.

Balyoz Eugène Régnault ji Serokwezîr Shigenobu Okuma re behsa heman mijarê dike û jê dipirse; hayê Viviani jî pêdixe ku Okuma "qet şaş nemaye û bişiri ye." Li gora Poincaré, Viviani'yê ku ji ber nûçeyên nexweş yên ku ji eniya rûs dihatin ketibû taswasan, sere çileya pêşîn li hember Konseya Wezîran dibêje ku dive; "Bihayê çi be jî bang li japoniyan bê kirin ku werin Ewrûpa'yê û em heqê vê alîkariya wan jî bidin, heqê wê çi be jî û ew hema çi bixwazin: Hîndûçîn'ê jî bixwazin, bila be."

Di rojnivîska xwe ya bi navê L'homme libre (Mirovê Azad) de, Georges Clemanceau bêtir bi tedbîr e: "Gava ku mirov hesabê îhtimala hatineke artêşa japonî ya eniya me dike, mirov dibêje qey xeyal e (7)." Û dibêje; "lê dîsa jî, yekî ku ji aş û baş napeyive ji min re dibêje ku sê sed hezar japonî amade ne ku di du mehan de werin peravên me." Clemanceau bawer dikir ku ewê hêsantir û bikêrtir bûya ku Japonya di rêya Transîbîrya'yê re bihataya alîkariya Rûsya'yê.

Axir, Wezîrê Karên Derve Théophile Delcassé wê heyecan piçekî aşt bikirana û wî yê bal bikişanda ser ku bazara bi berpirsên japonî re ne ewqasî hêsan e û di vê mijarê de dudil in. Wî yê bida zanîn ku "dilê Japonya'yê qet nine ku Hîndûçîn'ê bi dest bixe, lê belê dixwaze ku danûstandinên wê yên gumrukî yên bi koloniya me re weke peymana bi Fransa'yê re were diyarkirin (8). Konsey destûrê dide Delcassé ku soza vê tawîzê bide (9)." Digel hemû hewldanan jî herdu alî nikarin li hev bikin. Tu yekîneyên japonî wê neyên Fransa'yê. Herçî pirsgirêka mafên gumrukê ye, ewê bigihije serî... Di dema Şerê Cîhanê yê Duyem de, gava ku hêzên japonî gulana 1941'ê ketin Hîndûçîn'ê, û dû re jî bi êrîşa 9'ê Adara 1945'an -Japoniyan êrîşî garnîzonên fransî kir- ya ku wê bibûya dawiya desthilatdariya Fransa'yê.

Ev banga Parîs'ê ya ji bo Japonya'yê, ji bilî naîfiya xwe, herwiha nîşan dide bê hin endamên hikûmeta fransî li hember bûyerên ku karîbû di destpêka şer de, piştî pevçûnên bi Almanya'yê re derketana holê çiqasî bêhêvîbûn. Japonya'yê berî hertiştî hewl dida ku beyî ku tev lê bibûya ji vê rewşê îstifade bikira. Bi ser ket jî. Wê ne bi tenê Senfoniya Nehemîn bi dest bixista: Peymana Versailles'ê wê destkeftiyên alman yên li Çîn'ê jî bidana wê.

Werger ji fransî
Îbrahîm Seydo Aydoğan

(1) Bixwine "Le Japon inconnu" (Japonyaya nenas), Manière de Voir, n°105, Hezîran-Tîrmeh 2009.

(2) "Zeitungesarbeit in Japanischer Kriegsgefangenschaft: Ein Uberblick am Beispiel der Lager Tokushima, Matsuyama und Bando", Deutsche Gesellschaft für Natur - und Völkerkunde Ostasiens (OAG), Notizen, Çiriya Pêşîn, 2005, r. 10 à 31.

(3) Michel Wasserman, Le Sacre de l'hiver: la Neuvième symphonie de Beethoven, un mythe de la modernité japonaise, (Pîrozîya Yivistanê: Senfonîya Nehemîn ya Beethoven, ciwanokeke hemdemî ya japonî), Les Indes Savantes, Paris, 2006.

(4) Çavkanî: Michel Wasserman, ibid.

(5) Michel Wasserman, ibid.

(6) Raymond Poincaré, Au service de la France. Neuf années de souvenirs, (Di xizmeta Fransa'yê de) tome V, L'Invasion, Plon, Paris, 1928. Jibergirtinên vê paragrafê ji vê çavkanîyê ne.

(7) L'Homme Libre, (Mirovê azad), Paris, 16 Tebax 1914.

(8) Fransa û Japonya herduyan jî ji xala neteweyên herî xurt îstifade dikir, lê belê Hîndûçîn li derveyî vê peymanê bû.

(9) Raymond Poincarré, ibid.

YEKITIYA EWRÛPA - TIRKIYE

Pêvajoya endametiyê û pirsgirêka kurd

PROF. DR. GÜLİSTAN GÜRBEY*

Perspektîfa endametiya YE'yê û siyaseta YE'yê ya şertdanînê bandoreke êrênî li ser demokratîzekirina Tirkiye'yê kir ku nabe mirov vê yekê nebîne. Lewra hê jî divê ev motorê demokratîzekirinê li ser piyan were hiştin û bike bi pêvajoya demokratîkbûyînê re jî bi awayekî çêker bimeşe. Bi hevpariya endametiyê û raporên pêşketinê yên perîodîk ên Komîsyon'ê di destê YE'yê de amûrek heye ku pê dikare ji bo gav bi gav pêkanîna Pîvanên Kopenhag'ê zorê bike.



Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

Bandora demokratîkker a perspektîfa endametiya YE'yê

Ji dema ku Tirkiye weke namzetê endametiya YE'yê hatî qebûlkirin û vir ve, ango ji Kanûna 1999'an û vir ve pêvajoyeke berfereh a reforman a siyaseta hundir dimeşe. Îhtîmaleke gelekî piçûk bû ku ev pêvajo bêyî perspektîfa endametiya YE'yê pêk bihata. Ev reform girîng in, lewra mijara wan pirsên nazik ên demokrasiya Tirkiye'yê ne, weke mînak mafê mirovan, parastina hindikahiyan, artêş û hwd. Bi vê pêvajoyê re pêvajoyeke nîqaşê ya siyaseta hundir a di navbera alîgir û dijberên endametiya YE'yê de jî hemwext dimeşe. Dijberên reforman dixwazin statûquoya siyasî bimîne û ditirsin, eger daxwazên YE'yê pêk werin dewleta yekpare ya neteweyî û çandî hilweşe. Yên ku di nava vê komê de cihê xwe digirin di serî de rêveberiya eskerî, rêxistina ewlekariyê (polîs), hin beşên dadgeriyê û burokrasiya dewletê ne; di qada siyasi de ev hêzên miletgir û neteweperest û hin beşên muhafezekaran in. Rêveberiya eskerî endametiya YE'yê weke parçeyekî pêvajoya rojavayîbûnê ya kenalîst dibîne û weke ku dewleta yekpare ya yekperest bi pîvanên YE'yê li hev dike, li mijarê dinêre. Lewra weke prensîp, endametiya YE'yê ya Tirkiye'yê erê dikin û heta ku reform dest nedin hîmê Kemalîst ê dewleta netewe ya yekpare, bi awayekî erenî li pêvaj- oya reforman dinêre. Alîgirên reforman bi xwe dixwazin pêvajoya demokratîkbûyînê bi YE'yê bi leztir bibe û ji bo reformên berferehtir têdikoşin. Di vê ko-mê de di serî de hêzên lîberal, partiyên kurdan, rêxistinên sivîl (di navê de yên kurdan jî hene) û hêzên aborî (weke yekîtî û komelên şîrketan) cih digirin.

Astengî û pirsgirêkên li pêşiya pêkanîna reformên ketine meriyetê nîşan didin ku Enqere hê di navbera naverokên kevneşop, dogmatîk û meylên lîberalbûnê de diçe û tê. Ev yek herweha nîşan dide ku di nava hêzên dewletê de hê lihevkririnek li ser guhertineke girîng a têgihiştina kevneşop a siyasetê û naverokên wê nîne, da ku îradeya siyasî derxe holê, ev îrade qutbûna ji têgihiştina dewlet û neteweya homojen pêk bîne û aligirê demokratîkbûn û lîberalbûneke girîng û domdar a welêt be. Tevî ku pêvajoya reforman têra xwe dînamîka xwe pêş xistiye û lewra weke zehmet e paşve were zîvirandin xuya bike jî, ev karê zehmet hê dimîne.

Nîqaşkirina mijarê di siyaseta hundir de nîşana karekî zehmet ê perspektîfa endametiyê ye ku li pêşiya kesên li Enqerê biryarê didin e. Em vî karî bi nav bikin; redkirina hêmanên neteweyî û dogmatîk ji bo demokrasiyeke liberal û dewleta huqûqê ya bêkêmasî dixebite. Şerê di siyaseta hundir de li dor van konseptan tê kirin, bi dawî nebûye û wê bandoreke reng bide biryaran, li pirsa endametiya YE'yê bike.

Siyaseta kurd a Tirkiye'yê hê jî di navbera dogmatîzm û lîberalbûnê de ye

Herî dereng, bi pêvajoya endametiyê ya dewam dike ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd û bi vê re jî ji bo qada tevgerê ya siyaseta kurd a tirk, çarçoveyek hat danîn. Tevahiya hêzên ji rêûresma Kemalîst (artêş, burokrasî, dadgerî, hin beşên siyasetê û raya giştî) ji destpêkê ve ev yek erê nekir. Belê niha êdî em dikarin bibînin ku kes vê çarçoveyê êdî red nake, lê kitekit timûtim dibin û wê bibin mijarên ezmûnên dijwar û nîqaşên dijber ên ku li ser wan gotûbêjên siyaseta hêzê çêdibin.

Çarçoveya siyasî ya behsa wê hatîkirin, bi Pîvana Kopenhag'ê "rêzgirtin û parastina hindikahiyan" peydebû: Bi awayekî berçav maneya vê, derfeta qebûlkirina mafên çandî di qada ferdî de ye – ne kêm û ne zêde! Maneya vê kite bi kite çi ye, ev ê çawa pêk were? Jixwe nîqaşên li dora pêvajoya reforman a salên derbasbûyî nîşan da ka çiqasî zehmet e li ser vê xala ku di destpêkê de kêm bi pirsgirêk xuya dike (rêzgirtin û parastina

** Prof. Dr. Gülistan Gürbey,Doçenta Înstîtûya Otto-Suhr a Zanista Siyasetê li Zanîngeha Azad a Berlîn'ê*

hindikahiyan) jî alî li hev bikin. Reformên heta niha dewam dikin û yên pêk hatî yên pêwendîdarî pêkanîna vê pîvanê, eşkere nîşan didin ku ev maf bi tenê di çarçoveya yekparebûna dewletê û prensîpa yekîtiya dewlet û netewe de dikarin bên qebûlkirin. Ev jî dibe sedem ku reformên ji bo ferehkirina azadiyên ferdî gelekî sînordar werin amadekirin û pêkanîn. Dewleta netewe ya yekpare bi prensîpa xwe nabe were guhertin û bi destûra bingehîn tê parastin. Daxwazên siyasî yên berfereh ên weke federasyon û xweseriyê weke hedefên armanca wan cihêbûn tên nirxandin û redkirin. Lihevkirina neteweyî ya siyaseta kurd a dewleta tirk di vir de ye ku îro jî di navbera dogmatîzm û sistkirin ango lîberalbûnê de diçe û tê.

Di çarçoveya reformên hatî destpêkirin de pirsa navendî ya gelo reform wê bandorê bikin da ku siyaseta kevneşop a kurd a dewleta tirk biguhere. Eger erê heta çi radeyê û ev ê di qada mafên siyasî û çandî yên gelê kurd çiqasî bibe sedema başkirinan.

Beriya her tiştî divê were tesbîtkirin ku hevpariya endametiya YE'yê yekser girêdayî pirsgirêka kurd nayê girtinî dest. Ne gotinên "kurdî/kurd" ne jî "hindikayî" tên bikaranîn. Di raporên pêşketinê de bi giştî peyvên "mafên çandî, mafên çandî yên kurdan" û "hindikahî" û dema yekser tê binavkirin jî "rewşa li Başûrrojhilat" tên bikaranîn. Ev nêzîkatiya tevlîhev û zehmet a ku pê navê pirsgirêkê nayê hildan û bi tenê bi awayekî neyekser îşaret pê tê kirin, nîşan dide ku YE hewl dide rêzê ji berjewendiyên tirk re bigire. YE pirsgirêka kurd li Tirkiye'yê di serî de bi awayekî giştî di çarçoveya mafên mirovan û demokratîkkirina welêt de dinirxîne.

Li gorî vê, tedbîr û gavên ku armanca wan dan û misogerkirina mafên koman e destek nake, belê bi tenê palpiştiya rûnandina mafê mirovan û demokratîkbûyînê dike. Li gorî nêrîna YE'yê dan û misogerkirina mafên mirovan û welatiyan ên ferdî, mafên çandî û her weha başkirina rewşa aborî û civakî li Başûrrojava dikevin vê çarçoveyê. Tevî ku bi awayekî yekser û diyar navê kurdan di hevpariya endametiya YE'yê de nehatiye hildan, divê mirov heqê wê bide ku şertên behsa wan hatî kirin, rewşa welatiyên kurd jî di nava xwe de dihewîne.

Ji bo Enqerê gelekî girîng bû û hê jî gelekî girîng e, di hevpariya endametiyê de bi awayekî eşkere navê kurdan neyê hildan û behsa dan û misogerkirina mafên çandî û siyasî ji bo vê komê neyê kirin. Belê ji Enqerê hat vê armanca xwe serketî pêk bîne, lê dîsa jî pêkanîna pîvana endametiyê ya siyasî ya Kopenhag'ê "rêzgirtin û parastina hindikahiyan" ji bo rayedarên xwedî erka biryardayînê yên tirk ezmûnek biryardanê ye.

Aliyê tirk serê pêşî dixwaze sererastkirinên di çarçoveya paketên bi YE'yê re lihevkirinê de yên pêwendî "rêzgirtin û parastina hindikahiyan" heta jê tê sinordarkirî çêke. Du armancên vê yekê hene, ya pêşî hîmê têgihiştina dewletê û netewe nexe tehlûkê, ya diduyan jî xweseriya kurdan a çandî weke kom qebûl neke. Li piştperdeyê hisa tehlûkeyê, fikra "qebûlkirineke bi destûra bibgehîn dibe ku bibe sedema meylên cudaxwaziyê" heye. Lewma li gorî nêrîna rayedarên tirk divê reform bi rengekî pêk werin ku peyveke îşaret bi navê kurd bike di sererastkirinan de nebe, reform nekin ku kurd bibin komeke di warê çandî de xweser û di pratîkê de pêkanîna mafên ferdî gelekî zehmet bikin.

Dîsa jî berferehkirina mafên çandî yên ferdî bandora xwe li rewşa welatiyên kurd ên li Tirkiye'yê kir. Li navenda mafên çandî de beriya her tiştî bi awayekî azad bikaranîna ziman di qada perwerde û medyayê de heye. Reformên der barê vê yekê de êdî destûrê didin ku hem saziya dewletê ya radyo û televizyonê TRT û hem jî kanalên radyo û televizyonê yên taybet jî bi zimanên ji bilî tirkî bernameyan biweşînin. Tevî vê jî rêzgirtina ji xala destûra bingehîn a li ser yekîtiya parçenabe ya erdên dewletê û gelê dewletê, weke şûrê demokles li ser vê azadiya dayî li ba ye. Ev xala destûra bingehîn gelek caran ji bo betalkirina destûra weşanê tê bikaranîn.

Yek ji encamên girîng ên pêvajoya reforman li Başûrrojhilatê Tirkiye'yê rakirina rewşa awarte bû. Bi giştî ev gav divê weke gaveke erênî were nirxandin. Dîsa jî vê yekê rewşa mexdûrên koçberiya bi darê zorê yên li nava Tirkiye'yê ya weke berê nazik, baş nekir. Komîsyona YE'yê di raporên xwe yên pêşketinê yên li ser Tirkiye'yê de îşaret bi vê rewşê dike û dibêje pêdivî bi hewldanên jidil û cidî heye ji bo çareserkirina pirsgirêkên kesên bi darê zorê koçberkirî, bi awayeki berfereh pêkanîna pêşketina herêmê ya civakî û aborî û bi awayeki giştî destekkirina mafên çandî.

Reform destûrê didin ku êdî dêwbav navên dixwazin li zarokên xwe bikin. Kurd jî dikarin vê azadiyê bi kar bînin. Bêguman di navlêkirina bi kurdî de hê jî pirsgirêk hene. Her tim li ser navlêkirinan doz diçin ber dadgehan, lewma bikaranîna navên kurdî yên di wan de tîpên alfabeya kurdî ''q,w û x'' hene, qedexe ye.

Guhertinên di qanûna partiyan de ku bi wan girtina partiyekê tê zehmetkirin, ji bo partiyên kurd heta niha başbûneke giring çênekiriye. Ev yek jixwe di Kanûna 2009'an de bi qedexekirina DTP – weke yên beriya xwe – û qedexekirina siyasetkirinê li gelek siyasetvanan, bi awayekî zelal derkete holê.

Parlemana Tirkiye'yê peymana navneteweyî ya li ser mafên medenî û siyasî û peymana navneteweyî ya li ser mafên aborî, civakî û çandî yên Neteweyên Yekbûyî erê kir. Lê belê Enqerê mafê xwe yê şert û qeydê der barê mafê perwerde û mafên hindikahiyan de da qebûlkirin. Li gorî vê, mafê hindikahiyên etnîk, dînî û ziman a bikaranîna çand û baweriya xwe, di pratîke de bicihanîna ferzên dînê xwe û bikaranîna zimanê xwe, li gorî xalên pêwendîdar ên destûra bingehîn a tirk û Peymana Lozanê ya sala 1923'an pêk tê. Ji ber ku li gorî Peymana Lozanê kurd weke hindikahî nehatine qebûlkirin (bi tenê Ermenî, Yûnan û Cihû hindikahî ne) destûrê nadin kurdan ku ji mafên siyasî û çandî yên di Peymanên Navneteweyî de sûdê werbigirin.

"Siyaseta Pêşîvekirina Demokratîk" ya hukûmeta AKP'ê ya ji havîna 2009'an ve destpêkirî û motîvasyona wê têra xwe siyaseta derve ye, bi xetên xwe yên sereke di çarçoveya destpêkê behskirî de hatiye bicihkirin. Ev çarçove jî ji aliyê pêvajoya endametiya YE'yê de destnîşankirî ye. Naveroka vê siyasetê nû nîne, ya rastî xwe bi meyilên lîberalbûnê yên Serokkomarê Tirkiye'yê yê rehmetî Turgut Özal ve girêdide ku Özal di dema Şerê Kendavê yê sala 1991'an de dabû destpêkirin. Li navenda vê "siyaseta pêşîvekirinê" ferehkirina qada azadiya zimanê kurdî heye û di heman demê de divê xala destûra bingehîn a 'yekparetiya nayê parçekirin a erd û gelê dewletê'jî were parastin. Belê, ji bo cara pêşî piştî pêvajoyeke dirêj a şêwrê bi partiyên siyasî, rexistinên civaka sivîl, hêzên aborî, rewşenbîr, rojnamevan û hwd. re ji AKP'ê hat li dijî bereyeke fereh a dijberan li ser mijarê li Parlemana Tirkiye'yê di Mijdara 2009'an de rûniştinekê pêk bîne. Dîsa jî "siyaseta pêşîvekirina demokratîk" di cewherê xwe de li xalên destûra bingehîn ên neteweyî û dogmatîk dialiqe.

Pêdiviya bi "diyalogeke ewrûpî-tirk-kurd"

Der barê bandora reforman li ser rewşa welatiyên kurd de mirov dikare bigihêje van encamên li jêr:

Ya pêşî: Bi giştî reform azadiyên qada ferdî yên çandî fereh dikin û kurd jî weke ferd dikarin sûde ji vê yekê bigirin. Beriya her tiştî ji ber pirsgirêka bingehîn a pêkanîna reforman a dewam dike hê zû ye mirov reforman di çarçoveya siyaseta kurd de weke dîrokî bi nav bike. Tevî reforman û "siyaseta pêşîvekirina demokratîk" a hukûmeta AKP'ê jî siyaseta kurd a dewleta tirk hê jî tijî nakokî ye. Helwesta li dijî zimanê kurdî hewldanên Enqerê yên ji bo astengkirina naskirina fermî ya zimanê kurdî û mafên siyasî û çandî yên kurdan eşkere radixe ber çavan. Wekî din darî çav e ku Enqere hewl dide bi qaîdeyên tevlîhev ên di xalên qanûnan û rêziknameyan de her pêşketina di reformên hatî kirin de zehmet bike. Nakokî nîşan didin ku siyaseta kurd a dewleta tirk hê jî di navbera naverokên kevneşop ên dogmatîk û meyilên lîberalbûnê de diçe û tê. Ev yek di heman demê de nîşan dide ku li ser guhertineke mezin a siyaseta kurd a kevneşop a ku xwe disipêre qebûlnekirin û tepisandinê, di nava hêzên dewletê hildigirin de lihevkirinek peyde nebûye.

Ya diduyan: Eger reformên bi taybetî ji bo rewşa kurdan kêrhatî ne, serketî pêk werin jî pirsa, gelo reformên heta niha – bi tenê mafên ferdî ne û ne yên komî – bi rastî bi kêr bên bersiva pêdiviyên welatiyên kurd bidin û hemin gelo daxwazên kurdan yên xweseriyê û aliyên kurahiya dîrokî û derûnî ya pirsgirêkê li ber çavan digirin. Hewldana çareserkirina pirsgirêkê ya daxistî qada ferdî, nikare van aliyên gelekî girîng ên pirsgirêkê bibîne. Di warê xweseriyeke çandî û siyasî ya têra xwe berfereh ya ji bo kurdan – weke kom – de ku xwe disipêre hîmê bi destûra bingehîn misogerkirina nasnameya kurd û nûnerî û întegrasyona siyasî, mirov dikare van reforman bi giştî weke kêm û netêrker bi nav bike.

Ya sisiyan: Ji bo YE'yê bi giştî ev pirs xwe dide der; gelo ew ê bi reformên heta niha hatî kirin pirsgirêka li dora mafên kurdan ên siyasî û çandî, weke êdî hatî çareserkirin bibîne, bi vê razî bibe, yan jî ew e bêhtir hewl bide û bi konkretkirinê bike ku pîvana endametiyê ya bi giştî weke "rêzgirtin û parastina hindikahiyan" hatiye binavkirin çêtir pêk were. Lewra beriya her tiştî ji ber nediyarbûna pîvanên Kopenhagenê û ji ber ku di nava YE'yê de li ser mijara parastina hindikahiyan pratîkên hevnagirin ên neteweyî hene, ti pîvana objektîf nîne ku mirov pê tê derxe kengî ev pîvana endametiyê pêk hatiye. Ji bo hukimkirinê qadeke din a şîroveyê dimîne. Destnîşankirina standartên herî kêm û birayara gelo ev standart pêk hatine, ji ber vê yekê di serê pêşî de girêdayî hukmên siyasî ye. Der barê bicihanîna vê pîvana endametiyê de, hukimkirineke objektîf ne ji aliyê YE'yê ve, ne jî ji aliyê dewleta tirk ve mumkin e.

Di mijara destnîşankirina ka ev pîvan divê çawa were şîrovekirin û pêkanîn de, ev rewş ji bo rayedarên dewleta tirk bi xwe serbestiyeke mezin e. Xetera di vir de ew e ku heta mumkin e sînordarkirî û di çarçoveya doktrîna Kemalîst a têgihiştina dewleta homojen û neteweyî de ev pîvan were fêmkirin û pêkanîn. Lewra bi giştî ji bo YE'yê pêdiviya bi ketina nava tevgerê heye da ku vê valahiyê dagire û ji bo pêkanîneke çêtir a vê pîvana endametiyê bibe xwedî bandor. Yek rêbaza muhtemel ew e ku ji namzetê endametiyê re bi awayekî zelal û eşkere were gotin û bi awayekî berçav li ber were danîn, ka divê xal bi xal çi ji vê pîvanê fêm bike û çawa wê pêk bîne. Ev rewş ji bo hevpariya endametiyê ya bi Tirkiye'yê re jî wisa ye. Ji bilî çend xalên bi awayekî zelal destnîşankirî yên mîna rakirina cezayê darvekirinê, erêkirina herdu peymanên NY'yê yan jî rakirina rewşa awarte, bi giştî nezelal û nediyar e ka bi rastî kengî rewşek çêdibe ku piştrast bike pîvana "rêzgirtin û parastina hindikahiyan" pêkhatiye.

Rayedarên tirk wekî din wekî din bi vê pirsgirêkê re rûbirû ne; divê êdî îradeya siyasî nîşan bidin da ku ji bo demokratîzekirin û lîberalkirineke girîng û dewamî ya welêt bidin destpêkirin, xwe ji têgihiştina dewlet û neteweya homojen qut bikin. Ev yek ji bo çareserkirina pirsgirêka dîrokî ya li dora mafên siyasî û çandî yên gelê kurd jî pêwîst e.

Gelekî girîng e ku hem YE û hem jî rayedarên tirk riyekê bibînin, da ku mexdûran ango kurdan jî tevî berjewendî û daxwazên wan bi awayekî hevgirtî tevlî pêvajoya reforman bikin. Ev yek ji bo destpêkirina diyalogeke hevpar a "ewrûpî, tirk û kurd" û her weha dîtina rê û rêbazeke siyasî a çareserkirina vê pirsgirêka hê jî weke berê heyî, pêwîst e. Lê belê heta îro hewldaneke jidil û cidî ya ji bo vê yekê nîne.

Ev nîvîs ji bo Le Monde diplomatiquê kurdî hatiye nivîsandin.

Werger ji almanî
Lokman Turgut

ANARŞIYA ESTETÎKÊ

Hetîketiyên civakî yên Pissaro

EVELYNE PIEILLER

Hîseke xweş e mirov berhemekî bibîne ku ji hestên bi mirov re çêdike û wir de, bi awayekî cihê zêdebûna tiştên dikarin werin bidestxistin û ji dest dan, nakokî û şerên serdemekê radixe ber çavan. Ev berhem di heman demê de ferz dike ku mirov xeyala têkiliyên kêm dualî yên ku di navbera modernîteya hunerê û hesasiyeta siyasî de pêk tên, bike. Bi awayekî mirov ne li bendê, bi Pissaro hejiyaneke rohnîker peyde dibe.

Dîsa jî weha xuya dike ku ev resamê ku sala 1874'an beşdarî yekemîn pêşengeha wan kesên ji wan re împresyonîst tê gotin bûyî û girêdayî wan mayî, zêde sirr û razên wî nebûn. Elie Fause ji bo wî got "halbestvanê herî nedarîçav ê taybetiya tiştan." Ev resam mutewazî dijiya, pirr kar dikir, kêmnasî ma û hevalên wî yên nêz hebûn ku tevlî têkoşîna mezin a ji bo estetîkeke nû dibûn, berovajî şagirtên wî Gauguin yan jî Cézanne... Bi kurtebirî, ew bi awayekî tekûz li cihên hevpar ên ku girêdayî vê ekolê ne, tê û ew bi awayekî mayînde stereotîpekî hunermendan û fikrekî diyar ê xweşikayiyê pêşniyar dike. Lewma îro her kes dizane ku împresyonîzmê hem raya giştî û hem jî kesên girîng ên ku diviyabû "hunera mezin" rave û terîf bikin, matmayî hişt. Û paşê bû nirxekî misoger û dereng jî be bi awayekî zexm, kir ku hin nûnerên wê gelekî dewlemend bibin. Ji vê wêdetir, vê resma ronak aqlê mirovan ji serê wan dibir, xuya ye dîmenên ku dikin grîzok bi bedena mirov bigirin, didan nihurandin.

Ev resm gelekî populer bû û heta gihişt wê nuqteyê ku kir nostaljiya "dawiya vê sedsalê" xwe bide der. Dema vê dike jî bi dor Serdema Xweşik dikeve û weke ku di nava tevahiya nermî û nazikiya jiyanê de be, xuya dike...

Redkirina tevlîhev a vê "avant-garde"ê (pêşengiyê) nîşana tênegihiştina mirov nikare xwe jê vede ye ku "burjûwa" û hunermendên hilberîner ji hev dike: serhatiya xweşik a împresyonîstan mînakek e ku muhafezekariyê li hemberî pêşveçûnê, piraniya ehmeq li hemberî elîta rohnîbûyî, xeddariya rantxwiran li hemberî biratiya hunermendan, neheqiya girseyan a demên berê li hemberî huqûqa dema nû datîne. Li wir romatîzmeke xurt a dilxweşker heye: Bêyî ku mirov bitirse xwe şaş bike, silavan li leheng û qehremanên îdeal û qasidên mîranî yên xweşikahiyê dikin. Bi ser de jî karîbûn paşê henekê xwe bi miyopên ew şermezarkirî, bikin. Girse kêmaqil e, hunermend jî şoreşgerên nehatî fêmkirin. Ev rast e, lê vê yekê serketina wî û rewabûna wî pêk anî... û jixwe eger dawî baş be her tişt baş e. Zehmet e mirov bi klîşeyan re li hev neke, ji ber ku weha xuya dike ku bûyer rastiya wan klîşeyan misoger dikin. Dîsa jî, di çêkirina hîskirineke têra xwe şaş a dema xwe, têkoşînên xwe û rola hunermendên wan pê rabûyî de, cih digirin.

Sala 1889'an, Birca Eyfel'ê li Parîs'ê serwer e, modernîte li ser riya serketinê ye û Pissaro hindik maye bibe 60 salî. Dîwaneke têde sîh resman vedibêje, dinivîse û ji vê pêve jî nenivîsîn. Ew resman li gorî rêzeke baş destnîşankirî tesnîf dike, navekî li her yekî ji wan dike yan jî nîşaneke wan vedibêje li wan dike, ew her resmî bi rûpelekî ve dike, weke bergekî albûmê bi kurê xwe Lucien (bi xwe jî resam e) dide girêdan û ji biraziyên xwe yên li Londonê re dişîne. Pissaro nameyeke şîroveyan jî bi vê albûmê re dişîne. Ev berhemek e ku bi taybetî bi tenê ji bo malbatê hatiye çêkirin: Pissaro tercîh kir vî berhemî li derveyî bazara hunerê bihêle ya ku wê demê pêk tê. Ev Hetîketiyên Civakî ku di bin tava serhişk a anarşiyê de dipişkivin û ku bi "serhildaneke" bi îhtîmaleke mezin di demeke kin de wê were têkbirin, bi dawî dibin. Van Hetîketiyên Civakî wê bêguman bazara me behsa wê kir matmayî bihişta. Lewra weke ku xuya dike em li vir gelekî ji dil ketina ronak a pêwendî resmên wî, dûr in. Bi derbên pence û lepan, xîşkan, reşkirin û xetên hûrhûr ew "sefîliyên" xwe, şêwazê xwe yê şerê di navbera zirav û qelewan de û di navbera jiyan û mirinê de pêşniyar dike û vê yekê bi tinebûneke harîqulade ya hestiyariyê dike.

Rihekî Pissaro yê ji bo xizanan hestyar hîç nebû. Fikra mode ya ku jinên dewlemend xwedî li hunermendan derdiketin, wî qet pûte bi vê yekê nedida. Ev ne zêdebûna sedeqeyan e ku ew ji bo "struggleforlifekarên (yên ku ji bo jiyanê li ber xwe didin)" xwe hêvî dike, berovajî ew divê weke Baudelaire jî dixwest ku "struggleforlifekar" fêm bikin ku bi tenê "yê/ya dikare bi dest bixe hêjayî azadiyê ye." Xewnereşkeke sar nîşan dide ku têde Kapîtalîst û Proleter di alegoriyeke (rewşeke mecazî ya) şîdetê de dijberê hev in. Pissaro ev alegorî weke "hewldana di qada trajîkomîk de" bi nav kir. Em dikarin li hêviyê bin ku ya herî xirab biqewime. Mirov berê xwe bide "perestgeha golika zêrî" û "sefîliya bi kumê reş", "xwekuştina yê terikandî" û "karwanê yê xizan", mirov ditirse ku bikeve nava populîzmeke karîkatural, berhema peyamhilgir û ji bo yên razîbûyî îqnaker...

Lê li aliyekî hunerê Pissaro xwediyê tevlîheviyekê ye ku mirov matmayî dihêle û ji tevahiya "realîzmê" dibuhure. Vê jî bi karekî bêqisûr yê li ser kontrast, derbasbûna rengan, çarçoveyê dike ku têde hostetiya xetkêşiya împresyonîst û derfetên nû yên wênegiriyê, dibin yek. Li aliyê din, sernav û nîşane para bêhtir ji rojnameya La Revolte hatine girtin û ev yek tevahiya hunera wî dixe nava angajmaneke siyasî ku têde radîkalbûn û carinan mîzaha reş hem hestiyarkirinê (pathos) û hem jî meyila waezkirinê li derve dihêle.

Ev hêza derbirîner e ku çavkaniya wê jiyana rojane ye. Di nava tansiyonekê de ku carinan dike mirov li hin tabloyên Goya û expresyonîzmê bifikire, ev hêz jiyana rojane tîne ber çavan. Expresyonîzm weke huner azadiyeke mirov ne li bendê bi kar tîne û di heman demê de ji ser riya projeyeke anarşîst a daxwazkirî venaqete. Ev huner heta mirov bêje bes şîloker e.

Serê pêşî, hêja ye ku em rasta hunermendekî tên ku di dîtina pêşî de mirov weke hunermendekî "duzimanî" dikare bi nav bike. Lewra ev hunermend jê tê di heman demê de bi du nêrînên li dinyayê, hunera xwe pêk bîne. Nêrîna pêşî ya resmê ya dilşa, ahengdar e ku armanca wê ew e ebediyeta tiştên fanî zeft bike û ya din jî ya weneyên xêzkirî ye ku noqî nav siyasetê bûye, hişk, nepixandî ye û armanca wê ew e ku xedariya nîzameke civakî zeft bike. Hemin, Pissaro ne bi tenê bû (Daumier weke mînak hem karîkaturîst bû û hem jî resam), lê belê kontrasta her du pêkanînên Pissaro gelekî bi bandor û darîçav bû. Lewra împresyonîzm weke şoreşeke resmê dihat dîtin, berovajî vê yekê xetên Pissaro hewl nedidan ji qaîdeyên serwer qut bibin, wan dixwest van qaîdeyan têk bibin, di heman demê de jî sempatiya xwe ya jibo fikrên şoreşger dianî ziman.

Beriya her tiştî der barê jiberêvebûna sosret a li dora hetîkatiyên civakî de em bi tenê dikarin bi xwe bi xwe bişêwirin û ji xwe bipirsin. Diviyabû em bisekinin heta ku sala 1972'an edîtorê mezin ê huner Albert Skîra li Swîsre'yê faksîmîlekê biweşîne, weşaneke sînorkirî, 999 nusxe û dengvedana wê jî zêde nebû. Referansên behsa vî berhemî dikin hê jî gelekî kêm in û piraniya malperên înternetê yên li ser Pissaro jî vê yekê piştrast dikin. Ev malper hez dikin bi dildariyeke mezin "fikra wî ya zindî" û jêhatîbûna wî ya paysajîst, derxin pêş. Dibe ku li vir ya diqewime xemsariyeke besît û bi serê xwe nebe.

Dema ku Pissaro hetîketiyên xwe yên civakî xêz kirin, hê zexta Komun'ê ji bîra mirovan neçûbû. Ji salên 1880'î ve ji bajarê Anzin ku wê qismî bandor li Germinal'ê bikira, heta bi Decazevill'ê, ku artêşê piştî ku karkeran midûrê kanê kuşt, dagir kirî, tevî ku xwepêşandanên destekê didin karkerên kanan li dora Jules Guesde û Luis Michel... li pey hev pêk tên, grevan raya giştî gêj dikir.

Ya li ser nîqaş tê kirin, Proudhon, Marx, Bakûnîn in. Fikra komara civakî gelekî di seriyê mirovan de diçe û tê, tevî ku di komara sêyemîn de skandal qewimîn, bi krîz û qeyrana boulangîst (1) re rûbirû bû, ev krîz ji rûbirûbûneke nediyar û soza paşerojeke ewle ya neteweperestiyê û sosyalîzmeke weke Jean Jaurès gotî ji rê derketî, peyde bû... Pirsgirêka civakî û fikra siyasî sala 1889'an her welat ditirsand û bi xwe mijûl dikir, bi taybetî jî li ser maqûliya çalakiya yekser û sosyalîzma parlemanter. Tevgerên anarşîst ên hejmara wan gelek, gelekî deng vedidan û parçebûyî hem pirsgirêka civakî û hem jî fikra siyasî derxistin pêş.

Em behsa Pîssaro bikin, wî ti carî xwe venekişand bêhnvedanê, ji civakê dûrneket û xwe ji têkoşînê neda paş. Wî benda xwe bijart: Wî hevkariya rojnameyên anarşîst kir, di demeke kin de ji la Révolte ya ku Jean Grave ew birêve dibir, heta bi L'En Dehors a Zo D'Axa. Li van deran derfeta wî çêbû ku Octave Mirbeau, Emile Verhaeren, nivîskarê diz (voleeur) Georges Darien û Félix Fénéon ê cihê wî

nayê dagirtin, nas kirin… Zêdeyî hedê xwe aqildariyek heye. Lê di demeke kurt de çalakiya terorîst da pêşiya wê: Kuştina Serokkomar Sadi Carnot ji aliyê Santo Caserio, di sala 1894'an de bi tenê mînakek e.

Belê, di dawiya vê sedsala mirovan matmayî dihêle de, bi qedrê vê zindîbûna aqil ya weha xuya ye hinekî kêmtir bû, nehat zanîn. Girîngiya wî çi dibe bila bibe, Zola bi tena serê xwe têrê nedikir ku têkoşîn û daxwazên wê demê bîne ziman û vebêje. Di vê çarçoveya fikrî û berçav de pirsên li ser pêşengiya, weke Pîssarro bi nav dike "lêgerîna xweşikahiya heyî" û rola civakî ya hunermend, derdikevin holê. Bê terbiyetiya pê hetîketî bi hêsanî hatin marjînalkirin gelekî sembolîk e: ew ê bi tenê împresyonîzmê ji ber statuya wê nayê fêm kirin, weke tevgereke apolîtîk erê bike û hunermed jî di bihuşteke li derveyî bûyerên civakî de asê û mehkûm bike. Em hêvî dikin çapeke nû ya hetîketiyan tevî pêşgotineke gelekî dewlemend a Henri Mitterand karibe tesîra marjînalkirinê tine bike (2).

Bi awayekî berferehtir, ev difre bi awayekî nediyar îdîa dike ku hunermend divê şoreşê li ser erda xwe û li dinyaya xwe bikin, di nava xwerûtiya yekane rêveçûna estetîkê de ji bo xweşikahiya bêdawî. Lê ev cehalet û nezanîn bi israr ferz dikin ku mirov demên zehmet bi tenê bi awayekî zelal fêm bike. Ev cehalet û nezanîn, Octave Mirbeau yê ku realîzma wî ji anarşîzma wî navdartir bû jî di navê de, her weha li cem gelekan heye. Di demên zehmet ên behskirî de ya ku dixwazin, kêmkirina girîngiya çalak a têkoşîna şoreşger û dizikhevdebûna pêşengiya siyasî û pêşengiya wêjeyî û hunerî ye. Ev awayekî heyf e ku pê dixwazin ji neo-akademîzma tahm, fikr û heta hêviyê re cih çêkin.

Werger ji fransî
Lokman Turgut

(1) Boulangîzm tevgereke siyasî ya fransewî ya dawiya sedsala 19. e (1889-1891). Ev tevger ji bo komara sêyemîn xeterek bû. Navê wê jî ji Wezîrê Şer General Georges Boulanger tê.

(2) Camille Pissaro, Turpitudes sociales (Hetîketiyên Civakî), tevî pêşgotina Henri Mitterand, PUF-Fondation Martin Bodmer, Parîs, 128 rûpel, 26 euro.

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

Opozisyon di navbera statuya desthilatê û hêviyên xelkê de

1 ◀

yeke tendirust derbarê xwezaya xebat û hevrikiyan çi liser astê navxweyî yê hizbê û di nav baskên bizava me be û çi liser astê derveyî. Berevajî vê çendê, PDK û YNK'ê nikarîbûn wek ku tê xwestin van derfetan bikarbînin û pirsgirêkên navxwe û pirsa desthilat û lêvegerê li Herêma Kurdistan'ê bi awayekî hevdem çareser bikin: Ne bi rêya aştiyê û ne bi rêya şer. Ji dêlva vê yekê, herdû hizb pêdagir bûn liser heman sîstema kevin a hizbayetî û kûrkirina aliyên wê yên negatîf, û bûn afirînerên prensîbê fifty-fifty û xwediyên tecrubeyeke ne aram, ecêb û nakokîbar a desthilatdariyê. Rûpelên hevrikiya wan û encamên vê tecrubeyê ewqasî ne erênî bûn, lê vekirina van rûpelan karê dîrokzanan e.

Hilbijartinên 25.07.2009'an bi giştî rewş hejandin. Aliyekî girîng ê van hilbijartinan, peydebûna derfeta jidayikbûna opozisyoneke navxwe ya bizava rizgarîxwaza gelê kurd li Başûrê Kurdistan'ê bû, çi derbarê awayê rewatî, berfirehî û piştîvaniya cemaweran û çi derbarê reng û dengê wê liser astê herêmê, Îraq, Kurdistan û navçeyê bi giştî. Ev mîratgiriyeke dîrokî ye.

Hemû kes dizane ku hilbijartin û hebûna opozisyon û lîsteyan bi tenê şahidiya hebûna sîstemeke demokratîk nadin, nemaze bê misogerkirina bingehên din wek: Hebûna destûreke modern, dabînkirina bingehên serekî yên azadiyên giştî, cudakirin û dezgehkirina desthilatiyan, hebûna sazî û dezgehên sivîl, vegera li xelkê di pirsên çarenûsî de û pratîzekirina wan di rastiyê de. Lê belê, li gel kêmasiyên di van waran de, jidayikbûna opozisyona navxweyî li Başûrê Kurdistan'ê destpêka fetlînokeke corî ye û wek destpêka demokrasî, guherîn, veguherîn û reforman tê jimartin bi taybetî di tecrubeya 18 salên desthilatiya navxweyî ya herêmê ku sîstemê hizbayetî û rêvebirinê zêde lawaz, qels, ne aram û kevinare ye, gendeliyê geş û gur bûye, pirsgirêkên me yên niştîmanî û neteweyî daleqandî mane…

Rast e serkeftina opozisyonê di 25.07.2009'an de giranî û pîvana desthilata rêjîma Herêma Kurdistan'ê ne guherand jî, lê belê kolana kurdistanî hejand, herdû hizbên fermanrewa rastî şokê kir û terazûya hêza wan xwar kir û desthilat neçar kir li niha û pêşeroja xwe bifikre û hewl bidin reforman bikin.

Bi kurtî di 25.07.2009, wek diyardeyekê, di warê kûrkirina astê hişyarî û rewşenbîriya kurdistaniyan û berfirehbûna azadiyan û çespandina girîngiya dengerdan, hilbijartin û hebûna opozisyonê de pêngaveke bi hêz bû. Girîngiya hilbijartinan û hebûna opozisyonê, di rewşa îro ya Herêma Kurdistan'ê de, di van xalan de tê xwiyakirin:

1- Desthilat gel e. Ra û helwêstên gel jî dikarin bên guherandin û veguherandin. Xala girîng girêdana bi maf û xwestekên xelkê ye û biryara dawî jî ne pere, hêzên çekdar, lîstên hizbîkirina xelkê û dîrok e lê kirdar, bawerî û sandoqên dengdanê ye.

2- Bilindkirina ruhê berpirsiyaretî û çandina tovên baweriyê û vegera baweriyê li grub û takekesan.

3- Bihêzkirin û pêşxistina vê pêkhateyê çi di hundirê takekesan û çi di nava grubê de, nemaze li nav çîn û texên hejar, zehmetkêş, jin û gencan ku piraniya cemaweran pêk tînin. Gel bingehê guherînê ye û biryara destnîşankirina çarenûsa xwe dide.

4- Hişyariyeke niştîmanî, neteweyî û navdewletî ye derbarê rewşa îro ya herêmê; şêwe, awa, encamê desthilata dû cemeser û prensîbê fifty-fifty yê PDK û YNK'ê û têkçûna wê di piraniya waran de.

Qonaxa berî hilbijartinên 25.07.2009'an, destpêka jan û êşkişandina jidayikbûna opozisyona navxwe bû, lê derbarê lîsteya desthilatê re, paşveçûn û dakişandin bû. Piştî hilbijartinên Tîrmehê, destpêka guherîn, veguherîn û rêforman bû. PDK û YNK'ê di rewşa ezmûn û rûbirûbûnê de ne nemaze ku dû hilbijartinên çarenûsî li pêşiya wan in: Hilbijartinên parlamenê Îraq'ê di 07.03.2010'an de, û hilbijartinê parêzgehan (Cotmeha 2010). Tê pêşbînîkirin ku hevrikî kûr û berfirehtir bibe û lîsteya desthilatê, piştî tecrubeya tehl a hilbijartina Tîrmehê, hawara xwe bibe ber hemû awa û alavan bo çareserkirina qirîzên xwe; çi bi rêya hembêzkirin û ragirtina şepolên ne razî û bêzar ên di hundirê hizban de û şepola opozisyonê bi rêya veguherandina rûmetê liser astê hizb û îdareyê de, û çi jî bi rêya sûdwergirtina ji yasayan û bikaranîna desthilat û derfetên cuda cuda.

Lîsteya desthilatê, PDK û YNK'ê, wek dû hizbên desthilatdar, xwedî tecrube û şiyan in; heta ji wan bê û derfeta wan hebe û di berjewendiya wan de be, wê liser rêbaz û siyaseta dû cemseriyê, bikaranîna desthilata fermî û samanên millet bo armancên hizbî û taybetî, pêdagir bin. Peymana "stratejîk" nîşana vê rêbazê ye, mînakên nû jî ev in: Binpêkirinên hilbijartinên 25.07.2009'an, rûniştina yekem a gera sêyem a parlamenê û awayê hilbijartina desteya serokayetiyê, awayê teklîfkirina serokwezîr û cîgirê wî û pêkhatin û rê û resmên proseya bawerîdanê bi kabîneya şeşem, derengketina sererastkirina yasa ya –hilbijartinên Îraq'ê- Jimare 16 ya sala 2005'an a nûjenkirî- di 06.12.2009'an, sergêjkirin û birîna nanê alîgirên opozisyonê nemaze alîgirên Tevgera Goran… htd. Lewma jimareke zêde ya çavdêran texmîn dikin ku arîşe û girjiyên siyasî beloqtir bibin, sozên pêkanîna reforman û aktîfkirina rewşê liser astê hizbî û îdarî bi tenê bona derbaskirina dem û rûxweşikkirinê bin, koka prensîbê dû cemserî, dû hêz, dû gencîne û dû navendiya biryarê wek xwe bimîne.

Lê nabe ku em li jimara niha ya kursiyan û rêzbendiya pêkhateyên nav parlamenê Kurdistan'ê liberçav negirin ku: PDK'ê 30 kursî ji sedî 27, YNK'ê 29 kursî û ji sedî 26, Goran 25 kursî û ji sedî 23..htd. Herwiha sîstemê nîvcî ya hilbijartinên parlamenê Îraq'ê 07.03.2010 liberçav negirin ku egera guherîna rêzbendiya aliyên kurdistanî nemaze di navbera kandîdên PDK û YNK'ê de, di warê veguherîna berendaman û jimara kursiyan li holê ye. Lewma çiqas, çawa û çi bin ho, sedem û mebestên wan, herdû diyardeyên piştî 25.07.2009'an, rengekî guherînê û guherandina prensîbê fifty-fifty bûn û li gor şert û mercên herêmê û xwezaya hevrikiyan, balkêş bûn.

Opozisyona navxwe qonaxa dûdilî, bêdengî, gengeşeya navxweyî ya hizbayetî derbas kir û niha pêkhateyeke yasayî, naskirî, germ, bernamedar e û pişta wê bi kolana Kurdistan'ê û alîgirên xwe piştrast e. Opozisyon ji derveyî desthilatê ye û hevrikê wê ye, beşekî berfireh ê çîn û texên kolana kurdistanî li benda rol û peymana wê ne. Berevajî lîsteya desthilatê, aktîfkirina rol û daneserheva rêzên opozisyonê pêwîst e, meydana insyatîfa wê berfirehtir e, tevgerên wê lezgîntir in, guşarên wê liser desthilatê bibandortir e û kişandina wê ji têbînî û hestên xelkê re sanahîtir e.

Desthilatdarên Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê jiber ku liser desthilata reha, rêveberiya sade û bê opozisyon hatine perwerdekirin, liser astê navxwe, bi heman nerînê berê xwe didin hizb û hikûmetê, bi gotineke din hizb û hikûmet li gor vê nerînê yek in. Ev nerîn bûye beşek ji sazûmana desthilatdarên herêmê ya hizrî û reftara wan, li ba hinek ji wan alaveke, serwet û desthilata millet wek mafên xwe yên xwezayî dibînin, xwe wek serwer, dahêner û xwedî milk û xelkê jî wek kerî, xizmetkar û berdestik didin naskirin. Erk û mafan tevlîhev dikin, tiştên taybet û giştî ji hev cuda nakin, sînorên di navbera rewa û ne rewatiyê de hatine windakirin û bi hişyarî û nezanî jî bi gendelî û gendelkirina hêz û îmkanên zindî yên civaka me ya kurdewarî ve, mijul in.

Yekem liser astê hizbê: Bi rêya paşguhxistina peyrew û bernameyê hundirîn û herifandina sîstemê wergirtina endam û qadroyan di hundirê hizbê de. Tê zanîn ku pîvan, bingeh û destûrê hizbê hatiye avêtin, wergirtin û endamtî bûne keyfî û berendamtî bo posta hizbî bûye damezrandin û damezrandin jî liser bingeha peywendiyên takekesî ye, herwiha peywendiyên takekesî jî liser bingeha alîgiriyê tên kirin, alîgirî jî liser bingehê nasîtî, binemal û dûbendiyê ye, dûbendî jî liser bingehê berjewendiyên taybetî ye û berjewendiyên taybetî jî liser bingehê karkirina taybet û baziraganiyê ye.. htd. Bi kurt û Kurmancî: Dema hizb û endamên hizb ji nirx û buhayên mirovî, neteweyî û niştîmanî tên vala û rûtkirin, êdî zehmet e prensîb û xêzên sor bên liberçavgirtin.

Dûyem, liser astê hikûmetê: Veguhastin hikûmetê bo çeperekê bo bidestxistina berjewendiyên taybetî û reftarkirina li gel wê wek fermangeheke taybetî li got sîstema rojhilatî ya kevin û wek deriyekî bo xwarin û pûçkirina samana gel. Ji taybetmendiyên serekî yên vê diyardeyê:

1- Tevlîhevî û desttêwerdana hizbî di karûbarên îdarî de, bi wateya ku hikûmet yanî hizb û hizb jî yanî zîrve.

2- Nebûna ewlekarî, program, bername, nexşe û plana dirust û diyarkirî ya fermî û stratejîk, bo warên siyasî, aborî, civakî, niştîmanî û neteweyî. Wek mînak, êdî şeş meh liser hilbijartinên parlamenê Kurdistan'ê re borîne û çar meh liser bawerîdana bi kabîneya şeşem de, hê ev kabîne bê berneme kar dike. Çawa parlamen baweriya xwe da kabîneya şeşem? Pirs û şopandinên parlamenê liser çi bingehekê ne? Di 19.01.2010'an de projeyê butçeya hikûmetê hat ragehandin û biryar e bo parlamenê bê şandin, ger hikûmetê bernameyê fermî yê pesendkirî yê parlamen nebe, liser kijan binemayan butçe hat texmînkirin? Li gor kijan pîvanê divê parlamenter reftarê li gel vê butçeyê de bikin? Butçe ne bi tenê çepera rêzkirina jimaran û lêgalkirina xerckirina pereyan e, lê dibe ku alaveke ku felsefeya desthilatê û rengvedana bernameyê wê pêşan dide.

3- Bazareke hema hema û bazirganiyeke monopolkirî ji aliyê çend kesan û tîmeke diyarkirî ya bazinê tengê desthilatê ye, dûr ji felsefe û rolê hikûmetê di rêvebirina sektorê aborî bi giştî.

4- Daketina astê zanîn û herifandina sîstema perwerde û xwendina bilind û aliyên rewşenbîrî û medya.

5- Dûrxistina texên cuda cuda yên gencan ji pirsgirêkên niha yên jiyana rojane ya civakê û pirsên me yên niştîmanî û neteweyî bi rêya gelek tor û navendên destçêkirî wek mînak di warê medya û saziyên sivîl, kişandina gencan bo çavlêkirina jiyana bi nav modern û dûxistina wan ji pirsgirêkên gelê me yên neteweyî.

Vê rewşa aloz ji dêlva ku herêma me bibe navendeke rakişandina genc û pisporên me ji welatên derve û vegera kurdistaniyan ji xerîbî û renckêşanê û jiyana dûrî welêt, Kurdistan bûye hokareke derkirina gencan û derçûyên zanîngehan û hêza me ya karker, ku ji welêt direvin û berê xwe didin pêşerojeke tarî li derve. Ev rastiya tehl, tevî ku mîrata siyaseta nijadperestî ya hikûmetên Îraq'ê bo jinavbirina bingehê civaka me ya kurdî ye jî, lê 18 salên desthilatdariya PDK û YNK'ê ne ku bi tenê ev diyardeya metirsîdar çareser nekirine lê belê di hinek waran de kûr û berfirehtir jî kirine, nemaze bi rêya pêdagiriya liser paşguhxistina jêrxaneya aborî, mabûna hêza kar û civaka me wek hêz û civakeke paşguhxistî ji dêlva guherandina wê bo civak û hêzeke berhemdar.

Di vî warî de, emê bala xwendevanên rêzdar bikişînin ser jimara zêde ya meaşxwerên hikûmetê û siyaseta seqet a aborî û bazirganî: Zêdeyî ji sedî 70'ê butçeya 2010'an bo xerciyên bikarbirinê hatine terxankirin. Bi sedan saziyên cemawerî yên taybet bi gencan û xwendekaran û jinan û zarokan û sendîqa û bingehên din bi navê civaka sivîl û bi serde jî medya ya zêde ya bê serobin û bê naverok. Ev mînakeke serdema jinavçûyî ya welatên bereya totalîter û cîhana sêyê sar û cîhana dû cemserî tînin bîra mirov. Beşekî zêde yê aliyên negatîf ên vê siyasetê di situyê Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê de ye, herwiha herdê hizbên fermandar PDK û YNK'ê jê berpirsiyar in û di 25.07.2009'an de baca beşekî ji vê siyasetê dan.

Ezmûna berî 25.07.2009'an û kêmanîna lîsteya desthilatdar di hilbijartinên parlamenê Kurdistan'ê de, pirsgirêkeke bi seranserê sîstema me ve girêdayî ye. Ev encam, ne şaşîtî û xemsarî û qeyrana berpirsên bingehên hizbî û îdarî, lê ya payebilindên wan bû. Ne jinişkave, lê belê çaverêkirî bû. Ne tesaduf, lê mecbûrî bû. Ne awarte, lê bûyereke dîrokî û tevahî bû. Înkarkirina vê qeyranê,

paşguhxis- tina opozisyonê û siyaseta tirs û pirsê, derdên desthilatê derman nake lê berevajî vê yekê rewşê aloztir dike û perdeyê ji ser dirûşm û peymanên wê hildide, qirîzên wê kûr û pehntir dike; opozisyonê tekez dike û cemaweran dicoşîne jiber hebûn a opozisyoneke rewa û yasayî û parlamenî û ziman hala cemaweran yek ji taybetmendiyên serekî yên demokrasiyê ye. Opozisyon wek hikûmeta sîberê di herêmê de rola serekî ya parastina xwestek û daxwazên xelkê dilîze û guşarê dixe ser hikûmetê bo cîbicîkirina van xwestekan, herwiha li parlamen berpirs û hikûmetê dixe ber pirs û lêpirsînan de liser bername û armanc û karkirina wê, nemaze di navgînên ragehandinê yên cuda û di semînerên taybetî û giştî de kêmasî û xemsariyên hikûmetê li pêş çavê xelkê radixîne. Lewma opozisyon bernameyê xwe di warên siyasî, aborî, civakî û kultûrî de pêşkêşî xelkê dike.

Divê desthilat bigihe vê baweriyê ku êdî li herêmê opozisyon heye û xelkê dengê xwe pê daye. Bername û sozên opozisyonê jî bi giştî ra û nerîn û daxwaziyên dengderan temsî dikin û organa wan e lewma girêdayî ye bi sozên xwe. Lê divê oposizyon jî vê yekê fam bike ku: Li gel lîsteya desthgilatê ya dûcemser hevrik in û ji nav cergê civaka me ya kurdî hatine û hevdu temam dikin, bi dengê dengderan ev herdû rol û erkên wan li wan hatine sipartin, divê bi rêya destûr û yasayê rastî û sînorî desthilata wan bê diyarkirin, herwiha divê heman bingeh çavkaniya reftara van herdû cemseran be. Her çiqasî opozisyon bihêz û ciddî be û hişyar be ji rol û rastiya xwe di hundirê civaka me ya kurdî de, ewqasî dikare bibe hêza guşar û rexnegirê posetîf û avaker û piraniya xelkê li dora xwe kom bike, heybet û rêza xwe liser desthilatê û di nav kolana kurdî de misoger bike, herwiha hevkar û piştgîr be ji aliyên baş û posetîf ên hikûmetê re di warê xizmetguzarî û pirsgirêk û prensîbên me yên niştîmanî û neteweyî wek ku çawa bi awayekî zîrek aliyên xirab û negatîf ên desthilatê li pêş çavan radixe, lewma herdû pêkhateyên hevkêşeyê dikarin bên guherandin û veguherandin.

Pişt girêdana desthilata her hizb û grubekê bi dîrok û kelepûrê rabirdû û dirûşmên çirûsandî û sozên bê bingeh û siyaseta razîkirinê, ne garantî ye ku paye û rêza wan li nav cemaweran her wek xwe bimîne.

Desthilata Lîsteya kurdistanî (PDK û YNK'ê) tekane û bi hev re, xwediya tecrubeyeke 18 salan a hukmraniya herêmî ye. Bêguman vê desthilatê di 18 salên hukmraniya xwe de, bi xweşî û nexweşî û bi awayekî rêjeyî, guherîn û destkeftên balkêş bidestve anî nemaze di warê ewlekarî û asayiş, aramiya giştî, hebûna kurdan li Bexda, misogerkirina atmosfêreke baş bo hinek warên xizmetguzarî û geşkirina jiyana xelkê û azadiyan ku nabe mirov xwe ji wan kor bike û wan nebîne, lê belê bi heman awayî hinek warên girîng û bingehînî hene ku vê desthilatê xwe nêzîk wan nekiriye yan bi awayekî ciddî kar di wan de nekiriye nemaze warên bihêzkirina jêrxaneya aborî û danîna sînorekî ji diyardeya kirîna tiştan ji derve û pirsgirêkên bingehînî yên edaletiya civakî û rêvebirin û demokrasî û pirsên me yên niştîmanî û neteweyî. Kêmasiyên van waran yek ji sedemên serekî yên jidayikbûna opozisyonê bû.

Di navbera lîsteya desthilatê bi giştî û her sê lîstên opozisyonê bi taybetî de, hinek xalên hevbeş derbarê guherandin, veguherandin û reformê de tên dîtin. Lewma wek çawa ji desthilatê tê xwestin sozên xwe cîbicîh bike, erkê serekî div ê qonaxê de yê opozisyonê, piştî serhevde anîn û komkirina rêzên xwe, pêdagiriyê liser van xalan bike:

1- Çavdêrîkirin û şopandina soz û bername û reftarên desthilatê û karkirin bo bicîhanîna daxwaz û xwestekên xelkê û veger û girêdana bi îrade û berjewendiyên gel ên bilind ve, û berî hertiştî çarenûsa navçeyên me yên erebkirî û veqetandî bi taybetî jî Kurdistanbûna Kerkûk'ê û vegerandina van navçeyan bo hembêza Herêma Kurdistan'ê. Misawemekirin liser Kerkûk'ê û her navçeyeke din û sînorê Başûrê Kurdistan'ê bo mabûna di postê xwe de yan bo pileyeke yan dû pileyên serwerî yên bê desthilat û bo mîkdarek pere û hinek girêbestên gaz û petrolê û kişandina terefekî rêvebiriya Amerîka, şaşîtiyeke mezin e û bi ti awayan nabe bê qebûlkirin. Lîsteya desthilatê û opozisyonê herdû wek hev ji ber vê çendê berpirsiyar dibin.

2- Dezgehkirin û cudakirina desthilatiyan û pêdagirî liser serweriya yasayê û prensîbê hevwelatîbûnê û rizgarkirina wan ji monopolkirina hizbî û berjewendiyên taybet, û berî hertiştî bihêzkirina rola parlamen wek desthilata yasadanînê û çavdêrî û mînber û meydana hevrikiyên siyasî û vegera desthilatan bo hundirê hola parlamen û bi taybetî jî fraksyonên wê, lê ne polîtburoyên hizban. Girêdana serokatiya opozisyonê bi pêkhate û rola xwezayî û yasayî piştî qonaxa prensîbê fifty-fifty yanî qonaxa piştî 25.07. 2009: qonaxa firehî û hebûna opozisyonê û piranî û kêmaniyê. Peyrewê navxwe yê parlamen herwiha yê Civata Wezîran jî divê bên sererastkirin û li gel qonaxa nû de biguncin. Divê opozisyon bi awayekî serbixwe û babetane kar bo serxwebûn û aktîfkirina parlamen û hikûmetê û dezgeha dadwerî bike.

3- Yasayîkirina butçe û dahat û şêwe û awayê peywendiyên hizbên di nav proseya siyasî ya Kurdistan'ê de û rizgarkirina wan ji desttêwerdan û guman û siyaseta tirs û pirs û dabeş bike, tuyî serdest bibî û hembêzkirin û bo vê armancê dehifdana parlamen bo pesendkirin û derxistina yasaya hevkariya hizban.

4- Vegerandina projeyê destûrê Herêma Kurdistan'ê bo parlamen bi mebesta çakkirin, dewlemendkirin û bihêzkirina wê, û vegerandina deqê madeya 2 ya vê destûrê liser rewşa xwe yanî vegerandina (Qezaya Bedre û Nehiya Cesan û Qezaya Tel Afer) bo ser navçeyên Başûrê Kurdistan'ê wek ku heta roja berî pesendkirina destrûrê li parlamen destkarî tê de nehatibû kirin li gor vê yekê ku ev navçe yek ji xalên madeya 140ê ne, û madeya 14'ê jî bendekî destûrê ye.

5- Pêdagirîkirin liser xalên posetîf ên destûrê Îraq'ê nemaze xalên bi pirsa kurd û mafên giştî ve girêdayî, û bihêzkirina wan û hewldan kirin bo sererastkirin yan avêtina bendên negatîf.

6- Kurd neteweyeke, beşek ji gel û welatê kurdan bi zoriya zordaran hatiye parçekirin û bi Îraq'ê ve hatiye leziqandin û kurd di vê qonaxê de hatine neçarkirin ku bi federalîzmê razî bin. Federalîzmê hê bi awayekî ron û eşkere di destûr û rastiyê de jî reng nedaye. Desthilat hê nikare vê pirsgirêkê yakalî bike û daleqandî maye û ti karê ciddî jê re nayê kirin. Ji opozisyonê tê xwestin çi li gel desthilatê û çi bi rêya parlamen û dezgehên fermî û çi di rêyên sivîl û cemaweran de vê pirsgirêkê geş bike ku kurd li Îraq'ê hevpişk in û federalism di navbera dû gelan-kurd û ereban- de, mafên gelê kurd ên siyasî û aborî û sînorê başûr wek Herêma Kurdistan'ê bê yekalîkirin û ji lîstika demokrasiyê û piranî û kêmaniyê bê dûrxistin. Ger serkirdeyên kurd xwe ji rastiyan kerr nekin, ji mêj ve naskirine ku liser astê xalên bingehînî pirsa kurd sînoran di navbera ereben Şîa û Sunnî de nahêle yan pir kêm dike. Paqijbûna nêtan û rûbirûbûna pirsgirêkên neteweyî liser bingeha dû netewe, dijayetiya biratiya gelan û jiyana hevbeş û herifandina yekîtiya xaka Îraq'ê tune, berevajiya vê yekê biratî û bihev re jiyan û yekîtiya me ya bi vîn bihêztir dike.

7- Rizgarkirina pirsa kurd ji lojîk û berjewendiya hizbî û takekesî û reftara keyfî û dilxweşkirin û bikaranîna wê wek kerteke guşarê bo ecendayên dijberên gelê kurd. Pirsa kurd, pirsa gel e û vegerandina wê li rewş û xwezaya xwe erkekî



Rustem Agh

Efekt LMD kurdî

pîroz e û divê bibe pîvan û bingeha lihevkirin û hevpeymantiyê li gel tevahiya aliyan û liser hemû astan ên navxwe û derve.

8- Çareserkirina pirsgirêka pêşmergeyan ji mabûna wan wek hêz û alaveke çekdarî ya hizbî bo artêşeke yekgirtî ya Herêma Kurdistan'ê, ku girêdana wan bi tenê bi gel û welat re bin. Nehiştina diyardeya mîlîtarîzekirina civakê û rizgarkirina bajar û bajarokan û civak û tax û dezgehan ji van hemû bingehên serbazî û kontrol û rêgirtinê ku ji xeynî dîmenê wan ê kirêt û ne şaristanî, nîşan didin ku aramî tune û rewş di xeterê de ye herwiha barekî giran e liser butçe û saman-serweta hevwelatiyan.

9- Şopandina diyardeya gendeliyê û tekezkirina şefafiyetê di peywendî û karûbarên hikûmetê de. Eşkerekirina butçeyê bi herdû aliyên wê –dahat û xercî-. Karkirin bo geşkirina jêrxaneya aborî û civakî û pêdagirîkirin liser serjimarî û nexşe û plan û lêkolînên zanistî, çareserkirina bêkariya sergirtî û pîrozkirina kar wek maf û wek erk.

10- Ev 18 sal in ku ev herêm ji aliyê PDK û YNK'ê ve tê birêvebirin, ger em qonaxa 1993-1998 deynin aliyekî, di warên ewlekarî û aborî û warê azadiyan de, li gel parêzgehên din ên Îraq'ê te berhevkirin. 18 Salên hukmraniyê û 12 salên aramiyê ne kêm in. dahata 18 salan a herêmê wek tê texmînkirin zêdeyî 100 milyar dolaran bûye, bo geşkirina jêrxaneya aborî ya 3 parêzgehan ku jimara daniştvanên wan kêmî 4 milyonan e, nê kêm e. Butçeya salane ya herêmê piştî qonaxa "rizgariya Îraq'ê" ji butçeya nêzîka 60 welatên endam di UN'ê de, zêdetir e. Piştî şerê cîhanî yê dûyem Almanya hatibû wêrankirin, xerciyên avakirin û geşkirin û vegerandina wê li rêza welatên pîşesazên Ewrûpa nêzîka 29 milyar dolaran bû, dem jî ji 12 salan kêmtir bû. Japonya 27 milyar dolar û di demeke kurttir de. Dema mirov dahata herêmê û jimara daniştvanên wê û ast û awayê avakirinê û standara jiyana herdû welatên navborî dide berhev, cudahî zêde ne. Ger qonaxa berî rizgariya Îraq'ê dikare bê gotûbêjkirin, lê piştî 2004an û heta niha balkêş e. Hê desthilata Herêma Kurdistan'ê ne ku bi tenê jêrxaneya aborî ya herêmê geşnekiriye û hevkariya ciddî bo gelê me nekiriye, lê berevajî vê yekê û jiber nebûna bername û planeke ron û eşkere ya 5 kabîneyên borî yên Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê, dema xelkê me vedigerin bajaran rastî koçeke dijber a xwe bi xwe tên. Heta niha ti neşxeyeke ciddî nayê dîtin bo çareserkirina vê xalê. Di kampanya hilbijartinên 25.07.2009'an de, lîsteya desthilatê gelek soz dan herwiha opozisyonê jî, ku di butçeya îsal a pêşniyarkirî ya hikûmetê de pereyên ku hatine terxankirin bo (Banqa Kiştûkalê 42 milyon dolar û banqa pîşesazî 24 milyon dolar = 66 milyon dolar in û tevî 300 milyon dolarên sandoqa niştecihbûnê jî dike 366 milyon dolar), ev nagihe nîvê hevkariya salane ya YNK û PDK'ê ku her meh ji aliyê Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê ve ji wan re tê veguhastin ku nêzîka 800 milyon dolaran e (li gor ku hinek berpirsan behs kiribû). Ev herdû hizb tên naskirin ku dû hizbên xwedî şiyan in û gelek çavkaniyên wan ên dahatê yên din jî hene. Divê opozisyon bi awayekî ciddî liser vê pirsgirêkê kar bike û sozên ku di vî warî de dane paşguh nexe.

11- Rizgarkirina bazar û bazirganiya herêmê ji diyardeya talan û tevlîhevî û monopliya cemserên serekî yên çarçoveya berteng a desthilata herêmê. Şopandina yasaya hilberînê li herêmê nemaze hinek bendên madeya 4ê ji beşê 4 an). Azadiya bê prensîb û bê çarçove bê liberçavgirtina ewlekariya neteweyî û niştîmanî dibe sedemê bextreşî û tevlîheviyan.

12- Şopandina girêbestên "stratejîk" di navbera Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê û şîrketên biyanî de bi taybetî di warê gaz û petrolê û rê û pir û avakirinê de. Veşartina naveroka zêdeyî 35 girêbestên gaz û petrolê ji parlamen û gelê Kurdistan'ê û fetisandina wan di navbera çend kesan de, karekî xirab e. Divê opozisyon kar liser vegerandina van girêbestan bo nav parlamenê bike, herwiha sererastkirina yasaya gaz û petrolê li gor ku desthilata parlamen liser hebe û di destpêkê de razîbûna xwe liser wan pêşan bide. Gaz û petrol samana nefşê niha û pêşerojê ye, madeyeke stratejîk û sînordar e, û bi tenê parlamen biryarê liser pirsên stratejîk dide, kesên ku li jêr navê taybetmendiya sektorê petrolê û pisportiyê, rê li pêşiya şandina girêbestan bo parlamenê digrin û razîbûna parlamen wek tiştekî pêwîst nabînin, ji desthilata parlamenê û astê zanistî yê nûnerên milletê me kêm dikin. Ger desthilat pêdagiriyê liser helwêsta xwe bike, divê opozisyon vê pirsgirêkê yekalî bike.

13- Rizgarkirina sîstema perwerdeyê û pirsên jinan û gencan ji diyardeya çavlêkirinê û rûgeşî û bê liberçavgirtina rewşa aborî û civakî û neteweyî ya civaka me û danîna sînorekî bo projeyên seqet ên warê perwerdeya bê serobin û binketî.

14- Pirsgirêkên navçeyên veqetandî zêde ne. Serkirdayetiya fermî ya kurdistanû herwiha opozisyon jî berpirsiyar in ji dîtina çareseriyekê bo van arêşeyan, bi taybetî rawestandina proseya Erebkirinê û vegerandina kurdan li navçeyên herêmê û çespandina xwendina bi zimanê kurdî li xwendingehan û şopandina awayê peywendiyan di navbera herêm û Bexda de li gor ku ev navçe hê cihê nakokiyê ne, tiştê ji hikûmeta Bexda re rewa be divê heta bên yekalîkirin ji Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê re jî rewa bin angu bi rêya lihevkirinê di navbera desthilata herêmê û desthilata navendî ya Îraq'ê de.

15- Yekkirina yasayên navenda Bexda li gel yasayên herêmê nemaze yên ku bi awayekî yekser û ne yekser bi meaş û jiyana xelkê ve girêdayî ne. Nabe ku cudahî di meaşê karmendên hikûmî û xanenişînên hikûmeta Bexda û hikûmeta herêmê û dezgehên din de hebin, jiber divê hemû hevwelatiyên herêmê wekhev bin li pêşiya yasayê û destûrê mafên wan misoger kirine.

Berevajî diyardeyên negatîf û di çarçoveya lîstika demokrasiyê de, lîsteya desthilatê dengê piraniyê aniye û heta 4 salên din jî hukmrane û pêdgiriyê liser mabûn û hebûna xwe dike beramberî vê yekê jî bo opozisyonê jî rewa ye hewldanan bike bo cîbicîkirina bernameyê we û nehîştina diyarde yên neyênî û kêmasiyan. Mabûna yekem û gihandina dûyem bo desthilatê liser bername, wize, şiyan û karkirina wan ve girêdayî ye.

Bi kurtî, derfeteke baş li pêşiya opozisyonê ye bo hevahengiyê li gel desthilatê derbarê cîbicîkirina xalên hevbeş yên bernameyên herdû aliyan û bo guşarxistina ser desthilatê bo pêkanîna xwestek û daxwaziyên gel. Pişta lîsteya desthilatê rast e bi encamên hilbijartinan û war û şiyanên hikûmetê, herwiha pişta opozisyonê jî xurt e bi dengê wê û bi kolana kurdistanî. Opozisyon dikare bi awayekî hêja mînbera parlamen û navgînên ragehandinê bikar bîne bo dirustkirina pirekê di navbera xwe û xelkê de û çîn û texên gel hişyar û agahdar bike û di dema pêwîst de û bi awayên aştiyane û germ û coşî wan tevî proseya parastina yasa û rawestandina hemû corên binpêkirina yasayê ji aliyê desthilatê ve, bike.

Careke din Herêma Kurdistan'ê rûbirûyê tecrubeyeke nû û ezmûn eke dijwar dibe, xala bingehînî ya bawerî û rastgoyiya desthilat û opozisyonê, girêdana bi sozên wan û binema û bingehên yasayê ve ye!

Ev nîvîs ji bo Le Monde diplomatiquê kurdî hatiye nivîsandin.

Werger ji soranî
Azad Kurdî

IRAQ

Şerê bêkêr İraq'ê wêran dike

NIR ROSEN*

Çend hefte piştî destpêka êrîşa Amerîka'yê bi ser İraq'ê ve, di Adara 2003'an de bi hezaran kes çûn devê deriyê avahiya komeleya girtiyên azadkirî -vîllayeke deteserkirî ya berpirsiyarekî rejîma Saddam Husên.- Li ser dîwaran lîsteya navan hatibûn daliqandin ku li gorî rêza alfabeyê bû. Ev lîste dema ku xelkê navenda rêxistina îstîxbaratê talan dikir, bidestketibû. Mirovên bêhêvî, bi tiliyan di ser navên di lîsteyan re diçûn, bi hêviya ku fêr bibin çi bi serê xizmên wan ên ku polês ew girtî hatibû, aqûbeta wan fêr bibin. Para bêhtir ya ku mirov pê dihisiyan ne baş bû – weke kuştina çar kesên ku gumana endametiya partiya Daawa, -partiya Şîa ya qedexekirî-, ji wan dihate kirin, agahiya kuştina van kesan malbatên wan heta bi gorên komî birin da ku cenazeyan derbixin.

Piştî sê salan, welat kete nava tarîtiya şerê navxweyî: Hukmê milîs û tîmên kuştine hebû, nexasim li ser rêyên Bexda'yê; malbat ji nû ve ji bo ku xizmên xwe bibînin dibûn rêz, vê carê li devê deriyê morgê cihê ku mexdûr lê dihatin komkirin ji bo îhtîmala naskirinê werin nîşandan.

Zêde dem jêre neviya ku İraq noqî nav kaosa şerê di navbera mezheban de gurrkirî bibe. Hemin vî şerî beriya 2003'an dest pê kiribû û mentiqî xuya dikir ku xistina Saddam Husên wê rê li ber tewazûneke nû ya desthilatdariyê veke û wê giraniya Şîayên pirranî di vê tewazûnê de hebe (1). Lê belê bi tenê xwerû weke mezhebî şîrovekirina tengezariyên heyî, ji aliyê Washington'ê ve li hev hatibû çêkirin da ku wan gurr bike. Dewletên Yekbûyî yên Amerîka'yê Partiya Baas weke kopyayeke nû ya Partiya Nazî dît û bi awayekî şaş tevahiya Suniyan pêve girêda û hemû weke "dijminan" ji xwe re kirin hedef – ev biryarek bû ku di encamê de hîpoteza wan a qelp û şaş di demeke kurt de veguherî rastiyeke darî çav.

Wekî din jî hebûna leşkerên amerîkî asteng dikir ku hikûmeteke xwedî rewabûneke bi rastî ya gel bi gewde bibe; vê hebûna eskerî kir ku têkiliyên di navbera mezheban de xirabtir bibin, lewra komên li dijî hebûna eskerî ya biyanî şer dikirin (nexasim Sunî) pirsgirêkên wan bi kesan re çêdibûn yên ku wan ew bi alîgiriya eskerên biyanî gunehbar dikirin. Rewşeke anarşiya giştî di demeke kurt de li İraq'ê peyde bû. Ne hêza İraq'ê ne jî hêza Washington'ê têrê nekir pêre bike der. Piştî demeke talanê ya bêserûber, valahiya heyî ji aliyê çekdaran ve hat dagirtin; hinan ji wan şaşikên dînî yên Şîayan li serê xwe kiribûn, hinan jî kefiya berxwedanê li stûyê xwe pêçabû, lê belê pirraniya wan endamên çeteyan bûn.

Di alema Misilmanan de mizgeft saziyek ji saziyên din e, dîsa jî ew ji destpêkê ve bi rolekî radibe ku aliyên wê yên dînî, civakî û siyasî hene. Rojê pênc caran banga nimêjê di nava taxan de rîtma jiyana rojane û dewra jiyanê birêkûpêk dike. Li vî cihî bawermend ji bo nimêjê kom dibin, fêr dibin, diaxifin û seferber dibin. Xutba înê pirî caran banga çalakiyê ye; û çi pirsên dînî bin çi jî karûbarên navneteweyî bin, melayê li pêşiya cimeetê nimêj dike, îşaret bi pirsgirêken bandorê li civakê dikin, dike. Di dewletên otorîter de mîmber ji bo wan dengên kêm, platformek e ku alternatîfeke nîqaşên fermî pêşniyar dikin. Bi heman awayî li İraq'ê piştî ku dewlet têk çû, mizgeft vediguhere saziya herî girîng a welêt û bi kêra bihevvegirtina civakê tê: Beriya her tiştî bi misogerkirina xizmeta civakî; paşê carinan bi xwe veguherandina embarên sîlehan, cihê agahdariyê û cihê kombûnê.

Li hemberî derketina gerîla, Dewletên Yekbûyî yên Amerîka'yê çavkorî tevgeriya. Bi dehhezaran iraqî girtin yan jî kuştin. Ew zû tênegihiştin ku ya serê wan pêre di belayê de berxwedaneke rêxistinkirî ye, û ji vê û wê de jî tênegihiştin ku şerekî navxweyî di navbera milîsên Sunî û Şîa de dest pê kiriye.

Dawiya 2004'an, piştî xirakirina bajarê Felûce'yê, bi dehhezaran Sunî li Rojavayê Bexda'yê bi cih bûn, di heman demê de Şîa li taxên din bi cih bûn û Suniyên li van taxan jî bi darê zorê kirin der. Ji ber bêkêriya hikûmetê û Dewletên Yekbûyî yên Amerîka'yê ya misogerkirina ewlekariyê û xizmetên civakî, milîsan xwe ji bo van karan wezîfedar kir.

Diviyabû em li benda 2006'an bimînin da ku Washington bigihêje encama diviyabû 2003'an bigihêjiyê: Berxwedan hêza xwe ji hebûna eskerî ya amerîkî digire, ya herî baş ew e ku berpirsiyariya nîzama gelemperiyê mirov bide hikûmeta İraq'ê. Lê ev biryar gelekî dereng mayî bû. Lewra hêzên ewlekariyê yên ku pirraniya wan Şîa, di şerê navxweyî yê mezhebî de cihê xwe digirin.

Şîddet xetera pêşîvekirina li şerekî tevahiya herêmê belavbûyî diafirîne. Hêzên Amerîka li ser vê, siyaseta xwe diguhere. Partîzanên dijberê serhildanê zorê didin rêveberiya amerîkî da ku eskerên nû bişîne İraq'ê, bi taybetî jî Bexda'yê. Serokê DYE'yê di Çile ya 2007'an de dide zanîn ku bîst hezar eskerên din – yên seferberiyê (2) - jî gihiştine İraq'ê. Ev eskerên nû li paytextê hatin bicihkirin; li dora taxan dîwarên stûr ên ji beton lêkirin da ku karibin şêniyên wan kontrol bikin. Eskeran serjimara şêniyan temam kir, bi milîsên deverê re hevkarî kirin û alîkariya xelkekî halê wî nemayî kirin. Di heman demê hêzên ewlekariyê hem milîs û hem jî sivîl gunehbar kirin û li deverê destek dan serketina Şîayan. Gelek tax yekreng (homojen) bûn, Sunî neçar man wan biterikînin; bi milyonan mirovên ji mal û xaniyên xwe bûn, berê xwe dan wargehên penaberan ên xizan ên li bejahiya welatên din ên Rojhilata Navîn – bi taybetî li Sûriye (3) û Urdin'ê.

Dibe ku ji seferberiyê bêhtir, danezana destpêkirina wê kir ku komên çekdar ên Sunî taktîka xwe biguherin. Jixwe hê di şerê bi El-Qaîde'yê re, ew pê hisiyan ku DYE naxwaze destekê bide Şîayan û hîç naxwaze destekê bide îraniyan. Ji ber êrîşên eskerî yên artêşa amerîkî lawazbûna El-Qaîde'yê –nexasim li parêzgeha El-Enbar'ê – kir ku ev komên Sunî ewle bin; wan pereyên amerîkî stendin bêyî ku veguherin eskerên bi pere yên Amerîkayê. Ew hêvî dikin, eger dijberê wan El-Qaîde were tinekirin û artêşa amerîkî vekişe ji heqî Şîayan derkevin – hem jî fikirîn ku ev yek wê gelekî hêsan be, ji ber ku Washington'ê ji pêncan yekê eskerên xwe, tevî ku hikûmeta İraq'ê nedixwest jî, di nava hêzên hikûmetê de jî bi cih kirin.

Paralelî vê, milîsên Şîa jî derbeke paşvezîvirî xwarin. Ne bi tenê civaka wan bi xwe êdî ew her diçû bêhtir weke çeteyên asayî ditîtin, belê serokwezîr Nûrî El-Malikî jî pê hisiya ku ev kom desthilatdariya wî dixin tehlûkê û ji xwe re kire kar ku wan bi awayekî xedar bitepisîne – dîsa jî eskerên "fermî" pirraniya wan Şîa man. Li ser vê yekê, van milîsan biryar da çalakiyên xwe rawestînin, wan jî hêviya xwe ya ji nû ve destpêkirinê ji piştî vekişîna eskerên amerîkî re hişt.

Yek ji hêmanên herî kêm tê nasîn ên stratejiya dijberî serhildanê a pêwendî seferberiyê hucûma li dijî baregehên sereke, deverên palpiştî û çavkaniyên gelekî girîng ên milîsan bû. Bi bicihbûna nava taxan, parastina şêniyan û bilindkirina derdora dîwarên ji betonê tedbîrên herî berbiçav ên vê siyasetê bûn. Belê artêşa amerîkî operasyonên xwe jî hem li hundir û hem jî li derveyî Bexda'yê li dijî milîsên Şîa zêde kirin: Di navbera Sibat û Tebaxa 2007'an de mehê hezarek endamên wan girtin û gelek ji wan jî kuştin. Em dikarin bêjin ku artêşa amerîkî sala 2008'an İraq ji nû ve dagir kir. Her çawa be, şîddet beriya vê tevgera artêşa amerîkî kêm bûbû; "paqijiya etnîk" para bêtir pêk hatibû. Di 2008'an de şîddet hê dima, belê şerê navxweyî bi dawî bûbû – nîşana van demên nû; dewlemendan erebeyên xwe yên luks derxistin.

Berpirsiyarê Neteweyên Yekbûyî li İraq'ê Stefan de Mistura dibêje; "ji bo ku em zanibin rewş çi ye, ya herî baş ew e mirov berê xwe bide penaberan." Ew vê tesbîtê dike: "Vegera wan îşaret bi normalbûna rewşê dike. Ew vegeriyan lê ne bi hejmareke hevgirtî." Ev yek berevajî ya li cihên din ên Stefan de Mistura lê wezîfedarkirî qewimî bû: "Li Kosova'yê du milyon mirov vegeriyan û em gelekî şa bûn – le her weha ev kar ji me zêde bû." Piştî hilbijartinên herêmî yên İraq'ê yên Çile ya 2009'an rewş ji wî re bi awayekî zelal diyar bû: "Bexda'yê reng guherîbû. Paqijiyeke mezhebî pêk hatibû: Bajar êdî para bêhtir Şîa bû."

Vegera per bi paş ve nebû. Pisporekî artêşa amerîkî yê ku ji nêz ve hevkariya General David Petraeus (serfermandarê berê yê hêzên amerîkî li İraq'ê) kirî, ji 2008'an û vir ve ji xwe piştrast digot, şerê navxweyî li İraq'ê wê bi dawî bibe, bi awayê ku Şîa wê wisa hîs bikin bi ser ketine û Sunî jî wisa hîs bikin ku bi bin ketine. Ev yek qewimî.

Beşek ji iraqiyan ji cih û warên xwe bûn, pirraniya wan Sunî, li cih û warên xwe venegeriyan. Beşeke din jî tevî ku milîsên Sunî êdî hew dikarîn xwe bikin yek û hin kadroyên wan ji aliyê El-Qaîde'yê ve hatin kuştin jî, bi êrîşa hikûmetê re rûbirû bûn. Vê yekê, piştî girtina lîderekî herêmî kir ku li Fazil'ê serhildaneke demkurt di Adara 2009'an de rûbide. Şerê çekdarî yê qewimî kir ku tirsa ku wê şerê navxweyî ji nû ve dest pê bike, peyde bibe. Tiştek neqewimî – ne ji ber efûya giştî ya ku DYE'yê dixwest, bêhtir ji ber ku serketina Şîayan temam bû.

Di Mijdara 2008'an de Washington'ê hukmê ku her weha li ser nêzî sedhezar şervanên endamê komên Sunî ye jî, da dest hikûmeta İraq'ê. Lê bi zor ji sedî 5'ê vê hêzê di nava artêşê de hatin bicihkirin, bi ser de jî lîderên wan ên sereke û hejmareke baş a şervanên wan jî girtî bûn û ji yên mayî jî dihat xwestin ve-

** Rojnamevan, li Navenda Lêkolînên li ser Qanûn û Ewlekariyê ya Zanîngeha New York'ê lêkolîner e. Nivîskarê vê pirtûkê ye: In the Belly of the Green Bird: The Triumph of the Martyrs in Iraq (Di zikê çûkê kesk de: serketina şehîdan li İraq'ê), Free Press, New York, 2006.*

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

gerin malên xwe. Pêvajoyeke gelekî nazikane ye ku ji bo lawazkirina komên Sunî yên guman ji wan tê kirin li ber dewletê rabin tê birêvebirin.

Weke gerîla û weke serhildêran, bi çalakiyên xwe yên neqanûnî û bi danîna hîmê xwe di nava desteka gel de, komên Sunî tesîr û hêza wxe nîşan dan. Niha beşek ji berxwedanvanên berê tên nasîn û mûçe jî distînin; navên wan, navnîşanên wan û agahdariyên derheqê wan de yên biyometrîk di destê hukimdarên amerîkî û iraqî de ne. Têra xwe ji wan jî reviyane – hin ji wan jî reviyane derveyî welêt. Dema berê xwe didin rabuhiriyê gelek rêveberên wan yeqîn dikin ku bi hevgiriya DYE'yê re hesabekî şaş kirine.

Di hilbijartinên parlemanê yên 7'ê Adar'ê de namzetiya bêhtirî sed kesî hat redkirin, weke sedem jî têkildariya bi Baas'ê re hat nîşandan. Bi vî awayî hikûmet rejîma berê ya mirov jê nefret dikin bi kar tîne da ku gel çavtirsandî bike û her muxalefetê jî bêdeng bike. Hin ji van namzetan neteweperest bûn, hin Sunî, lê para bêhtir jî Şîa. Ev qedexeya li pêşiya namzetiyê xwe nasipêre ti hîmê huqûqî û bi awayekî zelal xwebirêkûpêkkirina hêzeke otorîter nîşan dide.

Hikûmeta heyî ya iraqî bertîlxwur, xeddar, zordar lê bi hêz e; pişta wê bi serketina wê rast e û bi vê jî bi biryar îdîaya desthilatdariya xwe ya temam dike. Yên ku ji lihevhatineke di navbera mezheban de bawer dikirin şaş bûn: Ev ê nebe û jixwe ne hewce ye jî. Tevî ku hêza wî rewatir û populertir ji ya yê beriya xwe xuya dike jî, Malikî dibe Saddamekî nû. Dîsa jî hêza wî wê ji aliyê komên din û parlemaneke ku bi daxwazeke xurt hatinên aborî kontrol dike were sînordarkirin. Ji Şîayan hat ku hatina aborî li zerara Sunî û laîqan parve bikin. Şîa erê parçebûyî ne, belê hem hejmara wan zêdetir e, hem jî giraniya wan di nava dewletê de û hêzên wê yên ewlekariyê de her diçe zêde dibe – jixwe em behsa palpiştiya hêza super a dinyayê bi rê ve dibe, dide wan jî nakin. Di vê demê de DYE xwe dide şerekî xwe yê kevin ê li Afganîstan'ê – bi vê jî hewl dide vekişina xwe ya ji Iraq'ê baştir bi derve nîşan bide. Nîzama nû ya li vî welatî hat bicihkirin dikare bêdengiyê bîne wir, lê bîlançoya şer zêde giran e: Bi sedhezaran mirovên hatî kuştin, bi milyonan mirovên ji cih û warên xwe bûyî, welatekî wêran û bê aramiya tevahiya herêmê.

Werger ji fransî
Lokman Turgut

(1) Ti daneyên bawerî bi wan were li ser rêjeya civakên cihê nîne – em navên wan hildin ereb, kurd û turkmen; der barê rêjeya rastî ya Sunî û Şîayan de jî agahyên bêhtir nînin, ya tê zanîn ew e ku Şîa ji Suniyan bêhtir in.

(2) Bixwîne, Alain Gresh, "Les Etats-Unis vont-ils gagner la guerre en Irak ? (Ma Dewletên Yekbûyî yên Amerîka'yê wê di şerê Iraqê de bi ser kevin ?)", Le Monde diplomatique, Adara 2008'an.

(3) Bixwîne, Theodor Gustavsberg, "Silencieux exil des Irakiens en Syrie (Penaberiya bêdeng a iraqiyan li Sûriye'yê)", Le Monde diplomatique, Îlana 2008'an.

Li İraq’ê şerê ereb û kurdan

JOOST R. HILTERMANN*

Xirabbûna têkiliyên navbera ereb û kurdên Îraq’ê tiştekî nû nîne: Koka wê diçe heta bi sozên hatî dayîn – û paşê nehatin girtin – yên piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û dawîlêhatina İmperatoriya Osmaniyan. Piştî dagira Amerîka’yê ya sala 2003’an daxwazên kurdan ji nû ve bihêz xwe dan der û rêveberên wan hewl dan sûdê ji lawaziya Bexda’yê bigirin. Lê belê her tişt hê dikare biguhere. Desthilatdariya navendî hêdî hêdî xwe ji nû ve ava dike, ev yek jî bi hêvî û perspektîfên firotina zêde ya petrolê xwe nîşan dide, lewra peymanên nû bi şîrketên biyanî re nû hatine mohrkirin. Kêliya çarenûsê diyar bike ya têde rêveberên kurd û federal divê biryarekê bidin, nêzîk dibe: yan wê li hev bikin yan jî eger bi ser nekevin divê xwe ji şerekî hundir ê gelekî xwînrij ê paşerojê re amade bikin.

Ji bo gelek iraqiyan wate ya peyva neguncav û ne di cîh de “şerê di navbera Şîa û Suniyan de” ev e: Ji bo bigihêjin armancên xwe yên siyasî rêveber “destikê mezhebî” dixebitînin, ev peyv jî vê rastiyê vedişêre. Heman tişt ji bo “pirsgirêka ereb û kurdan” jî derbas dibe. Ya rastî iraqî tam neheq jî nînin. Li taxên Bexda’yê malbat û komên civakî tevlîhev bûne; ereb û kurd bi hev re dizewicin û nasnameya iraqî weke nasnameyeke hevbeş dibînin.

Ev hêman bi tenê li navenda bajarên mezin heye. Ji ber ku her ku mirov nêzî gir û geliyên bakur ên ber bi sînorê Îran û Tirkiye’yê ve, çiyayên bilind ên Kurdistan’ê dibe, ewqasî ev nasnameya iraqî kêm dibe û cihê wê neteweparêziyeke xurt a kurd digire ku gelekî dijberê neteweparêziya etnîk a ereb ya ku xwe di bin kirasê yekîtiya Îraq’ê de vedişêre ye. Ev doza neteweparêziya kurd rewabûna nîzama dema piştî Osmaniyan jêdipirse û li ber radibe. Kurd ti carî tevlî vê nîzamê nebûn. Vê doza neteweparêziya kurd a fikrê êdî dewra wî bihuriye yê “dewleta netewe” ya ku dewletê û nasnameya etnîk bi hev ve dike ji nû ve derxist holê.

Niha şerê diyarkirina sînorên di navbera “Îraq a kurd” û deverên mayî yên welêt ên piraniya serjimara wê ereb de dewam dike. Eger em bi tenê guh bidin kurdan sînorê di navbera kurd û ereban de çiyayên Hemrîn e ku di navbera Bexda û Bakurrojhilatê welêt de piştî geliyê Dîcle yekemîn rêzeçiya ye. Dema rêwiyek lê binêre jê we ye li ser deşta heta bi quntara çiyayên Zagrosan dirêj dibe, bi tenê girek e. Eger li hemberî vê em bi tenê guh bidin ereban, sînor li devera ku rêveberên berê yên Bexda’yê danî ye: Li ser xeta îdarî ya ku parêzgehên Dihok, Hewlêr û Silêmaniyê ji deverên mayî yê welat qut dike.

Ev xet encama hewldaneke kurdan a berê ye. Dawiya salên 1960’î wan hewl da sûdê ji lawaziya desthilatdariya navendî û Partiya Baas’ê bigirin ku êdî hêza wan kêm dibû û li hevalbendan digeriyan. Sala 1970’î hikûmeta navendî û serokê kurd Mistefa Barzanî li ser peymanekê li hev kirin ku soza xweseriyeke heta bi radeyekê dide herêmên piraniya serjimara wan kurd. Tevî ku Barzanî red jî kir Bexda’yê qanûneke otonomiyê çêkir, bi vê qanûnê sînorên herêma xweser a kurd û her weha mafê otonomiyê (1) heta radeyekê rewa bûn.

Sala 1991’ê rejîma Saddam Husên ji Kuweyt a sala beriya wê dagirkirî, bi darê zorê hat derxistin. Raperîneke li herêma kurdan a biharê kir ku artêşa Îraq’ê dest werde. Li ser zexta Dewletên Yekbûyî yên Amerîka’yê û hevgirên wê artêşa Îraq’ê neçar ma xwe vekişîne ser xeteke parastinê – jêre xeta kesk tê gotin – ku sînorê wê li hin cihan li gorî sînorê herêma otonom a peymana sala 1970’î ye. Xeta kesk di tevahiya salên 1990’î de ma û tevî ku kurdan hewl da sînorên xwe ferehtir bikin jî, piştî 2003’an jî hem di destûra bingehîn a demî ya sala 2004’an (Transitional Administrative Law) de û hem jî di destûra bingehîn a mayînde ya sala 2005’an de jî weke sînorekî rewa hat qebûlkirin. Li gorî destûra sala 2005’an, erdên ji vê xetê dibihurin yên li ser wan nehatiye lihevkirin hemû, diviyabû statuya wan bi referandûmeke dawiya sala 2007’an diyar bibûya.

Ji ber ku bi referandûmê li fikra gel nehat pirsîn, rêveberên kurd rewabûna xeta kesk xistin jêpirsînê û qebûlnekirin. Wan xwe li nezanîna sînorê vê xetê danî, tevî ku nexşeyên gelekî baş ên salên 1990’î hene ku wan jî ev nexşe di rabihuriyê de bi kar anîbûn. Bi ser de jî ji wan hat ku bi artêşa emerîkî ya ku erda lê û dîroka herêmî kêm nas dike, bidin bawerkirin ku ev xeta navdar di cihekî din re ... derbas dibû. Sînorê nû yê jêre tê gotin “Trigger Line” veguherî xeta nû ya di navbera artêşa Îraq’ê û hêzên kurd (yên berê weke pêşmerge navê wan dihat hildan) de. “Trigger Line” li başûrê xeta kesk e, beşeke girîng a erdên li ser wan nehatiye lihevkirin digire nav xwe, di nava van erdan de jî beşek ji parêzgeha Kerkûk’ê heye ku alî li ser gelekî dikevin qirika hev (2).

Ev erdên, li ser wan aliyan li hev nekirî, di nava xwe de rezervên gaza xwezayî û petrolê yên gelekî girîng dihewînin. Kurdên doza dewletê dikin çavê xwe zêde berdane van dewlemendiyan, lê belê hikûmeta navendî ya ku çi serbixwe û çi otonom peydebûna Kurdistaneke xurt naxwaze, wê ti carî jidil dev ji van dewlemendiyan bernede. Çawa ku di nîqaşên xwe yên siyasî de cihê xeta kesk guhertin, di axaftinên xwe yên ji raya giştî re rêveberên kurd xwe jê venadin ku rezervên petrolê bikin nav dewlemendiya petrolê ya herêma xwe de, bi carekê li çavkaniyên xwe yên sînordar gelek qatan zêde dikin.

Neteweparêzî kêm caran li hev dikin, tevî kîn û dilmayîn, pirsgirêkên li ser sînoran û pirsgirêkên bêserûber derdikevin holê hemûyan jî dîrok tijî lihevhatinên dîrokî yên mayînde ye. Bi heman rengî sînorê di navbera fars û alema ereb de yê ku di salên 1980’î de bû sedema şerên xwînrij (Şerê Îran û Îraq’ê), tevî ku peymaneke li ser hatî lihevkirin nebû jî bi sedsalan nisbî sabît ma. Ji bo ku mirov fêm bike ku li ser gelek mijaran li hev dikin, bi hev re dikarin karûbarên xwe bikin û desthilatdariyê parve bikin, têrê dike mirov bi kurd, ereb û turkmenên Kerkûk’ê re bipeyive. Mixabin hêzên derve (ji bo ku hilweşînin) dikarin binê tevahiya hewldanên lihevkirinê bikolin – ew ê vê bikin jî: Ji bo rêveberên Bexda û Hewlêr’ê (paytexta herêma kurdan) pirsgirêk weke lîstikekê ye ku her alî têde bi bin dikeve, di vê lîstikê de hêzên herêmî bi tenê piyon in û ne tiştekî din in. Eger em pirsgirêka turkmenên ku ji aliyê Tirkiye’yê ve tên parastin jî lê zêde bikin, ev lîstik hê bêhtir tevlîhev dibe.

Bexda û Hewlêr her du jî projeyeke neteweyî çêdikin û serketina vê projeyê jî wê girêdayî mêzîn û tewazûna hêzê ya di navbera wan de be. Kurd hewl didin erdên xwe fereh bikin û sûdê ji derfet û îmkanên peyde dibin bigirin. Piştî êş û azara dehsalên erebkirinê (te’reb), jicihûwarkirinan û komkujiya birayên wan ên li çiyayên li Rojhilatê Kerkûk’ê Germiyan’ê (3) di salên 1980’î de, em sedemên kurdan fêm dikin. Yên ku bi darê zorê birin deverên ji nû ve bicihbûnê yên bêkes û kus û yan jî yên ku reviyan wargehên penaberan ên li Îran’ê niha vedigerin: Ew dixazin erdê xwe paş ve bistînin û xaniyên xwe ji nû ve ava bikin.

Lê di lîstikekê de ku ti alî têde bi ser nekevin, bersiva didin paqijiya etnîk, paqijiyeke etnîk a berevajî ye – gelek ereb rewşê weke kurdkirinê (takrîd) bi nav dikin. Rejîma Baas ew bi darê zorê li Kerkûk’ê û li deverên din ên li ser nehatî li hevkirin bi cih kirin. Niha ji wan tê xwestin “vegerin herêmên jê hatî.” Rewş çi dibe bila be, em ji bîr dikin ku ev welatî, mexdûrên hêzên mezin in, mafê wan ên ku destûra bingehîn misoger dikin hene, di nava van mafan de bicihbûn û dengdana li her devera Îraq’ê jî heye. Bi ser de jî nifşê li Kerkûk’ê ji dayikbûyî yên van ereban yên ku ti cih û warê wan li devereke din nîne, heye (4).

Şêniyên kal û pîr ên Kerkûk’ê bi nostaljiyê demên berê yên xweş bi bîr tînin ji 1930’î heta 1958’an dawiya monarşiyê, bajar modeleke pirrengî û bihevrejiyana etnîsîteyên cihê (te’eyuş) bû. Erebkirinê bi awayekî hov dawî li vê yekê anî. Bi awayekî mafdar kurd îdîa dikin ku helwesta wan a li hemberî ereb û komên din ên hindikahî yên li erdên li ser nehatî lihevkirin gelekî ji ya Baas’ê kêmtir bi şîddet û hov e. Ew her weha îdîa dikin ku ew berjewendiyên xwe di çarçoveya destûra bingehîn û huqûqê de diparêzin. Lê belê encam heman tişt e – ji destgirtina mafê dengdayînê heta bi jicihûwarkirina mirovan.

Sala 2007’an Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî, Mîsyona Alîkariyê ya Neteweyên Yekbûyî ji bo Îraq’ê bi çareserkirina pirsgirêka li ser “sînorên hundir ên li ser wan nehatî lihevkirin” ên Îraq’ê, wezîfedar kir. Ji hingî ve, Mîsyona Alîkariyê ya Neteweyên Yekbûyî ji bo Îraq’ê raporeke girîng amade kir (ji raya giştî re nehat eşkerekirin, dan hêzên sereke yên aliyên pirsgirêkê ne). Rapor senaryoyên cihê li ber çavan digire û ji bo lihevkirineke di encama hevdîtinan de hin pêşniyaran dike. Rêveberiya Serokê DYE’yê Barack Obama bi tevahî vê insiyatîfê destek dike, lê belê li benda encamên hilbijartinên parlemanê yên vê mehê dimîne.

Ew ê bibe karê rêveberên nû yên welêt ku yekser pirsgirêka erdên li ser wan nehatî lihevkirin bigirin dest, çareseriyan pêşniyar bikin û dema vê jî dikin divê daxwaz û dîroka her aliyî li ber çavan bigirin û lihevkirineke were qebûlkirin, zexm bikin. Ev kar zehmet e û dem jî kêm maye. Vekişîna eskerên amerîkî di demeke gelekî kurt de, wê bike ku bandora rêveberiya Washington’ê têra xwe kêm bibe û eger şer biqewime wê ji Neteweyên Yekbûyî jî neyê valatiya heyî dagire.

Pirsgirêka nîşankirina sînorê di navbera Kurdistan û Îraq a mayî de wê damezrandina nazik a dewleta nû her bixe xeterê. Bi demê re hêza navendî dibe ku xwe bihêztir bike û weke berê hewl bide daxwaza xwe li ser kurdan ferz bike. Dikare bajarên wan ên li deştan kontrol bike û şervanên wan ber bi kelehên wan ên çiyê ve daf bide, ji wan kelehan jî ew ê ji nû ve şer bidin destpêkirin. Kurd jî ji aliyê xwe ve dibe ku destketiyên xwe yên piştî 2003’an biparêzin, wê kêfa xweseriyeke mezin li herêma xwe derînin û de facto erdên li ser wan nehatî lihevkirin ên ku pirraniya serjimara wan kurd e, kontrol bikin. Dibe ku her weha hêviya xwe ya rojekê dîtina damezrandina dewleteke kurd jî biparêzin. Ev yek wê di çarçoveya serûbinîhevbûneke herêmî de biqewime û destûrê bide guhertina sînorên navneteweyî û perspektîfên nû ji neteweyên bê dewlet re veke.

Werger ji fransî
Lokman Turgut

** Alîkarê Midûrê Middle East and North Africa Project (Projeya Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîka’yê) a International Crisis Goup (Koma Krîzê ya Navneteweyî), Bruksel.*

(1) David McDowall berhemekî gelekî baş li ser dîroka kurd nivîsî, A Modern History of the Kurds(dîrokeke modern a kurdan), I.B. Tauris, London, 2000. Vegotina rojnamevanî ya Jonathan Randal ya bi nave , After Such Knowledge, What Forgiveness ? My Encounters with Kurdistan (Piştî evqas zanîn, li çi bibuhirin? Rasthatinên min bi Kurdistan’ê re) pirsgirêkê di çarçoveyeke dîrokî de bi cih dike. (Farrar, Straus and Giroux, New York, 1997). Pirtûka herî baş a li ser pirsgirêka kurd bi fransî ya Chris Kutschera ye, Le défi kurde ou le rêve fou de l’indépendance (Pirsgirêka Kurd yan jî Xewneke Dînan ya Serxwebûnê), Bayard, Paris, 1997.

(2) Bixwînê: International Crisis Group: “Irak and the Kurds : Trouble Along the Trigger Line (İraq û Kurd: li dora Trigger Line pirsgirêk)”, Bruksel, Tîrmeha 2009’an; http://www.crisisgroup.org/

(3) Binêre li, Human Rights Watch, Iraq’s Crime of Genocide: the Anfal Campaign against the Kurds (Gunehê İraq’ê Qirkirin: Li dijî kurdan êrîşa Enfal”ê), New Haven, Yale University Press, 1995.

(4) Binêre li, International Crisis Group, “Iraq and the Kurds: Resolving the Kirkuk Crisis (İraq û Kurd: Çareserkirina Krîza Kerkûk’ê”, Bruksel, Nîsana 2007’an; http://www.crisisgroup.org/

LI AMERÎKA GIRTÎGEHA EWLEKARIYÊ

Wargeha bêmafan

JÉRÉMIE DROY*

Special Commitment Center (SCC), navendeke girtina ewlekariyê ya Eyaleta Washington'ê (DYA) ye ku li ser Girava McNeil'ê, li nêzîkî Takoma'yê ye ku ew jî ji rêya Seattle'yê saet û nîvek e. Ji bo çûyina navendê, divê mirov bi ferîbota ku birêvebiriya girtigehê daye biçe giravê û ji wira jî, bi otobusekê bigihîje kompleksa ku ji bo asêkirina "dirindeyên seksuel" hatiye avakirin. Ev kes, piştî kişandina cezayê ku li wan hatiye birrîn, ji ber ku ji bo serbestberdanê zêde xeternak hatine dîtin li vira tên bicîhkirin.

Avakirina vê navendê weke reaksiyonekê li pey bûyereke trajîk pêk hat. Sala 1989'an, sûcdarekî dubarekir yê bi navê Earl Shriner, digel ku dabû zanîn ku ew ê dîsa sûcan li ser zarokan pêk bîne, serbest hate berdan û bi dû re, tecawuzî zarokekî 11 salî kir û ew brîndar jî kir. Komîsyeneke ku li ser daxwaza waliyê eyaletê hate avakirin, qelsiyên sîstemê destnîşan kirin: Rejîma cezayan ya nû ku ji sala 1981'ê ve ye ku ketiye şûna ya kevn ku bi xêra wê dema cezayan dikarîbû bihata guhertin êdî wê derfetê nade ku dema serbestkirina girtiyan li gora işaretên rehabilîtasyona wan were guhertin. Şandina girtiyên ku tevgerên wan xeternak in ya ber bi nexweşxaneyan ve jî êdî nikare were bikaranîn ji ber ku him gellek nimûyên wê pêk hatine û him jî, ji dema nefermîkirina nexweşxaneyan ya salên 1970'î (1) ve pîvanên ketina nexweşxaneyên psîkiyatrîk (2) jî gellekî hatiye dijwarkirin.

Hingê rêyeke sêyem hate hilbijartin û ew jî navendeke girtî ya çareseriyê bû. Ev fikir zû bi zû li eyaletên din jî belav bû û nuha li bîst eyaletan navendên girtinên ji ber ewlekariyê hene. Herçend ev têgihiştin ji binî ve li kesên ku behsa wan dibe xwedî derdikeve jî, ev tedbîr berî hertiştî tedbîrên li hember wan kesan in û bi awayê fermî jî tedbîrine weha ne ku nakevin nava şiklê cezakirinan. Biryareke Dadgeha Bilind jî di sala 1996'an de li ser van navendan hate dayin û piştgiriya vê nirxandinê dike. Dadgerê konservator Clarence Thomas di nava sedemên biryara xwe de dida zanîn ku girtina wan ne li dijî destûra bingehîn e, lewre ew ne cezayekî duyem e, lê belê ew tedbîreke weha ye ku dikare bê pejirandin (Kansas v. Hendricks). Navendên girtî bi vî awayî dibin cihên binçaviya girtiyan ku ji qeydkirina wan heta girtîbûna wan ya daîmî dibin dewama girtîxaneyan.

Sala 2009'an, li SCC'ê, li beşê wê yê girtî, du sed û heftê û şeş kes diman. Nozdeh kesên din jî hebûn ku li beşekî piçekî serbesttir diman û neh ji wan kesan jî li du navendên nîv-vekirî hatibûn belavkirin. Ji cerga ku qanûna li ser sûcên seksuel derketiye, bi tenê kesek ji bin nîrê çavdêriya bilind û astengên din serbest hatiye berdan. Gellek ji wan ku kal bûbûn li navendê an jî li nexweşxaneya nêzîk mirine. Mayina demeke dirêj ya van "niştecîhan" ya li navenda girtî, êdî dibe sedema nebûna cihî. Ji ber wê, berfirehkirina navendê di nava bernameyê de ye. Lê, heta ku bûyereke mezin dîsa pêk neyê û nekeve rojevê, fînansmana wê ne hêsan e.

Lewre, dezgehên bi vî rengî gellekî buha ne. Butçe ya SCC'ê ya salane dike 50 milyon dolar, yanî, serê şexsekî, salê 171 hezar dolar li navenda ku lê dimîne tê xerckirin ku li navendên nîv-vekirî dibe 399 hezar dolar. Zêdebûna hejmara girtiyan û mecbûriyetên terapotîk dê fatoreyê girantir bikin. Ji xwe ji bo ku hêla wê ya ku dişibe "girtîxaneyan", ku ji aliyê dadgehan ve dihat rexnekirin, were veşartin, gellek mesref hatibûn kirin.

SCC dezgeheke weha ye ku gellek beşên wê yên jiyanê hene û di nava wan de gîha û baxçe hene; bernameya çandiniyê yek ji serbilindiyên vê dezgehê ye. Her avahiyek, navê darekê lê hatiye kirin. Hin pano jî hene ku didin zanîn ku gerek mirov xwarinê nede cerdonên ku li ser giravê gellek in. Lê belê kirasê kubariya ku ji derve xuya dibe, nikare xwe li betonan û deriyên otomatîk ragire. Ev der rast û durust girtîgehek e.

Beşên jiyanê li gora astên ewlekariyê hatine diyarkirin. Beşê Gingko, weke nimûne, cihê berxwedêrên tedawiyê ye, yanî, ji qewla Mark Davis'ê yek ji berpirsên navendê, "mêrikên ku bi hêrs in û baweriya xwe bi terapiyê naynin." Beşê Sequoias cihê kesên ku ziyana wan nagihije kesî û li dijî tedawiyê dernakevin : ji ber wê, destûra wan heye ku bigerrin û di nava beşan de biçin û bên. Beşê A cihê "xerabtirînên xerabtirînan" e, ewqasî xerab e ku navê dara wê jî hatiye jibîrkirin. Girtiyên vî beşî bi tûndrewiya xwe tên naskirin û pirraniya dema xwe li odeka xwe li pişt hesinan û girtî derbas dikin û bi tenê destûra bikaranîna kêm alavên navendê ji bo wan heye.

Laboratûwareke analîza dermanî ya ku li dermanxaneya wê hatiye bicihkirin karê tespîtkirina esrarê dike. Komeke îstixbaratê dide pey alavên qedexe ku dikarin bikevin hindur. Bi taybetî govarên pornografîk, lê herweha katalogên kincên jinan jî û bi giştî hemû wêneyên ku jin û zarok di wan de xuya dibin, dikarin ji bo armancên erotîk bên bikaranîn.

Girtiyekî navendê wiha dibêje; "Ez ne ji bo kişandina cezayekî li vira me, ez ne mehkûm im. Lê belê, fikra ku herroj bi min didin hîskirin mehkûmiyet e. Tedawiyê bi xwe jî weke cezayekî kollektîf li ser me ferz dikin." Li vê navenda di navbera girtîgeh û nexweşxaneyê de, atmosfera ewlekarî û cezakirinê dibe sedema şerrên daîmî. Ji cerga ku hatine avakirin, li dijî bi dehan navendên girtinê doz li hember dadgehên federal hatine vekirin ku êdî hin eyaletan ji bo kêmkirina mesrefên hiqûqî, li navendan dezgehên navbênçîtiyê û hiqûqê dane bicihkirin, lewre mesrefên dadgehan carinan gellekî bilind dibûn.

Navnokiyên li ser navendê, bêtir li derdora pirsa terapiyê kom dibin. Her tiştê navendê li gora tedawiyê hatiye binavkirin: heta dijayetiya li zagonên navendê bi xwe jî ne weke sûc, lê belê weke mijareke "raporên birêvebiriya rabûn û rûniştinê" tê hesibandin. Lê belê, di bingeha dezgehê de ew fikir heye ku girtiyên wê nexweşên seksê yên bê tedawî ne. Ji derveyî rehabilîtasyonê ne: ew ne "nexweş" in, lê belê "canawar" in.

Anormalbûn ji bo hatina navendê pîvana sereke ye. Li Eyaleta Washington'ê, heçî kesên ku ji ber sûcên seksuel hatibin girtin û ceza li wan hatibe birrîn, ji bo diyarkirina xeternakbûnê û serbestberdanê derdikevin hember lijneyekê. Hiqûqnaseke ji buroya Attorney General (Dozgerê sereke) ya eyaletê ku bi birêvebiriya van karan re alaqedar dibe, bi me dide zanîn ku "Divê were îspatkirin ku kesê girtî ji hişê xwe ve derb xwariye û ew xeternak e û îhtimaleke mezin tê de heye ku sûcê xwe dubare bike." Di pey re, balê dikişîne ser ku, "raporên (pisporan) yên li ser wan li gora îstatîstîkên zanistî hatine amadekirin." Li gora metodên ku di vî warî de rêjeya rîskan dihesibînin, kesên ku êrîşên xwe dibin ser kesên ku nas nakin, dikevin nava kesên ku îhtîmala dubarekirina sûcî li cem wan herî zêde ye.

Kesên ku lêkolîna wan ya psîkiyatrîk bal kişandiye ser anormaliyeke di hişê wan de dibin pêşiya lijneyê ku ji dadgeh û jûriya xelkê ve pêk tê. Her tişt li gora dozeke cezakirinê pêk tê, lê belê behsa bûyerên bûyî tê de nabe. Lijne bi tenê îhtimala xeternakiyê diyar dike û li ser tedbîrên ku dikarin bên girtin disekine.

Psîkiyart û birêvebirê SCC'ê, doktor Henry Richard di wê baweriyê de ye ku bi rastî jî beşekî sûcdaran heye ku ji binî ve xeternak in û dikarin sûcên xwe dubare bikin û ev beşê sûcdaran dikare bi rêya lêkolîneke psîkiyatrîk were naskirin ku semptom û diyardeyên rewşa wan dikare li cem kesên ku bêhawebûyinên seksuel (parafîlî) û pirsgirêkên şexsiyetê jî li cem wan hene (weke mînak, antîsosyal û narsîsîk) were dîtin. Ew bawer dike ku bi tenê beşekî sûcdarên seksuel dikevin nava vê mijarê –lewre sûcdarên vî celebî li gora sûcên ku bi kiryarine din ve têkildar, îhtimala dubarekirina wan hindiktir e- û mirov dikare bi rêya testên psîkiyatrîk yên li gora rewşa wan vî beşê hindik yê xeternak ku di nava wan de ye gbi hêsanî nas bike. Ew dibêje ku; "Ev, ew kes in ku li cem wan tevliheviyên tûn hene. Parek ji sê parên wan pîskopat in. Ew, kesine tûndrew in, ne mîna sûcdarên ji rêzê ne."

Di heman demê de, ev kesên ku behsa wan dibe, mirov nikare bi temamî bibêje ku nexweşên hişî ne, lewre dikarin bên tedawîkirin – ji ber wê ye ku ew nakevin nexweşxaneya psîkiyatrîk. Gava ku ji warê tedawiyê derdikevin, ew dikevin warê cinawiriyê, yanî dibin "dirindeyên seksuel."

Gellek nivîskaran behsa "panîka axlaqî" kir ku Amerîka ji binî ve da ber xwe. Sala 2007'an, New York Times'ê bîlançoyeke ecêb derxist holê: Piştgirên wan navendên girtî weke çareseriyeke mûcîzeyî dinirxînin, lê belê van navendan tu encamên berbiçav bi dest nexistine. Heta nuha kesekî nikariye bibêje sîstemeke ewqasî buha di warê terapiyê de bi kêrî çi tê, digel ku hefteyê bi tenê çend saetan dide terapiyê, û çi feydeya wê heye ku kesên ku gellekî kal bûne û êdî tiştek ji wan nayê di navendan de girtî bimînin, û tew di sîstemeke weha de carinan pîvanên ecêb datîne ber xwe (3) .

Eric Janus'ê ku xwediyê berhemeke li ser vê pirsgirêkê ye (4) , di wê baweriyê de ye ku têgeha dirindeyên seksuel balê ji ser şîddeta dezgehî dide alî (şîddeta seksuel weke bûyer ji aliyê dezgehên civakî û çandî ve tê peydakirin) û dikişîne ser şîddeta şexsî (şîddeta seksuel weke diyardeya anormaliyeke kesan e û ya perversîteyeke bêtedawî). Ev tedbîr di eslê xwe de bi tenê ji bo rewşa hin sûcên ku hejmara wan gellekî kêm e tê tedbîqkirin û şîddeta seksuel ya herî berbiçav ku jinan, zarokan û nasan dide ber xwe ne di navê de ye – lê, tedbîrên rêlibergir dikare bêtir li gora şîddeta bi vî rengî were bikaranîn.

Berhemandar destnîşan dike ku, herçend bi xêra tevgerên femînîst ve bal bi giştî bêtir ket ser şîddeta seksuel jî, ya ku di navenda siyaseta têkoşîna van

* Sosyolog



Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

”dirindeyên seksuel” ya nû de ye jî ew reaksiyona kevneperest e ku jî li dijî van tevgeran pêk hatiye. Li derveyî tercîheke maqûl, ev tedbîrên girtina xelkê di eslê xwe de bi pîvan û nirxên îdeolojiyeke weha hatine sazkirin ku ji nirxên civaka konservatoran tên.

Tedbîr û dezgehên taybetî yên bi vî rengî ne bi tercîhên li ser kêrhatîbûna wan û hesabekî aqilane yê mesref û kara wan hatine sazkirin, lê belê li ser hesabê axlaqî yê felaketê ava bûne: bûyera ku dixwazin rêyê li ber bigirin û tedbîran wê deynin ewqasî xerab e ku mesrefa zêde ku ji bo wê tê dayin û avakirina van dezgehên ku Janus ji wan re dibêje ”warê mafên bisînorkirî” mafdar dike.

Bi vî awayî, heger prosedura girtinê deştnîşan dike ku, bi awayê teorîk, dozger divê delîlên xwe nîşan bide û bide zanîn ku ew kes xetereyeke ciddî ye û îhtîmaleke xurt heye ku sûcê xwe dubare bike, bi awayêkî pratîk, divê sûcên ku ew ji bo wan hatibû girtin (û wî cezayên wan kişandiye) têrî îspatkirina xeternakbûyina wî bikin. Piştî ku biryara girtina daîmî hat dayin jî, divê salê carekê rewşa wî ji nû ve were nirxandin da ku bizanin gelo hê jî rîska xeteriyê tê de heye an ne. Lê, di eslê xwe de, heger tu sedem nîn bin ku em bawer bikin ku sûcdarekî seksuel êdî guheriye, hingê tê wateya ku ew tim xeternak e. Birêvebirê SCC’ê, Doktor Richards, dide zanîn ku ”nîştecîhên vira di dema tedawiyê de çi bikin jî, pêşeroja wan tim derdikeve pêşberî wan.”

Li gora piştgirê mafên girtiyan yê navenda SCC’ê, William Bailey, bi heman fikrê, ”biryara şandina wan ya vê navendê di heman demê de tê wateya ku divê ew ji vira dernekevin” û dibêje ku tedawî, di eslê xwe de bi tenê formalîteyeke weha ye ku ji bo aşkirina dadgehan e. Dezgeh karê xwe dike, bi awayekî pratîk, ji dêleva prensîbên terapotîk, bêtir li gora prensîbên dîsîplînê tev digerre. Baile’yê ku berê karkerekî karên civakî bû, di wê baweriyê de ye ku bi tenê beşekî piçûk ji van girtiyan dê nikaribe di nava civatê de bijî. Ji bo yên din jî, tedbîrên girtinê û yên ewlekariyê ku tên pêkanîn zêde ne û çareseriyên piçekî sisttir, yên weke binçaviya li derdora nîv-vekirî divê ji bo wan bêtir were bikaranîn: ”Di eslê xwe de, qanûn dibêje ku şexs azadiya xwe wenda dike, lê mafên wî dimînin. Lê gava ku hûn bala xwe bidin dezgehê, hûn ê bibînin ku girtiyan li vira hemû mafên xwe wenda kirine.”

Gava ku prensîba tedbîran pêwîst dike ku mirov li senaryoya herî xerab bifikire, ev pirsgirêka dengeya di navbera azadî û ewlekariyê de jî hingê ji binî ve hessastir dibe. Heger xerabiya bûyerên ku mirov dixwaze rêyê li ber bigire mirov mecbûrî tedbîrên radîkal dike, divê mirov ji derveyî heyecana xwe tev bigerre û lê binere ka gelo tedbîrên me bi rastî jî dikarin rêyê li ber sûcan bigirin an ne, û ji hêleke din ve jî, ka gelo bi awayekî axlaqî ve jî û siyasî ve jî, ji bo hemwelatiyên ku di nava van herdu rêyên ku nikarin bên ba hevdu de asê mane, mirov dikare qebûl bike ku deverên îstîsnaî bên avakirin an ne.

Werger ji fransî
Îbrahîm Seydo Aydoğan

(1) Kêmkirina rola rakirina nexweşxane û mesrefên dermankirinê.

(2) Pîvana fermî ya xistina nexweşxaneyeke psîkîyatrîk pêwîst dike ku were îspatkirin ku şexsê ku behsa wî dibe dikare ji nişka ve xerabîyê bigihîne xwe an jî kesine din.

3) Di nava rêzegotarên xwe yên ku di navbera 4-6 Adara 2007’an de hatin weşandin, tam wê dema ku Eyaleta New York’ê li ser dixebitî ku navendeke girtî ava bikiraya, herdu rojnameger, Monica Davey û Abby Goodnough, bale dikişîne ser ku Leroy Heinricks’ê ku bi daweya xwe ya li dijî Eyaleta Kansas’ê ya li ber Dadgeha Bilind navdar bûbû, di dema şandina xwe ya wê navendê de, kalekî 72 salî bû û ji ber nexweşîya diyabetê ve qels ketibû û bi tenê bi kursîya gindorek ve diçû û dihat.

(4) Eric Janus, Failure to Protect. America’s sexual predator laws and the rise of the preventive State, Cornell University Press, New York, 2006.

ALMANYA

Kurtedîroka qanûnê girtîgehan

GRÉGORY SALLE*

Ev qanûn dike ku huqûqzanên modernîst rêzê jêre bigirin, lewra di warê huqûqî de ew xwe disipêre prensîbeke jinûvecivakîbûnê. Ew vê prensîbê weke armanca dawî û sereke ya cezayê girtîgehê dibîne, piştî vê misogerkirina parastina kolektîvîteyê tê. Metna qanûnê sê prensîban kite bi kite rave dike ku wê qaşo guhertinên modela girtîgehan bi gewde bikira.

Piştî awiqandina dehsalan, parlementerên fransî di Cotmeha 2009'an de qanûneke girtîgehan qebûl kirin ku naveroka wê hêviya ehlê mijarê û spesyalîstan pûç kir. Lê belê, gelo em dikarin lê bifikirin ku qanûna baş a mirov bê sedem li bendê nekarîbû pirsgirêka girtîgehan çareser bike? Tecrûbeya li Almanya'yê destûrê dide ku mirov xwe ji vê îluzyona huqûqî dûr bike û vê heqîqetê bi bîr bîne: Ji pirsgirêka civakî qutbîyî û nepêwendî siyasetê ev mijar bê mane dibe.

16'ê Adara 1976'an ji bo dîroka girtîgehan a Almanya'yê dîrokeke girîng a diyarker e. Di vê demê de ji bo cara pêşî qanûneke federal (Strafvollzugsgesetz "qanûna pêkanîna cezayê") hat qebûlkirin. Ev qanûn kete şûna qaîdeyên herêmî û peymanên di navbera herêman de yên heyî. Nebûna huqûqeke hêjayî navê xwe, heta bi çavên huqûqzanên muhafezekar jî weke nabe were qebûlkirin, xuya dikir. Ji dema projeyên pêknehatî yên Komara Weimar û heta ji dema ku qanûna ceza ya împeratoriyê sala 1871'ê derketî û vir ve, mirov nebûna qanûneke bi vî rengî heyf dibînin. Mecbûrbûn û bêgaviya çêkirina guhertinan rastî di sîstema girtîgehan de gelekî acîl û lezgîn in. Lewra protestoyên civakî yên "salên 68'an" rexneyeke îşaret bi kevinbûn û dîktatoriya saziyên zordar ji nû ve derxist holê. Ev rexne bêrûmetiya veşartî ya şert û mercên girtîgehan ronî dike (1).

Vê reforma global bandora ne bisihet a girtîbûnê qebûl dikir û sê armancên wê hebûn. Pêşî di warê hejmaran de: Kêmkirina para cezayê girtîgehê di nava tevahiyan cezayan de, encama vê cezayên ku azadiya mirov ji dest nagirin bûn (ji berdana bi şert heta bi cezayê pereyan). Paşê çawanî: Berevajî şaşiyeke bêtesîrkirin, tolhildêr û berdêla guneh pêdayînê, saziya girtîgehê veguherînin maleke jinûvecivakîbûnê. Mêyil, mîta dîrokî "girtîgeha baş" ji nû ve zindî dike. Li gorî vê mîtê, "girtîgeha baş" ne bi tenê ceza dike, belê her weha perwerde, derman û rehabîlîte dike. Armanca mekanî li gorî pirsgirêkeke kevin a federal e: Tevî parçebûna herêman, misogerkirina wekheviya pêkanîna sozên huqûqî yên dewleta huqûqê dayî.

Ev qanûn dike ku huqûqzanên modernîst rêzê jêre bigirin, lewra di warê huqûqî de ew xwe disipêre prensîbeke jinûvecivakîbûnê. Ew vê prensîbê weke armanca dawî û sereke ya cezayê girtîgehê dibîne, piştî vê misogerkirina parastina kolektîvîteyê tê. Metna qanûnê sê prensîban kite bi kite rave dike ku wê qaşo guhertinên modela girtîgehan bi gewde bikira. Prensîbeke ahengê: Şert û mercên hundir divê heta ku mumkin e li gorî yên derve werin texlîdkirin. Prensîbeke lihemberhevbûnê: Divê tesîrên gelekî xirab ên girtîgehê bixwe, (bi xebatên dijber) werin astengkirin. Prensîbeke întegrasyonê: Cezayê girtîgehê divê mêyila wê ber bi dawiyeke nû ve be, ji nû ve endambûna civakê.

Mohra koalîsyona mezin a ji 1966 heta 1969'an a di navbera Xirîstiyanên Demokrat (CDU) û Sosyal Demokratan (SPD) de li ser vê hewldana başkirinê heye. Bi awirê humanîzma lîberal, naveroka wê ya dawiyê bi awayekî zelal ji qanûna Fransa ya sê dehsalan paşê pêşketîtir e. Û ev jî tevî ku bi qanûna Fransa re ev sererastkirin hene: Pêkanîna saziyên ji wan re tê gotin 'vekirî' yan jî 'nîv-vekirî' yên ku xisleta wan sistkirina nîzama girtîgehan e û avakirina binesaziyên sosyo-terapiyê, personelê pispor ê ku bi hejmareke kêmkirî ya girtiyên weke nexweşan tên dîtin re eleqedar dibin.

Di qanûnê de dîsa jî têra xwe deverên tarî û şêlo hene. Ya destpêkê jî ev tibîkirina ceza ye ku rê li ber weke nexweşî dîtina jirêderketineke civakî vedike (2). Ev qanûn wekî din qada pêkanîna girtina demî û qanûna ceza ya zarokan jî nagire nav xwe, her du jî bi pîvanên kevin û cihê nîqaşan in, tên birêvebirin. Heqdestê karê girtîgeyan, ku huqûqî ferz e, bi qasî kenê mirovan pê were kêm e (li derdora ji sedî 5'ê budçeyê herî kêm!).

Bi tenê li gorî deqên huquqî, Strafvollzugsgesetz weke yek ji qanûnên herî pêşverû yên hatî qebûlkirin xuya dikir. Xirîstiyanên Demokrat ne şaş bûn. Ji nîvê salên 1980'î û şûn ve mêyla wan heye li destketiyên misogerkirî vegerin, poşman bibin û dengê slogana ewlekariyê bilind bikin.

Îroniyeke ducarî ya ku reng dayî beridandina vê dawiyê ya huqûqa girtîgehan a Almanya'yê heye. Li aliyekî koalîsyona mezin bû ku di qada neteweyî de ji 2004'an heta bi 2009'an bi xasûkiyeke xirab a dîrokê, tişta ew kirî pêşeng, têk bir. Li aliyê din bi awirekî liberhevgirtinê, pêvajoya pêkhatina wê berevajiyî ya mirov li Fransa'yê çavdêriya wê dike, ye. Hêza dike ev pêvajo bibe jî hewldaneke yekkirina huqûqî ye. Ji dema reforma federalizmê ya sala 2006'an û vir ve, qanûna 1976'an êdî referansa herî jor a şert û mercên girtîgehan nîne. Vê reformê hêza qanûnçêkirinê ya derbarê mijarê de ji nû ve bi herêman (Länder) re parve kir; jixwe erka pêkanîna pîvanan li ser milên herêman bû.

Ji hingî ve rewşa huqûqî netîpîk e û tevlîhev e. Li pirraniya herêman qanûnên federal di meriyetê de ne, lê sê Länder'an, yên din jî wê li wan zêde bibin, ji niha ve huqûqa xwe bi xwe çêkirin. Vê biryara siyasî zora muxalefeteke gelekî mezin a alema girtîgehan bir. Ji konfederasyona sendikayan heta bi komaleyên parastina mafên girtiyan, ji rêxistînên pîşeyî heta bi gelek dadgerên ceza, bereyeke fereh dijberiya xwe ya bi vê reforma paşverû da zanîn û mana serweriya qanûna federal parastin. Li dijî sozên hukûmetê yên pesnê wekehevkirineke durist û danûstandina "pêkanînên baş" a di navbera herêman de da, wan pêş dît ku wê şert û mercên li girtîgehan xirabtir bibin. Sedemên vê jî ev in: hevrikiyeke bêxêr a ku bi kêrî refleksên cezayî tê, zêdebûna newekheviyên mekan, erozyoneke zêde ya îdeala jinûvecivakîkirinê û kêmkirina butçeyê ya ku dikare zirarê li tedbîrên derfetên civakî bike.

Rexne weha dinirxînin; rewşeke bi vî rengî tevî tiştên din (misêwa berferehkirina hêza polîsiye) bingeh û Prensîbên dewleta huqûqê dixin tehlûkê. Xirabbûna rewşa di nava dîwaran de (intra-muros) ya rastî weke argumaneke çêkirî bi kêra alîgirên taybetîkirina qada girtîgehan tê.

Hin xirîstiyanên demokrat hevgirtina di navbera muhafezekariya qada ceza (ku xwe herî eşkere bi xwedîderketina li "awayê bi şid" beramberî zarokan tîne ziman) û neo-lîberalîzma îdarî de bi gewde dikin. Di nava van de ev kes hene: Rêveberê berê yê supermarketê Wolfgang Bosbach ê parlemanter û heta beriya demeke kurt alîkarê serokê koma parlemanterên muhafezekar li parlemana federal (Bundestag); Kevne Wezîrê Dadê yê Eyaleta Hessen'ê Christean Wagner ê ku ji bo kesên demeke dirêj e bêkar in "bîne ser riya rast" pêşniyar dike bazinên elektronîk werin bikaranîn...

Li gelek eyaletan (bi taybetî li Bavyera, Hessen û Baden Wurtenberg'ê) walî êdî xwe jê venadin ku nirxê kêrhatina berdêpêldayînê ya cezayê girtîgehê ji nû ve zêde bikin, di heman demê de bi hedefa jinûvecivakîkirinê jî baweriyê nahêlin, wê bi daneyên guhertina pêkhatina girtiyan, weke neewle heta xeyalî nîşan didin (ji nû ve derketina holê ya mijara kesên nayên ser riya rast). Serokê hukûmeta eyaletê Roland Koch, Wagner bi wî awayî wezîfedar kiribû ku rejîma girtîgehan a herî dijwar a welêt pêkbîne (3). Ev enflasyona retorîk ya ku ji nîvê salên 1990'î ve, ne bi tenê di hevrikiya hilbijartinan de girîngiyeke stratejîk e. Pêre jî serwerbûna pratîkên ewlekariyê di rewşa girtîgehan de hene. Ji nû ve derketinaholê û berferehbûna ji ber sedemên ewlekariyê girtinan (li gotara Jérémie Droy binêre) û li derve kêmbûna saziyên ceza - carinan gelekî zêde – nîşanên vê yên berçav in. Bi awayekî giştî, gelek çavdêr şahidiyê li xirabtirbûna şaşiyên strukturel dikin: Girtî her diçe bêhtir ji çavkaniyên sereke bêpar tên hiştin, pêşketineke nekontrolkirî ya fonksiyona nexweşxaneya girtîgehan, zê-

** Lêkolînerê Navenda Lêkolînên Zanistî ya Neteweyî li Fransa'yê (CNRS). Nivîskarê La part d'ombre de l'Etat de droit. La question carcérale en France et en RFA depuis 1968 (Aliyê Tarî yê Dewleta Huqûqê. Pirsgirêka Girtîgehan a Fransa û Komara Federal a Almanya'yê ji 1968'an û vir ve), Weşanên EHESS, Parîs, 2009.*

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

debûna tansiyona di nava dîwaran de (li girtîgehan) û hwd. Pirsgirêka xwekuştinan û eşkerekirina hovîtiyên carinan kujer, van demên dawiyên bûn rojev.

Ji yekkirinê û vir ve dengê rexneyên li xirabbûna rewşa girtiyan û girtîgehan her diçe bilind dibe. Di nava van rexneyan de yên çepgirên huqûqzan jî hene. Heta kovara heftane ya nerm Die Zeit jî bi awayekî birêkûpêk cih dide dengvedana rewşeke kambax. Kovar rewşê dişibîne vegera dema beriya reforman. Ji ber nemana newekheviyên siyasî ev veger hêsan bû; ev newekhevî berê girêdayî girîngiyên wan bûn û êdî di nava pêşxistina lihevkirina li ser ewlekariya hundir de hev berdane. Ji ber destnîşankirina hişkbûneke ceza ya her diçe zêde dibe ku muhafezakariya dadgeriyê û demagojiya siyasî wê xurt dike, kovar fıkaran dike ku cezakirina bûyerên ji riya civakê derketî hişktir bibe û her weha ditirse ew neçar be serî li girtîgehên buha û bêmane bide.

Tevahiya mêyila cezakirinê tê jêpirsîn û nexasim jî kêmkirina mafê liberrabûna cezayê girtîgehê. Komara Federal a Almanya'yê her weha bernameya herî berfereh a dîroka xwe ya avakirina girtîgehan dest pê kir. Ev jî bi nakokiyan xwe dide der: Li Saksonya ya Jêr wezîrekî dadê yê muhafezekar biryar da ku deh girtîgehan bigire û yên li ber rabûn jî sosyal demokrat bûn! Perdeya vê sirê di demeke kurt de ji ser hat hilanîn: Girtîgeheke mezin wê sala 2012'an biketa şûna girtîgehên piçûk (4). Erê îzdîhama di girtîgehan de weke ya li Fransa'yê ne zêde û kronîk e, tevî zêdebûna ji dema yekbûna herdû Almanya'yan ve enflasyona girtîgehan sînordarkirî ye, dîsa jî girîngiya sînordarkirina bi girtîgehê cezakirinê yê civak dikare qebûl bike, êdî bêyî ponijîna li ser tevahiya nîzama ceza, nayê pirsîn.

Lewra ji dezgehên huqûqî nayê bersivê bidin pirsgirêka girtîgehan, nexasim eger bi awayeki lihevçêkirî ji pirsgirêka civakî were qutkirin û ji maneya xwe ya siyasî jî were kirin. Kêm xuyakirina xizaniyê di nîqaşên raya giştî ya Alman de bi kêrî vê nêrîna tengkirî tê ya ku li ser valatiya di navbera qaîde û rastiyê de avabûye (5). Eger hem pêşketina çînên civakî û hem jî şêweyên neqandina nîzama ceza li ber çavan negire, tehlûke heye ku gengeşeyên huqûqî pûç û bêmane bimînin (6) . Eleqeya pirsgirêka girtîgehan çiqasî bi reformên Hartz'ê hebe ewqasî jî bi veguherîna huqûqî heye. Reformên Hartz'ê (2003-2005) di bin navê "nermkirina" bazara kar de parastinên civakî ji holê rakirin û xizaniya çîna karker bi saziyan qanûnî kirin. Maneya wê ev e ku em nikarin vê neheqiyê nebînin: Kî dikeve girtîgehê û çima? Bi taybetî jî şêweyên hemdem yên rêveberina jihevcihêkirina newekheviyan a ku Foucault berê kiribû navenda analîza xwe çi ne? Di Çileyê 2007'an rêveberê berê yê Volkswagen'ê Peter Hartz, îdeologê reformên bi heman navî, ji ber skandaleke mezin a bertilxwarinê hat cezakirin. Ew dîsa jî ji cezayê girtina di girtîgehê de xilas bû.

Werger ji fransî
Lokman Turgut

(1) Jörg Requate, Der Kampf um die Demokratisierung der Justiz. Richter, Politik und Öffentlichkeit in der Bundesrepublik (Şerê ji bo demokratîkbûyîna huqûqê. Dadger, siyaset û raya giştî li Komara Federal), Campus, Frankfurt am Main, 2008.

(2) Li ber bigire, Michel Foucault, Dits et Écrits (yên gotî û yên nivîsî), berg II, Gallimard, Parîs, 2001, rûpel 1513.

(3) Peter Scherer ji devê wî daye: "Hessen fordert Wende zu mehr Härte beim Strafvollzug", welt.de, 25'ê Sibata 2003'an.

(4) Michael Quasthoff, "Busemann schließt kleine Knäste (Busemann girtîgehên piçûk digire)", taz.de, 9'ê Tebaxa 2009'an.

(5) Louis Chauvel, Franz Schultheis, "Le sens d'une dénégation: l'oubli des classes sociales en Allemagne et en France (Maneya înkarekê: Jibîrkirina çînên civakî li Almanya û Fransa'yê", Mouvements, hejmar 26, Parîs, 2003.

(6) Bixwine, Loic Wacquant, "Fermons les prisons ! (Girtîgehan bigirin!)", Le Monde diplomatique, Îlona 2004'an.

JAMES BOND'ÊN ÎNGILÎZ

Di navbera tarî û roniyê de MI5

JEAN-CLAUDE SERGEANT*

Kêmasiya herî mezin a Rêxistina Saloxdariyê ku hem Andrew û hem jî nivîskarên Spooks'ê derdixin pêş ew e ku rêxistinê dereng berê awirên xwe da xetera îslamîst. Tevî ku rêxistin di 2004'an de bawerî pêanîbû ku çalakiyeke terorîst li Brîtanya'yê tê plankirin, li gorî wan seferberiyeke zûtir mumkin bû derfet bida pêşîgirtina li êrîşên sala 2005'an yên li London'ê.

Rêxistina Saloxdariyê ya Brîtanya'yê –Security Service ku bêhtir navê wê weke MI5 tê hildan – ya ku ji ewlekariya hundir berpirsiyar e, dibêjin heta dawiya salên 1980'î bi tenê yek hebûna wê ya ferazî hebû ku berdariya çalakiya wê bi şertan ve girêdida. Bihêzbûna mecbûryetên şefafiyê kirin ku ev rêxistin ji zemînê veşartî, cihê ku çalakiyên xwe lê pêk tîne derkeve. Heta wê radeyê ku Rêveberê Giştî Jonathan Evans 12'ê Sibat'ê bawer kir ku ew neçar e nivîseke parastinê di quncikên Daily Telegraph'ê de biweşîne: "Me ti carî bi muameleya xerab mirov ceza nekirin û me ti carî êşkence bi kar neanî, bi heman rengî bi ewayê neyekser jî em beşdarî nebûn yan jî me cesaret neda ti kesî ku li ser navê me êşkenceyê bikin."

Du rojan beriya wê sê dadgeran der barê liberrabûna etiyopiyê bi navê Binyam Mohammed de biryar da. Binyam Mohammed li Brîtanya'yê dimîne, sala 2002'an li Pakîstan'ê hat girtin û li gelek girtîgehên Afganîstan'ê û Fas'ê êşkence lê hat kirin û paşê jî li Guantanamo'yê girtî ma. Central Intelligence Agency (CIA) MI5 der barê girtina wî de agahdar kir. MI5'ê jî ajanekî xwe wezîfedar kir da ku beşdarî jêpirsînekê bibe; wî nedikarî rêbazên ku hempîşeyî bi kar anîn înkar bike.

Ev bûyera skandal bû bela serê rêxistina îstîxbarata hundir. Hê nû salek di ser pîrozbahiya sedsaliya damezrandina wê re derbas bûbû û bi rasthatina sedsaliya damezrandina wê du berhemên berg-stûr hatibûn weşandin (1). Yek jê ji aliyê zanyarê zanîngehê yê navdar Christopher Andrew ve hat nivîsîn. Ev berhem xwe weke dîroka fermî dide nasîn, bi vî awayî dikarîbû heta radeyeke pirr berfereh bigihêje arşîvan û pêşgotina wê jî ji aliyê rêveberê giştî yê niha ve hatiye nivîsîn. Ya diduyan encama hevkariya du dîroknasên ciwan e. Navê vê berhemê Spooks (ajan) e û biyografiyeke "destûr nedayî" ya heman rêxistinê pêşniyar dike û ev jî şertekî pêş ê ji bo azadiyeke berferehtir a nivîsînê ye. Lê belê kêmasiya wê dimîne, bi tenê dikare bi awayekî sînordarkirî bigihêje çavkaniyên beriya salên 1960'î.

Andrew kite bi kite pêşketina rêxistineke ku demeke dirêj bi serê xwe bû û wezîfeyên wê, dişopîne. Ji 1909'an heta bi dawiya şerê cîhanê yê yekemîn para bêhtir wezîfeya wê dij-sîxurtî bû, paşê berê xwe da kontrolkirina çalakiyên ji bo dewletê tehlûke – ango çalakiyên pêwendî bandora komunîst – beriya ku ji nû ve di dema şerê cîhanê yê duyemîn de wezîfeya bike karê dijberî sîxuriyê.

Ji 1945'an û pê ve karê wê yê li pêş ew bû ku li dijî ji aliyê sîxurên Rojhilat ve bi dizî bicihkirina siyasetvanan şer bike; paşê rêveberên sendîkayên sereke jî ketin nava çarçoveya vî şerî. Di şerê dijberî terorîzmê de, pêşî berê awirên xwe zîvirandin ser çalakiyên Artêşa Komarxwaz a Îrlandî ya demî (PIRA) yên li Îrlanda ya Bakur û li ser erdên neteweyê (2) , paşê derengtir jî berê awiren xwe zîvirand ser tevgera îslamî. Piştre jî di vî şerî de piraniya derfetên rêxistinê bikaranîn.

Di fermiyetê de li gorî fermana wezîrê karê hundir tevdigere, ji Clement Attlee (yê ku piştî Winston Churchill di sala 1945'an de bû serokwezîr) bigre, serokwezîrên cihê jî serî li alîkariya rêxistinê dan. Em ta bi derziye ve bikin, di demên ku çalakiyên sendîkal xurt bûyî de, ango ji greva deryavanan a sala 1966'an heta bi ya karkerên kanan a sala 1984'an. Di destpêka salên 1980'î de gelek endamên rêxistina Campaign for Nuclear Disarmament (Kampanya ya ji bo Bêçekkirina Nukleer) tevî ku ti delîl nebû xisletê wan ê dijberî dewletê piştrast bike, hatin şopandin û guhdarîkirin. Tevî ku rêveberên giştî yên rêxistina saloxdariyê li ber vê yekê rabûn jî rêxistinê destûr da ku were bikaranîn.

Sala 1952'an fermaneke Wezîrê Karê Hundir Maxwell Fyfe rêxistin wezîfedar kir ku çalakiyên bi alîkariya ji derve yan jî bêyî alîkariya ji derve, yên kes û rêxistinên xisleta wan dijberî dewletê ye, bişopîne û bi vî karî re eleqedar bibe. Rêxistinê bi xwe weha nirxand ku milîtantiya karker a ku welat di dema "Winter of discontent" (Zivistana nerazîbûnê) a salên 1978 û 1979'an de tevizandibû, dijberî dewletê nîne û kontrolkirina "rêveberan" ne erk û wezî-feya wê ye. Lê belê dîsa jî li avahiya navendî ya Partiya Komunîst a li London'ê mîkrofon bi cih kirin û bi xêra van mîkrofonan MI5'ê danûstendinên di navbera berpirsiyarên partiyê û rêveberên sendîkayên girêdayî yan jî nêzî partiya komunîst de şopandin, di nava van de rêveberê sendîkaya karkerên kanan (NUM) Arthur Scargill jî hebû û haya wî ji van mîkrofonan hebû.

Li gorî Andrew Scargill ev guhdarîkirinên ku wezîrê karê hundir bi awayekî birêkûpêk destûra wan dida, bi tenê ji bo rêveberên komunîst û troçkîst bû (3), ji bo demokrasiya parlemanter weke xeterekê didîtin. Andrew, hîpoteza dibêje, MI5 beşadarî şopandina komên karkerên di grevê de bûye, derew derdixe. Li gorî Andrew piraniya xebatên rêxistinê bi wezîfeya kontrolkirina milîtanên têkildarî rêxistinên weke dijberî dewletê hatine tesnîfkirin, sînordarkirî ye û der barê stratejiya NUM'ê de jî ji berê ve hukûmet agahdar kiriye.

Ev dîroka fermî heqê serketinên operasyonên rêxistinên yên di dema du şerên sedsala 20'an de dide, her weha lawaziyên saziyê jî ji bîr nake. Ji MI5'ê nehat ku pêbihise ku "Kluba Pêncan" ya ku endamên xwe ji Zanîngeha Cambridge peyde kirin di salên 1930'î de bi dizî di nav establishmenta ingilîz de bi cih bûye, berî ku dîplmat Guy Burgess û Donald MacLean sala 1951'ê derbasî aliyê bloka Rojava bibin, nêzî bîst hezar rûpel belgeyên veşartî ragihandin KGB'yê.

Sistiya pêvajoya girtina kar a mirovan, nêzîkbûna hevkariyê li vir mijarên behsa wan tê kirin in. Rêxistin namzetiyên ciwanên ji civaka baş û her weha eskerên berê tercîh dike. Heta 1997'an rêxistinê îlanên xwe ji bo girtina kar a mirovan nediweşandin. Di heman demê de qada xwe ya civakî berferehtir kir û ji nîv qaçaxbûna ku di demeke dirêj kêfa wê derxist jî derket.

Kêmasiya herî mezin a Rêxistina Saloxdariyê ku hem Andrew û hem jî nivîskarên Spooks'ê derdixin pêş ew e ku rêxistinê dereng berê awirên xwe da xetera îslamîst. Tevî ku rêxistin di 2004'an de bawerî pêanîbû ku çalakiyeke terorîst li Brîtanya'yê tê plankirin, li gorî wan seferberiyeke zûtir mumkin bû derfet bida pêşîgirtina li êrîşên 7'ê Tîrmeha 2005'an ên li London'ê yên ku di wan de pêncîhûdu kes mirin û nêzî heftsed kesî birîndar bûn. Rêveberê giştî yê Rêxistina Saloxdariyê di nameya xwe ya ji Daily Telegraph'ê re kêmasiyeke din a exlaqî qebûl dike: Baldarnebûna beramberî rêbazên emerîkiyan li dijî mirovên gumanbar ên piştî 11'ê Îlona 2001'ê hatin girtin.

Werger ji fransî
Lokman Turgut

* *Profesorê bijarte yê Zanîngeha Sorbonne (Parîs III)*

(1) Christopher Andrew, The Defence of the Realm. The Authorized History of MI5 (Parastina Qadê. Dîroka destûra wê hatî dayîn ya MI5), Allen Lane, Londres, 2009; Thomas Hennessey et Claire Thomas, Spooks. The Unofficial History of MI5 (Ajan. Dîroka Nefermî ya MI5), Amberley Publishing, Stroud, 2009.

(2) Di pirtûka bi navê Spooks de kite bi kite behsa vî aliyê xebatên MI5'ê tê kirin.

(3) Di berhema xwe ya bi navê The Enemy Within : The Secret War against the Miners (Dijminê hundir: şerê bi dizî yê li dijî karkerên kanan) de (Verso, London, 2004), Seumas Milne yeqîn dike ku tevahiya rêveberên neteweyî û herêmî, her weha beşeke mezin a sempatîzanên komunîst û troçkîst dihatin guhdarîkirin.

Detroit, Detroit û Detroit

ALLAN POPELARD & PAUL VANNIER*

Dave yê dora sîh salî, li 7 Miles Road'ê dijî wiha dipirsî: "Tu bêhn dikî? Ev bêhn tê te?" Ew der di nîveka taxên feqîr ên Detroit'ê de ye û neqebeke qederê danzdeh kîlomêtreyan fireh e. Taxa ku li nêzî Downtown'ê ye, bi balexaneyên xwe diyar e. Ew banliyoyên (taxên li derveyî an jî li qeraxa bajarî) dewlemend li qeraxên bajêr belav bûne. Li hember mala wî, aliyê din ê rêyê, pênc lodên xweliyê. Ewqas jî xanî ku heta du heyv berê jî kesine tê de dijiyan. "Duhî şevê yekî din jî hate şewitandin. Her heftî xaniyekî dîtir dibe xwelî li vê taxê. Xelk wiha dikin da ku pereyê sîgorteyê bistînin û biçin li banliyoyan bi cih bibin. Êdî tu kes naxwaze li vir bijî."

Li gettoya Detroit'ê, bajar xwe dimezêxe û hêdî hêdî ji beyn diçe. Bi tenê bi rengekî parçe parçe maye. Di hinek blokên (1) mezin de, bi tenê du an jî sê malbat mane. Lewma bajar dişibe warekî heliyayî, daqurtandî: taq û qalibên ji xweliyê, parkingên (parkên trimbêlan) terikandî û karxaneyên xalîkirî bajar veguherandine zeviyeke mezin a kêlayî. Li asoya beyar, dar û giya dêliyên xaniyên metrûk lêk rast dikin. Bajar ji hev dikeve. Cihên qerebalix dişibin gundan. Û dîmen hêj dirrindetir lê tê gava banga dîkan û fîtikên bênavber ên kuliyan têkel dibin. Li Detroit'ê, dengên xwezayê li nav bajarî olan vedidin.

Heke îro % 35ê herêma şaredariyê vala û bêşênî be (2), ev yek ji ber wê diyardeya tekane ya dîroka bajarvaniya cîhanî ye ku di nav nîv sedsalê de, Shrinking city an jî bajarê ku dikişe û tengtir dibe, zêdetir ji nîvê nufûsa xwe, yanî nêzîkî milyonek kes ji dest dan (3). Bes li dergehên zanîngehê an jî wextê belavbûna xwendegehan nebe, bi tenê çend peya piyaseyê dikin li ser peyarêyên Woodwars, Michigan an jî Gratiot'ê, ku cade û şeqamên serekî ne li bajarî. Digel qeyrana subprime'an (cûreke krediya emlaqê ya birîsk e li DYE'yê), prosesa terikandin û bêmirovkirina bajarî hêj bileztir lêhatiye.

Gewretirîn bajarê Michiganê, Detroit, yek ji wan bajaran e ku herî zêde ketiye ber xezeba bazara wan deynên (krediyên subprime) bi faîzên cihê, ew krediyên ku lîberalan xwestibû dabîn bikin di çarçoveya modêla entegrasyona nav civaka serfkar, bi taybetî ji bo xizanên ku nikarin bibin xwedanê emlaqan. Topavêtina hezaran deyndaran, ku nedikarîn bi zêdebûna faîzan re bigihin, kir ku gelek kes emlaqên xwe bifiroşin. Di navbera 2005 û 2008'an de, şêst û heft hezar xanî hatibûne desteserkirin.

Li Detroit'ê, wêrankariya qeyrana dawî ya sîstema kapîtalîst ewqasê din jî girîng bû, lewre her cara ku di warê darayî de rûxînekê bi xwe re têkçûna pareke warê hilberînê jî dianî, zerer û xemên wê bi heman rengî diketine ser mil û şaneyên şêniyên bajarî. Îflasa sîstema bankî, ku bidestxistina krediyên ku hêz û stûna mezaxtinê ne pir dijwar xist, di rastiyê de derbeke pir giran li Big Three an jî Sê Mezinan da –navendên General Motors, Ford û Chrysler'ê li Detroit'ê an jî li derdora wê ne- ji ber ku daketina rêjeya firotina trimbêlan li DYE'yê çespand. Şirketên GM, Chrysler û Ford, ku pir bi zêdeyî ketine bin deynan, kêşeya kêmasiya sermiyanî bi ser de hatiye û herwiha tûşî reqabeta şirketên trimbêlan ên japonî bûne, bi tenê bi xêra pîlana felatê ya hikûmeta federal e ku hêj bi yekcarî top neavêtine. Lê belê, pîlana navborî ne bêkariya demî û ne jî kêşeya jikarderxistina karkeran çareser kir.

Ji Çileya 2008'an heta Hezîrana 2009'an, rêjeya bêkariyê li Detroit'ê hema bêje du beramber zêdetir lêhat, bi vî rengî ji % 14,8'an gihişte % 28,9'an. Bi ya dîrektorê binkeyeke lêkolînên demografiya herêmî Kurt Metzger, rêjeya bêkariyê ya rasteqîne reng e ji % 40'an jî bilindtir be (4). Dave sebaret bi meseleya bêkariyê wiha diaxive: "Niha gelek ji berê kambaxtir e. Divê jiyarekê peyda bikin. Ê min, ez rêya xwe vedibînim: ez hinek karên biçûk dikim li derûdoran. Bi tenê da ku debara xwe pê bikim. Lê jina min, ew tu karan bi dest naxe. GM û Chrysler li ber îflasê ne, Ford bi bela û kutek xwe jê xelas dike. Êdî li vir tu karxane jî nînin." Balexaneyên metrûk ên navenda bajarî û dîregên bê ala, êdî ew sembolên têkçûn û hilweşînê ne.

Ji ber ku bi tenê çend warên karan li Detroit'ê berbalev bûn, gava ku leza çerxên aboriyê daket û sîstema kapîtalîst tûşî pêwîstiya guhorînê hat, eşkere bû ku bajar gelek hesas bû (5). Fordîzmê –ku serkaniya wê, karxaneya Crystal Palace, di 1908'an de ji aliyê Albert Kahn ve hate avakirin- bajarê Big Three kiribû navenda cîhanî ya kapîtalîzma endûstriyel. Nîvê yekem ê sedsala XX'an, pêdiviya mezin a bo karkeran ji bo xebitîna li karxaneyên ku dest bi hilberîna giştî (mass production) kiribûn, û mûçeyên nisbeten bilind ên ku didane karkerên karxaneyên trimbêlan, gelek karkeran berev xwe ve dikêşe: Reşikên ku ji pest û terora dewletên başûrî direviyan û cemawerên welatên biyanî, nemaze ji Yûnanistan û Polonyayê. Heynê duyem şerê cîhanî, ku Detroit a "cebilxaneya demokrasiyê" di dilê hewl û xîretkêşiya şerê Amerîkî de cih digirt, bajar gihiştibû lûtkeyê.

Ji 1945'an ve, Detroit bi berdewamî gel û karên xwe ji dest dide. Ev qutbûna di dîroka bajarî de herwiha nîşana derbasbûna bo qonaxeke pişt-fordîst a kapîtalîzma Amerîkî ye. Di modêla nû de, war û qadên nû hebûn ji bo berhevkirina samanan. Amrazê hilberîna endûstriyel a Dewletên Yekgirtî, dest bi bizaveke desentralîzasyona herêmên endûstriyel ên wekî Bakur-Rojhilat û Rojavaya-Navîn dike û Başûr dibe navnîşana nû lewre li wê derê bihayê karkeriyê ji ber lawaziya sendîkayan pir kêmtir bû. Di çarçoveya bajar û bajarokên derûdorê de, demokratîzekirina beşê trimbêlan û sazkariyên di sîstema hîlberînê de dibin binasê sistbûna kar û xebatan. Modêleke bajarî ya pir-navendî, ku xwe li dora birrên kar û xizmetên li dorhêla bajarî bi rêk dixe, pê de pê de dertê û cihê xwe qahîm dike. Çîne-navîncî û çîne-bilindên spî, ku dikevine ber cezabeta rê û dirbên nû yên karên li banliyoyan û herwiha dû xeyala bidestxistina xaniyê xwe yê musteqîl, bi vî rengî, diçin li suburban bi cih dibin.

Lê belê barkirina çîne-navînciyên spî bo derveyî derwazeyên bajaran herwiha ji ber sebebên wekî tirs û nijadperistiyê ye jî. Herçend barkirinên ewil ên bi vî rengî ji salên 1950'an ve, digel destpêka prosesa sivikkirina beşê endûstriyê, piraniya nufûsa spî raperrîna Reşikan a 1967'an –çil û sê kuştî– bi hecet dizanin ji bo barkirinê; artêşa federal bi xwe kamyonan dişîne ji bo barkirinê. Derhatina temsîliyetên tirsnak û hovane ku nasnavê Murder City (bajarê kuştinê) an jî Devil City (bajarê Şeytanî) li Detroit'ê bar kiribûn, bûne amrazên propagandayekê ku tiştên nerast jî bi mirovên asayî dane bawerkirin sebaret bi aliyên xerab ên bajarî. (10)

Tirs û nijadperistî bi vî rengî bûne fakterên lêkcudakirina meydana civakî li ser bingehê aboriyê. Qudreta teheyyulê –li Robocop (fîlmekî sînemayî yê Amerîkî) bihizirin ku li Detroit'ê derbas dibe- û hêza peyvan ya kiryarî heta dereceyekê rave dikin bê ka çima Detroit take bajarê mezin ê DYE'yê ku ne bûye warê bûrjûwabûnê û ne jî "pirkultûrî" lê berbelav bûye. Detroit yek ji metropolên herî xizan ên welatî ye –sêkiyê şêniyan li jêr derazînga xizaniyê dijîn-; herwiha, rêjeya cudakariya nijadî pir bilind e –nêzîkî ji dehan nehê şêniyan Reşik in. Ev "aparteîda (cudakariya nijadî ya berê li Afrîkaya Başûr hebû) Amerîkî" ne di navbera taxan de ye, wekî li piraniya bajarên DYEyê, lê bêtir di navbera navenda bajarî û suburban de ye.

Li ser 8 Miles Road'ê, şeqama fireh ku sînorên bakurî yên şaredariya Detroit'ê destnîşan dike, girê hûrik, sînorê di navbera du cîhanan de dikêşe. Li aliyekê cemawera qenc a suburban, xaniyên rihet û dewlemend û hewşên biçîmen; li aliyê din, taxên xizan û bêhed qerebalix û cemawerekî ketî ber xezeba bêkarî û sîstema taybet a tenduristiyê ya cudakar. Li navenda bajarî, lezê lê dikin seqet û bêmal gava li ser cadeyan derbas dibin, û bi vî rengî Molloy bi bîr tînin, ew lehengê Beckettî ku bi qeysikê xwe û bi bisîkleta xwe dewamê li dewamkirinê dike. Bajarê trimbêlan herwiha yê kamyon û paldankên elektronîk e jî; rêzine ji wan li aliyê jêrîn ê şeqaman diyar in. Amarên tenduristiya gelî her mîna yên welatekî cîhana sêyem in. Rêjeya mirina zarokan gihiştiye hejdeh ji hezaran, yanî sê caran zêdetir ji eyaletên din ên DYE'yê, her bi qasî li Srîlanka'yê.

Dave bi bîr tîne ku, "gava tu ji kar derketî, ev te sîgorteya tenduristiyê jî ji dest da. Lewma, piraniya wan kesên ku betal dimînin nema diçin cem doktorî. Tu dikarî li sûya kolanê biçî xwe bidî dermankirin. Bi bîst dolaran e, lê divê neferek ji malbata te bixebite û bibe kefîlê te. Hema tu ji bo pişkinîneke asayî û sade jî biçî, tu dê biçî li dawiya rêza li salona nexweşan rawestî heta ku dor digihe te." Bilindbûna rêjeya betaliyê bi vî rengî dibe binasê bêtir kambaxbûna tenduristiya giştî.

Di halekê de ku awa û taybetiyên bajarî wiha ne, yanî ji bilî karîgeriya demî ya qeyrana aborî bêtir şêweyê wê yê xelekî ye ku kêşeyan durist dike, gelo çawa ev meyla negatîf dê bê veguhertin? % 86'ê kar û karxaneyan li derveyî bajarî ne lê çaryekê şêniyan ne xwedantrimbêl in (hejmara fermî % 33 ye, lê belê Metzger bala me dikêşe ser wê hindê ku hejmareke şiferan trimbêlên bêsîgorte diajon, lewma ew di amaran de nehatine hisêbkirin). Di bajarekî de ku bi û bo trimbêlan hatiye birêkxistin, derbasbûna di ser cade û şeqamên mezin re, hatûçû, bê wesayit, îmtihaneke serbixwe dijwar e. Pirsa civakî herwiha pirseke hatûçûyê ye. Ji bo wan ên ku nikarin têkevine nav hevgirtineke kesên nêzîkî hev, wekî kirêkirin an jî bikaranîna trimbêlekê digel çend kesên din, bi tenê rêya xizanan dimîne: otobusên ku cihê bisîkletan jî lê ye. Lê belê, şaredarê Detroit'ê David Bing –xelefê wî hêj nû hate hilbijartin– ku serokatiyê li bajarekî li ber îflasê dike, (7) budçeya guhastinê pir kêmtir kir: Sed û sêzdeh şiferên otobusan ji kar hatin derxistin, çend hêlên otobusan hatine betalkirin û hejmara seferên otobusan li ser hêlên din hate daxistin (8). Birêkxistina bajarvaniyê, bi rengê ragirtina beşeke proleteryayê di nav devereke dorgirtî de, neyeksaniyên civakî bi awayên din dîsa saz dike.

Xizanên Detroit'ê jî dîsa her ji ber heman rewşê ji xizmetên tenduristî têne qutkirin. Ji ber ku piraniya doktorên giştî, berê xwe dane banliyoyên dewlemendan, dûr ji xizanên bêpere û bêxêr, û li wê derê bi cih bûne da ku pitir pere qazanc bikin. Rast e ku bajar lûtkeya lêkolînan e û hinek navendên tenduristiyê yên herî binavûbang ên axa Amerîka'yê lê ne. Lê belê, heke dewlemendên şêniyên su-

* *Zanistên Înstîtûta Jeopolîtîk ya Zanîngeha Parîs'ê ya 8'em.*

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

burban nebin ma kî dikare biçe wan nexweşxaneyên baş û rihet?

Reforma sîgorteya tenduristiyê, soza kampanyaya Serok Barack Obama, ji ber vê hindê dimîne pirseke jiyanî ji bo beşekî mezin ê gelî. Louise xebatkareke kevn a şaredariyê ye. Em li East Side'yê, yek ji wan taxên wêran ên amerîkiyên binyad-afrîqî, li wê rast dikevin. "Ez 74 salî me. Reng e li we jî eyan be ku ez gelek guhê xwe didime ser munaqeşeyên li dora sîgorteya tenduristiyê. Min dengê xwe da Obama ji ber ku min bawer dikir ku ew dê bikare sîstema sîgorteya tenduristiyê çak bike. Bi rastî pêdiviya min gelek pê heye. Doktorê min ji min re gotiye ku divê ez biçime skanerê. Bi xêra Medicare'yê (sîstema giştî ku mafê sîgorteyê dide kesên ji 65 salî mezintir) heta % 80'yê mesrefan dikevine ber sîgortayê. Lê belê % 20'ê mayî, ew jî her gelek zêde ye. Jixwe pereyê min bi zor û kutek têra dermanên min dike. Îcar divê ez an pereyê xwe bidime dermanan an bidime skanerê, yek ji wan, ne wisa? Tê vê maneyê? Bîst û neh salan ez xebitîm. Min hemû bacên ser xwe dan. Ev ne edalet e, ev rewşeke neheq e."

Li vê keleha demokratan, % 97'ê hilbijêran dengên xwe dane Obama. Serkeftina wî, bayê hêviyê xurt kir. Piştî salekê, Luther Keithê Serekê Arise yê, komeleyek ku sexbêriya bêpere û alîkariya perwerdeyê dide şêniyên taxên xizan, bi hestyarî û keser bi bîr tîne wê roja ewqas taybet ji bo Reşikên Detroit'ê: "Li her derê şadî û şahî bû. Derasayî bû. Me digot qey tiştekî gelek xweş hatibû serê neferekê malbatê." Di dewama axaftina xwe de dibêje ku "wekî hingî bû gava di 1938'an de Joe Louisî zora Max Schmelingî biribû !", qesta wî ew boksorê reşik e ku zora Max Schmeling'ê alman ê lehengê Almanya ya Nazî biribû û bi vî rengî bûbû semboleke bizava Reşikên Amerîka'yê ya di navbera du şeran de –heykelek li nav bajarî li ser bîranîna wî hatiye çêkirin.

Lê belê, li vê devera girîng a afro-perwerî (afro-centrism: rewta siyasî û roşinbîrî ku ji bo pêşxistina nasname û naskirina tevkariyên kultûrên afrîqî hewl dide) û têkoşîna bo mafên sivîl, bêtir bernameya aborî û civakî ya berendamê demokrat bû diyarker di meyla hilbijêran de, ne aîdîyeta wî ya cemaetî. Her kesê ku em pê re diaxivin heman hevokê dubare dikin: "Me ne ji ber ku Obama reşik bû dengê xwe dayê; lê ji bo xatirê projeyên wî, nemaze ji ber qirardariya wî ya çakkirina sîstema sîgorteya tenduristiyê."

Ev layengîriya xurt a li demokratan li vê kontnişîna Macombê, ku diyardeyeke derasayî ye di zaniste-siyasiyên amerîkî de, di heman demê de faktorên diyarker ên aborî û civakî yên hilbijartinan di metropola Detroit'ê de ron dike.

Welatiyên bajarî bo niha gelek geşbîn û dilxwaz in sebaret bi serokdewletê nû, lê di heman demê de ewqas berbendên li ser rêya bicihkirina armancên wî belavbûyî, endîşe û fikaran jî li wan hasil dikin. Keith diyar dike ku, "ji bo gorrankariyan wext divê. Heke em li wan tiştên ku Obama di van heyvên dawî de kirine binêrin, bi rastî ji hemû ew tiştên serokên berî wî kirî zêdetir in." Lê belê Keith lê jî zêde dike ku, "bêguman mesele bi tewawî çareser nebûye. Ji bo wan ên ku bêkar mane gelek zehmet e ku bêjin belê hemû tişt bi dilê me bi rê ve diçe". Çavê hemû şêniyên bajarî li ser e û dibînin ka çawa digel lobiyan, digel komarî û beşek ji muxalefeta partiya xwe li hev tê. Li ba hejmareke mezin a hilbijêrên wî, hêvî pê de pê de cihê xwe dihêle bo sebrê. Lê belê Keith ji me re bi eşkereyî dibêje: "Heke bi ser nekeve, husran û bêhêvîtiya li nav gel dê pir mezin be."

Ya rast êdî dewleta federal bûye çareya dawî. Şaredariyê nema îmkana liv û bizavan heye. Têkçûna bingeha wê ya darayî ji ber reva çîne-navîncî û sermiyanê bo derve, bajar xistiye rewşeke ber-îflasê. Encûmenê şaredariya demokrat wisa diyar e ku bêçare ye ji bo rawestandina çerxa xizanketinê. Her çi çarçoveya giştî ya metropolê ye, tevkariya wê di baştirkirina rewşa bajarî de hêj jî meseleyeke pir aloz û zivêrker e. Şêniyên taxên dewlemend ên derveyî bajarî naxwazin samanê erdê xwe parve bikin; li rexê din, şêniyên reşik ên bajarî bi bedel û têkoşîneke ewqas mezin serweriya xwe ya siyasî bi dest xistiye ku bi tu awayî razî nabin ku ew serwerî bi destê desthilata metropolê, desthilateke ku ne di xema xelasiya wan de ye, bê hilweşandin.

Serera rewşa kambax a berbelav, ne grevek e li karxaneyan û ne jî xwepêşandanek e li kolanan.

Xizanên ku ji "ekonomiya gazînoyan" şikest xwarine, vê carê di salonên yariyan de cihî li hev teng dikin, ku li Detroit a dawiya salên 1990'an, avakirina wan salonan beramber muafiyeta bacdanê, firehtirîn polîtîkaya geşedanê bû. Diyar e bajar gelek dûr e ji wan edetên xwe yên tundrew. Ew bajarê ku li ser malika wê têkoşînên mezin tomarkirî ne, wekî grevên mezin ên karkeran ji 1937 heta 1945'an, hilbijartina yekem şaredarê reşik Coleman Young di 1973'an de (9), birêkxistina torên dijî koledariyê, têkoşîna ji bo mafên sivîl, derhatina Black Power an jî raperrînên Amerîkiyên binyad-afrîqî yên 1833, 1918, 1943 û 1967'an.

Êdî United Auto Workersa bihêztirîn sendîkaya Amerîkî ya trimbêlan jî berê xwe ji têkoşînê da alî, û mesele gihande heta wê dereceyê ku biçe digel patronên General Motors û Chrysler"ê teqez û li hev bike ku di heyama qeyrana aborî de tu grevan nekin. Li vir, wisa diyar e ku tu kes li dijî wê sîstemê ranabe ku Detroit bi xwe ji nav berhemên wê yên bajarî ya herî pêşketî ye. Keiht eşkere dike ku, "kapîtalîzm Amerîka bi xwe ye. Wê bajarê me ava kiriye. Navê mûzîka Motown, trimbêlên ku xelk diajon, ev hemû kapîtalîzm e. Kapîtalîzm her tişt e… her tiştê ku te heye, û bi rengekî din, her tiştê ku te nîne jî. Lê bizane wekî wî hewayî ye ku dikêşî nava hinavên xwe. Nikarî biguhorî."

Li ba karsazên Techtownê, ku hevda şirketên xwedanê budçeyên dêwasa ye, her wekî li ba nûnerên siyasî, herkes behsa aboriya kesk dike. Elîtan hergav xwestiye bawer bi sibeyên şad bikin: dahênana nû, çerxa nû, "bahoza abadîn bo wêrankariya afirîner." Renassaince City bi vê geşbîniya lîberal şêwekirî ye ku, çi cara ku tûşî tengasiyê dibe, ji kaniya ciwaniyê ya teoriyên schumpeteryen (teoriyên ku ji hizrên aborînasê Awûstûryayî Joseph Schumpeterî hatine dariştin) hêz û bingeha xwe nû dike. Avakirina Renaissance Centerê bi daxwaza Henri Ford II li ser devera herî navendî ya bajarî, bi tenê çar salan piştî raperrînên 1967'an, sîtaveke herî zelal û eşkere ye wekî nimûneya vê yekê. Li ser kursiyên xwe yên rihet û li dora maseyên vê restorana li tebeqeya 73yê ya vê balexaneya ku ji 1995'an ve mazûvaniyê li navenda GM'ê dike, karsaz û patronên şirketan firavîna xwe dixwin. Li ber bergehê wêran, menzereyeke bermayan bilind dibe ku şûn û şopên tundûtîjiyê lê qalib girtine. Gelo têkçûn an jî qiyameteke hêdî nebe?

Keith piştrast dike ku "ji bo gelek Amerîkiyan, Detroit Ground zero ye. (10)" Ne Ground zeroyek ku ji bi ba û birqa brûskekê derbê. Ne qerebalixeke betilî ji rûdanan. Lê sifireke (zero) bi sebr hatî, hisêb û hejmartineke ku naxwaze qet bi dawî bibe. Detroit wekî berhema rikûnî ya sîstemeke wisa ye ku pêşî û hergav mecbûr dike ku wê pirsê bikin: çawa îradeya xwe biguncînin digel ezmûna pêdiviya berdewamkirinê? Koriya bindestan an sînîzma (qedrnezanî û averêbûn di barê exalqê de) serdestan? Keith bi bişirîn qiseya xwe bi dawî dike: "Ji bo me çareserî bi tenê geşbînî ye."

Wergera ji fransî
Ergîn Opengîn

(1) Cûreke avahiyan e ku tê de qederê sîh xanî hene; taybet e bi bajarên Amerîka ya Bakur.

(2) Detroit Free Press, 7 Îlon 2009

(3) Di halekê de ku sala 1950an nufûsa wê 1,8 milyon bû, îro di navbera 912.062 û 777.493 kes lê dijîn li gor serjimêriyan. Ferqa di navbera herdu texmînan de, rewşekî nimûneyî ye li DYEyê, bi rexê xwe re bûye binasê gengeşeyên kel. Lewre giraniya siyasî û rêjeya subvansiyon û alîkariyên dewletî jî li gorî serjimêriyê têne diyarkirin.

(4) Bi tenê ew kesên ku li ser lîstên Ajansa damezrandinê (kar) navê xwe nivîsandine di vê hejmara bêkariyê de hatine hisêbkirin.

(5) Bi ya André Kaspi, di kitêba wî ya bi serenavê Les Américains (Seuil, Parîs, 1999) de hatiye, qeyrana 1929'an, bo nimûne, bûbû binas ku karên Fordê bi qederê % 71 dakevin.

(6) Bixwîne Jean-François Staszak, " Détruire Détroit. La crise urbaine comme produit culturel ", Annales de géographie, Parîs, n° 607, Gulan-Hezîran 1999.

(7) Deynê bajarî gihişte 300 milyon dolaran û kêmasiya budçeyî jî bûye 80 milyon dolar di 2009an de. Detroit Free Press, 11 Îlon 2009.

(8) Detroit Free Press, 11 Îlon 2009.

(9) Yekem şaredarê reşik ê Detroit'ê (1973-1993), endamê Partiya Demokrat, bi rêya venavkirina kolanan an jî danîna abîdeyan ji bo bîranîna sembolên mezin ên bizava amerîkiyên binyad-afrîqî, wekî Harriet Tubman, nasnameya reşik a bajarê xwe piştrast kir.

(10) Biwêjê Ground Zero ji bo devera deqîq a teqînekê tê gotin. Ji 11'ê Îlona 2001'an ve, cihê World Trade Centerê li New York'ê derdibirre.

SÊQOZIYA ÇÎN-HINDISTAN-AFGANISTAN

Karê zêdetir û derfetên hindiktir li Afganistan'ê

SARAH DAVISON*

Ya ku dike di "lîstika mezin" ya ku li Afganistan'ê pêk tê de bi ser bikeve, ne Hindistan e, lê belê Çîn e. Digel ku New Delhî'yê îsal alîkariyeke ji yek milyon dolarî zêdetir gihandiye Kabûl'ê û herdu welat ji pênc sed salan û bi ve ye ku dîrokeke hevpar par ve dikin, Pekîn gavên polîtîk yên giringtir diavêje û serkevtinên ji yên Hindistan'ê xurttir li Afganistan'ê û herêmê bi dest dixe.

Ji dêlva şandina alîkariyê, Çîn bala xwe dide ser bazirganiyê û karsaziya biyanî ya rasterast (KBY) ku meha nîsana 2009'an hemû rekorên dîroka afgan şikandin: Şîrketa Dewletê China Metallurgical Construction Corporation 3.5 milyar dolar dane – du qatê wê jî xerc kirine- da ku kana zîvan ya Aynak'ê bi dest bixe. Ev kan pêncî kilometer li başûrê Kabûl'ê di nava bajarê Logarê de ye ku ev dever di destê Talîban'ê de ye.

K. Bhadrakumar ku kevne dîplomatê hindî ye dide zanîn ku, "hebûna Çîn'ê ya li herêmê çiqasî weke işareta rêzeserkevtinên wê yên diplomatîk bin, ya Hindistan'ê jî ewqasî çîroka têkçûyinên dubarekirî ye." Li gora wî, Çîn bi ser ket, ji ber ku wê bala xwe ji armancên xwe qet neda alî û bi tiştekî din nebiliya. Di vê navê de, Hindistan'ê sere xwe bi muxalefeta bi Pakistan'ê re êşand ku vê yekê jî rê li ber girt ku nêzîktirî Kabûl'ê bibe, lewre ditirsiya ku peywendiyên wê bi tenê bi kêrî Afganistan'ê werin.

Mînaka herî berbiçav, ya gazoduka navbera Îran, Pakistan û Hindistan'ê ye ku New Delhî digel pêdiviyên xwe yên mezin jî guh nadiyê. Vê projeya gellekî giring karîbû derfet bidaya wê ku kêmaniya wê ya enerjiyê çareser bikiraya û peywendiyên wê yên herêmê jî saxlem bikirana. Bi derbasbûyina seranserê Afganistan'ê re, wê ê bikariya bi hezaran kar ji bo karkerên afgan bidaya peydakirin û şiyana teknîkî ya ku li Afganistan'ê sedema qelsiyê ye li wira bi pêş de bixistaya. Lê, New Delhî ditirse pişta xwe bispêre cîranê xwe, lewre ev gazoduk ji xaka Pakistan'ê re derbas dibe.

Digel ku berpirsên hindistanî bawer dikin ku Afganistan ew dever e ku muxalefta wan ya bi Îslamabad'ê re ê dewam dike, Pekin weke çavkaniyeke dewlemendiyên petrolê, yên gazê û yên mîneralan lê dinihere û wê weke hevkareke bazirganiyê ya siberojê dihesibîne. Stratejiyeke pragmatîk xuya dibe, lê belê saxlemtir û maqûltir e. Teva piştgiriya hêzeke fînansî ya xurt, ev stratejî herweha alîkariyê dike ku baweriya herêmî jî çêbibe.

Naveroka bernameyên ku ew piştgiriyê didinê, -ji hêza bernameyên wan zêdetir- cudahiya di navbera hikumetên çînî û hindî jî eşkere dike. Pekîn'ê hêza xwe da Aynak'ê ku li cîhanê duyem mezintirîn çavkaniya sifirê ye (ji 11 milyon tonan zêdetir). Ji bilî heşt hezar karên ku rasterast dikarin jê ben, Çîn'ê herweha soz da ku santraleke elektirîk ya 400 megawatî, febrîqeyeke helandina sifirê ya li cihê wê, rêhesineke heta Tacikistan'ê ava bike û di ber re jî alîkariya bipêşxistina perwerdehî, avakirina xaniyan û sîstema tendurustiyê bike.

Ev bername ji xwe bernameyeke weha ya pêşketinê ye ku Çîn'ê li navenda Asya'yê jî û li Efrîqa'yê jî daye ber xwe. Çîn ji xwe avakirina karan û bipêşketina aboriya herêmê bi hev re dimeşîne, da ku herêm li ser lingan bisekine û di ber re jî li kara xwe ya têrkirina pêdiviyên xwe yên çavkaniyên xwezayî digere. Çavkaniyên çînî yên diplomatîk yên Kabûl'ê balê dikişînin ser ku ev karên ku Çîn li Afganistan'ê dike nîşan didin ku baweriya Çîn'ê ya bi sererastbûyina siberoja Afganistan'ê heye. Ji wê zêdetir jî, li gora wan, alîkariya Çîn'ê ya bi welatên cîran ku di nava dijwariyan de ne herweha bi armanca ewlekariya siberojê ve ye û bi taybetî jî ewlekariya bazirganiyê ku herdu welat jî dê jê îstifade bikin.

Niklas Norling'ê ku li Enstîtu ya Stockholm'ê di warê ewlekarî û pêşketinê de pisporê Çîn û Asya ya Navîn e (1), dide zanîn ku; "divê mirov van tercîhan di nava bernameya çînî ya pêşketina "rojhilata mezin" de binirxîne ku bi xêra wê, li herêmên rojavayê Çîn'ê û li derveyî sînorên wê, li Asya ya Navîn, li Asya ya Başûr û li Îran'ê gellek kar hatin kirin." Ew çend mînakan jî ji karên çîniyan dide: Li Pakistan'ê otobana Karakorum'ê, li Karaçî'yê lengergeha Gwadar'ê, gazoduka ku Turkmenistan'ê bi Xinjiang'ê ve girê dide û herweha bi Îran'ê re peymana enerjiyê ya bi 100 milyon dolarî ye ku ji bo bîst û pênc salan hatiye kirin.

Lê belê, ya ku xetên veguheztina elektirîkê saz kirin jî Hindistan e ku bi xêra wan rojê heft saetan elektirîk digîje Kabûl'ê û êdî weke berê ceryan li wan deran nayê û naçe –bê guman ev kar li cem afganan gellekî navdar e. Elektirîk bi xêra xetên nû ve rasterast ji Ozbekistan'ê tê û bihayê wan xetan gellekî bilind e lewre di çiyayên Salang'ê re derbas dibin ku bilindahiya wan 4000 metre ye. New Delhî yê herweha hin projeyên piçûk yên pêşketinê jî pêk anîn ku bi pirranî li wê herêma ne ewle ya Bakurê Afganistan'ê ku di navbera wê û Pakistan'ê de ye. Ew herweha pereyekî mezin jî dixe nava bernameyên tendurustiyê û yên xwarinê ku bi xizmeteke weha tên kirin ku ji xizmeta ku xelkê Hindistan'ê dibîne jî bilindtir e.

Lê, vê hemû tahba ku da xwe bi kêrî tiştekî nehat. 8'ê Çiriya Pêşîna 2009'an, bombeyeke ku di nava erebeyeke xwekujer de hatibû veşartin li hember Balyozxaneya Hindistan'ê ya li Kabûl'ê teqiya ku di nava salekê de, bû êrîşa duyem. Van herdu êrîşên ku li ser navê rêxistina Haqqînî ya ku bi El Qaîde'yê ve girêdayî ye hate hesibandin, ji sed û pênciyî zêdetir kes kuştin û bi sedan kes jî birîndar kirin. Ew weke reaksiyoneke li dijî zêdebûna hebûna Hindistan'ê ya li Afganistan'ê tên nirxandin, lewre Pakistan vî welatî weke mala xwe dihesibîne.

Digel ku Hindistan hebûna xwe ya dîplomatîk bi balyozxaneyeke mezin û berbiçav ya li paytextê ve û bi çar konsulxaneyên xwe yên li seranserê welêt dide zanîn, Çîn'ê berê xwe da rêya dijber: Balyozxaneyeke nefspiçûk ku hejmara karmendên wê ne zêde be û li paş deriyekî sor yê kêmvekirî de baş veşartî be. Bi karên ku dike jî, tercîh dike ku zêde balê nekişîne. Mezintirîn bernameya wê bi bihayê 25 milyon dolaran e û bi xêra wê, Nexweşxane ya Komarê ya Kabûl'ê hatiye avakirin ku sê sed pêncî cih tê de hene û meha tebaxa bihurî vebûye û niha baştirîn û bipêşdetirîn nexweşxaneya welêt e. Lê, wê hêza xwe bêtir daye ser bernameyên ku dê kara wan ya ji bo Pakîn'ê bi derengî nekeve û dê derfeta bipêşxistina aboriya herêmê jî bi xwe re bînin.

Ji niha û bi şûn de, şîrketên hindî dikevin reqabeta çîniyan. Hin çavkaniyên nû hatin kişfkirin ku du ji wan yên sifirê ne û gellekên din jî di nava wan de sifir û zêr hene. Bêguman, divê neyê jibîrkirin ku çavkaniyên hesinî yên Hajîrak'ê jî hene ku sed û sîh kîlometre li rojavayê Kabûl'ê ne û 1.8 milyar ton rezervên wan hene û îhaleya wan jî nuh dest pê kiriye. Pênc şîrketên hindî reqabetê bi şîrketeke Çîn'ê ya fermî re dikin. Kabûl li hemberî vî karî, febrîqeyeke polayan, xetteke rêhesinî û febrîqeyeke gubreyên çandiniyê dixwaze – yanî bi qasî wan karan jî bernameyan dixwaze ku dê hejmara karan zêdetir bike. Li gora çavkaniyên afgan, çînî favorî ne, lewre tecrubeya karê wan yê Aynak'ê hatiye kirin. Gava ku mirov hesabê hejmara karkerên ku dê kar peyda bikin jî dixe navê, mirov dizane ku welatê ku îhaleyê bi dest bixe dê karê xwe yê wira berfirehtir bike, karê li welatekî weha ku hê zêdetir ji sed hezar leşkerên welatên rojavayî lê hene.

Ka îcar gelo wê Çîn an Hindistan ji peywendiyên xwe yên bi Afganistan'ê re baştir îstifade bike, ew jî ancax dê li gora pêşketinên polîtîk yên li herêmê diyar bibe. Lê weha diyar e ku Çîn ji niha ve kareke baş ji bernameyên xwe yên Afganistan'ê dike.

Werger ji fransî
Îbrahîm Seydo Aydoğan

** Rojnameger li Kabûl'ê. Ev tekst ji ber nivîsekê hatiye girtin ku di Far Eastern Economic Review di meha Çiriya Paşîna 2009'an de hatiye çapkirin.*

(1)Hevpeyvîna li ser Eurasianet.org, dezgeha ku ji aliyê milyoner George Soros ve hatiye damezirandin.

BAZARA BERHEMÊN GENETÎK

Hindistan xwe ji Amerîka'yê diparêze

MIRA KAMDAR*

"Şoreşa kesk" bêguman kir ku hilberîna zad û dexlî bi rêjeyeke girîng zêde bibe (ji heftê milyon tonên 1954'an bo dused û du milyon tonan îro), lê belê, Hindistan'ê bihayê wê pir bi giranî da: Ziwabûn û çikbûna avên kanalan û bîrên binerdî, qirêjîbûna erd û zeviyan, deyndarketina cotyaran (ji wan zêdetir ji sed hezar kesî di nav dehsalekê de xwe kuştin), rêjeya qansera ku li nav gundî û cotyaran bi çargavî zêde dikir. Tesîrên wê yên li ser siyaset û civakê jî têra xwe girîng bûn.

Wisa diyar bû ku li Hindistan'ê tu berbend nebûn li ber xistina nav bazarê ya bacanêreşên ku genetîka wan hatibû guhertin (genetîkguhertî); ev yek dê bibûya premiyereke cîhanî. 16ê cotmeha 2009'an, Lijne ya Destûrê bo Endazyariya Genetîk (GEAC) ya Hindistan'ê, ku saziyeke pir fermî ye, çiraya kesk jê re pêxistibû. Lê belê, li ser zêdebûna fişaran, wezîrê jîngehê Jairam Ramesh, di reşemeya 2010'an de, dijatiya xwe ya li hember bazarkirina wê berhemê aşkera kir û proseya bazarkirina berhema navborî bi moratoryûmekê paşve xist. Gelo wate ew e ku Hindistan, anku yek ji mezintirîn hilberînerên cîhanî yên pembûyê genetîk-guhertî, dê dest ji OGG'yên (Organîzmayên Genetîk-Guhertî) xurekî bikêşe? Nexêr, hêj gelek dûrî wê yekê ye.

Lê belê, di her halûkarekê de ew paşvedan û hilawistin tê wê wate yê ku komelgeya medenî ya Hindistan'ê serkeftinek bi dest xwe ve anî. Kampanya û çalakvaniya li dijî bacanêreşa OGG, ku Mohandas Karamchad Gandhi li dor hizra swadeshi (têraxwebûna neteweyî) pêşengî ji wê çalakvaniyê re dikir, gelek dişibî hewl û çalakvaniya xelkî ya li dijî Împaratoriya Brîtanya'yê. Derxistina vê sewziyê bo nav bazarê, li ber çavên wan, mîna êrîşeke biyaniyan bû li dijî kelepûra genetîk a serweriya xurekî ya welatî. Wê boçûn û têgihiştinê kir ku deh wîlayetên rejîma federal a Hindistan'ê, çandiniya bi wî rengî qedexe bikin li ser axa xwe. Li ber vê bergîriyê, Jairam Rameshî xwast prosesa xistina nav bazarê ya wan berheman bi bêhnfirehî û hêdî hêdî pêk bê.

Ev rûdan, herçend têkçûneke tewaw û yekcar nebe ji bo layengirên OGG'yê, şikesteke mezin e hem ji bo şirketa Mahyco'yê –ku ev bacanereş durist kir ji bo şirîkê xwe yê amerîkayî, anku şirketa pirneteweyî Monsanto'yê– û herwiha ji bo hukûmeta Dewletên Yekgirtî. DYA'yê, ji mêj ve ye, danqebûlkirina OGG'yan, ku Monsanto difiroşe, di dil û navenda siyaseta xwe ya aboriya derekî de bi cih kiriye. Bi ya Washington a ku peywendîdar e digel şirketên biyoteknolojiya genetîk, bi tenê OGG dikare berxwe bide li hember xelaya avê û zêdebûna germiyê û bi vî awayî xureka xelkê cîhanê teqez bike. Lê belê, Hindistan yek ji wan welatan e ku rîska zêdebûna giştî ya xelkê bedxurek-zede lê heye. Piştî mûsona xerab a 2009'an, biryar ew e ku Hindistan, di 2010'an de, 3 milyon tonên birincê, ku piştî Çîn'ê herî zêde ew serf dike, û çar milyon tonên sewziyên hişk îthal bike.

Rastketina pir îronîk, eynî wê roja ku Rameshî biryara xwe ya derheqê meseleya bacanêreşa nû-çêkirî de aşkera kir, pirsa garisê MON 810, ku wê jî dîsa Monsanto çêdike, hate ber Komîsyona Ewrûpa'yê; em dizanin ku serokê Komîsyona Ewrûpa'yê Manuel Barosso qanih bûye ku divê li welatên Yekitiyê her çi zûtir dest bi çandina wê bê kirin.

Ku Hindistan'ê bazarkirina xurekên OGG hêdî kiribe, ev yek nayê wê me'nayê ku Hindistan berê xwe dide rêyeke din: bi pêçevane, her tişt hazir e ku ew bibe navenda cîhanî ne tenê ji bo serfa giyayên OGG lê belê herwiha ji bo dahênan, duristkirin û bazarkirina wan. Bacanêreşa bi navê "Bt" (ji ber ku tê de bakteriya Bacillus thuringiensi heye), yekem sewziya OGG ku ji bo serfa mirovan hatiye duristkirin, bêguman nabe ya dawî.

Piştî serkeftina pembûyê Bt, ku niha çandina wê bi xêra kampanyayeke reklamê ya gelek xîretkêş û serhişk li sertaserê welatî berbelav e, Mahyco xwe amade dike ji bo derxistina hejmareke mezin a berhemên ziraî yên genetîk-guhertî, û piştgiriya hukûmeta amerîkayî ku bi rêya United States Agency for International Development (USAID) jê re tê, gelek hander e di pêşxistina wan projeyan de. Ew saziya navhatî, piştgiriyê dide belavbûna wan berheman li welatên di rêya geşedanê de, û erka wê yekê jî dispêre –qet ne cihê heyirînê ye– gewre-şirketên agroalîmenterê (Agroalîmenter: Kar û bazara berhemên kiştûkalê) ên amerîkayî û hevkarên wan. Bi rêya projeya xwe ya piştgiriya li biyoteknolojiya ziraî (Agricultural Biotechnology Support Project, ABSP) bû ku beşdarî kir di duristkirina bacanêreşa Bt (1) de; û mûz, piste, papaw (fêkiyeke tropîkal) bacanesor û birinc jî dê bidin dû.

Stratejiya USAID'ê qet naguhere: li dû "modêla xwe ya îdeal", her hewl dide ku lêkolînên li zanîngehan bigihîne ticarîkirin û bazarkirineke bilez –bi vî rengî, şirîkatiya sektora giştî û ya taybet pêk tîne. Bo nimûne, ji bo bacanêreşa Bt, Mahyco'yê li Hindistan'ê xwe sparte Tamil Nadu Agricultural University, yek ji beşdarên projeya ABSP'yê, herwiha hevkarî digel Cornell University'yê (2) kir ku hevkarê bingehî yê Monsanto'yê ye li Dewletên Yekgirtî. Li ser lîsta beşdarên ABSP'yê, bi qasî zanîngehên amerîkayî, yên biyanî jî têne pêş çavan, herwiha şirketên endazyariya genetîk ên wekî Monsanto û Mahyco, Nunhems Seeds (Bayer) û Sathguruya şirketa rawêjkariyê di warê sektora berhemên ziraî de –ku ew şirketa navhatî li ser malpera xwe behsa " şirîkên ticarî " yên ecêb dike: wezareta kiştûkalê ya Amerîka'yê (USDA), USAID, Cornell University û ABSP (3). Di têkeliyeke wiha de gelek zehmet e mirov bikare xeta nîşankirinê ya di navbera berjewe- ndiyên taybet û samanên giştî de destnîşan bike.

Ev xumamî qet ne ji xwe ve ye. Di demekê de ku bal û dêna herkesî li ser lihevhatina derheqê meseleya nûkleerê de bû, ku ji 2005'an ve Washington û New Delhi'yê gotûbêj li ser dikirin, wan her du dewletan peymaneke din girê da ku potansiyela netîceyên wê yên cîhanî qet nebe bi qasî meseleya nûkleerê girîng e: "Rêkeftina Hindistan û Dewletên-Yekgirtî li ser perwerde, lêkolîn û peywendiyên bazirganiya ziraî" (India - United-States Agricultural Knowledge Initiative – AKI). AKI ya ku Serokwezîrê Hindistan'ê Manmohan Singh û Serok George W. Bush di 18'ê Hezîrana 2005'an de mor kir, diyar dike ku, "zanîngehên amerîkayî dê beşdariyeke çalak bikin di avakirina bingehên sîstemeke perwerde û lêkolînên di warê kiştûkalê de li Hindistan'ê" û pêşniyar dike ku "şirîkatiyeke nû bê avakirin (4)" di navbera welatên navhatî de. Di Lijne ya rêveberiyê de, ku bi wê helkeftê hatiye avakirin, du dêwe-şirketên bazirganiya berhemên ziraî, anku Monsanto û Archer Daniels Midland, û Wal-Marta (5) şampiyona zemînên fireh, beşê "taybet" ê aliyê Amerîka'yê temsîl dikin.

AKI armancên New Delhi'yê bi zêdeyî têr dike, lewre New Delhi hem dixwaze xureka nu-

* *Lêkolîner di World Policy Institute ya li New York'ê, nivîskara Planet India: L'ascension turbulente d'un géant démocratique, Actes Sud, Arles, 2008*

Rustem Aghale - Efekt LMD kurdî

fûsa xwe ya her-qerebalixtir teqez bike û hem jî welatî veguherîne "civaka zanyariyê" da ku şirket û aboriya Hindistan'ê di rêza yekem a cîhanê de cihê xwe bigire. Heman modêla pêşwaziya "cihguhêziya" (delokalîzasyon) xizmetên şirketan (hesabdarî, xizmetên piştî-firotinê her digel navendên agahdariyê, enformatîk...) ku bû motora mezinbûna aboriya Hindistan'ê, vê carê li sektora kiştûkalê disepîne. Bêguman, bi ya prensîbên dîplomasiya wê ya "bi geometriyeke guherbar", New Delhî hêj jî razî nebûye li bal Rêxistina Cîhanî ya Bazirganiyê (RCB) û di çarçoveya xeleka Doha'yê de, sektora kiştûkalê bi temamî lîberalîze bike. Lê belê, nakokî bi tenê di zahirê de ye. Lewre di her du rewşan de jî, rayedar li dû ne ku berjewendiyên grûbên xwe yên mezin biparêzin.

Pirsa kiştûkalê cihekî tekane digire li Hindistan'ê: Di berbanga serxwebûna wê de, kêmasiyên xurekî ew xiste halê şermnak ê parsekan li ber Dewletên-Yekgirtî ya ku heta gewriyê bi zad û dexlî ve tijî bû (6). Hubert H. Humphre yê senatorê hingî yê Minnesota'yê, bi armanca avakirina bendekê li ber komûnîzmê li welatên nû ji kolonyalîzmê rizgar bûyî, pîlana wê yekê darişt ku kiştûkala amerîkayî veguherîne "çekeke dîplomatîk" û xurekên edetî yên her welatekî biguhorin û li şûna wan xurekeke li ser esasê berhemeke ticarî ya Dewletên-Yekgirtî binecih bikin. Humphrey dibêje ku mesele, duristkirina zewq û çêja zarokên biyanî bû, bi taybetî di kantînên xwendingehan de: Japonên hûrik dê li nanî bibanin, hevtemenên wan ên yugoslav dê xwe fêrî vexwarina şîrê toz ê amerîkayî bikin li şûna şîrê taze yê deverê. Li Hindistan'ê, "zarokek dê tiliya xwe dayne ser kereyê heliyayî û biçêje û bi dengekî hijmekar û evîndarane bêje: "Amerîka" (7)"

Hingî "şoreşa kesk", bi alîkariya amerîkayî ku bi navbeynkariya weqfên Ford û Rockefeller'ê dihate veguhastin dest pê

kir. Welat bi vî rengî ji xelayê xelas bû, lê belê bêyî ku bazara xwe ya berhemên ziraî bi temamî azad bike; û serxwebûna bazarê ne piştî vebûna welatî bo sermiyanê biyanî di 1991'an de, ne jî piştî nêzîkbûna stratejîk a digel Washington'ê li jêr serokatiya Bush pêk nehat.

"Şoreşa kesk" bêguman kir ku hilberîna zad û dexlî bi rêjeyeke girîng zêde bibe (ji heftê milyon tonên 1954'an bo dused û du milyon tonan îro), lê belê, Hindistan'ê bihayê wê pir bi giranî da: Ziwabûn û çikbûna avên kanalan û bîrên binerdî, qirêjîbûna erd û zeviyan, deyndarketina cotyaran (ji wan zêdetir ji sed hezar kesî di nav dehsalekê de xwe kuştin), rêjeya qansera ku li nav gundî û cotyaran bi çargavî zêde dikir. Tesîrên wê yên li ser siyaset û civakê jî têra xwe girîng bûn. Bi vî rengî, gelek kes wisa difikire ku netîceyên şoreşa kesk bûne fakterên bingehî ji bo derhatina raperrîna serxwebûnxwaz a li Pencab'ê ya salên 1980'an –di heyama wê hereketê de Serokwezîr Indira Gandhi, di 1984'an de, ji aliyê muhafizên xwe yên Sîxî (dînekî yek-xwedayî ku hêmanên Îslam û Hîndûîzmê digihîne hev) ve hate kuştin.

Îro, birs dîsa li ser serê welatî çerxan dixwe – % 40'ê zarokên mexdûrên bed-xurekiyê li cîhanê li Hindistan'ê dijîn. Kiştûkala wê di bin gefa tesîrên guherîna klîmatîk ên li ser mûsonê ye, herwiha kêmasiya cidî ya avê (8) û berfirehbûna bajaran û warên endûstriyel ku erdên çandinbar kêmtir dike, xeterên mezin in li ber sektora kiştûkalê. Heke Hindistan bi şiklekê ku netîceyên girîng bi dest bikevin mezinbûna sektora kiştûkalê pêk neîne –ku niha sektora navhatî li dor % 2 ye di demekê de ku mezinbûna global, îsal, serera qeyrana aborî ya cîhanî, dê bigihe % 7'ê– nikare bi têra nufûsa xwe xurekê teqez bike û nagihe hedefên xwe yên mezinbûna aborî (% 8 hetta % 9). Çaverê ye ku AKI jê re veberhênanên dêwane bîne û herwiha bike ku veguhastina teknolojî û binesaziyên endûstriya ziraî pêk bê. Xelatên pir erzan in, lewre beramberî van qenciyan, bi tenê mafê çêkirina berhemên ticarî ji zanyariyên vê sine'etê li ba şirketên pir-neteweyî dimîne û hew.

Wiha tê ber çavan duyemîn "şoreşa kesk" ku Washington teqdîm dike. "Dewletên-Yekgirtî dixwaze bazirganiya xwe ya ziraî digel Hindistan'ê zêdetir bike. Ev yek di berjewendiya her du aliyan de ye; lê belê, ev yek dimîne ser veguherandina sektora kiştûkalê ya Hindistan'ê. (9)" Ev gorankarî pêşî dê li zanîngehên Hindistan û DYA'yê pêk bên û lêkolînerên Hindistanî dê bêne vexwendin bo zanîngehên DYA'yê. Piştre lêkolîner, herwekî ku ev bi dehsalan e li Dewletên-Yekgirtî gelek caran çêdibe, dê ji zanîngehan derkevin û di gewre-şirketên agroalîmenter de cihê xwe bigirin: Piştî ku di sektora taybet de bi xêra mûçeyên pir zêde qazanceke mezin bi dest xistin, bo nimûne dê bibin rayedarên payebilind di wezareta kiştûkalê de û wezîfeya wan dê ew be ku tesîr û netîceyên wan berhemên endazyariya genetîk kontrol bikin ku ji aliyê karderên wan ên berê ve bi rêjeyên pir zêde têne duristkirin.

Serhatiya Michael Taylor vê diyardeya ku jê re dibêjin "dergehê zivirok" (revolving door) gelek baş dinimîne: piştî ku di nav kadra Monsanto'yê de xebitî, derbasî USDA'yê bû ku wê çaxê wê wezaretê destûr dabû xistina nav bazarê ya hormona mezinbûna gayan rBgh ku şirketa pirneteweyî durist dikir. Ji wir re derbas bû Zanîngeha George Washington û li wê derê, şagirtên Hindistanî jî tê de, kadrên ciwan perwerde kirin da ku ew şagirt paşê vegerine welatên xwe. Herçend nûçeya bicihkirina hevdeke biyolojîk di nîveka çîmenên Qesra Spî de, ku vê heyamê hate ragihandin, tesîreke sembolîk û girîng kiribe jî, USDA û endûstriya agroalîmenter hêj jî pir ji nêzîk ve peywendîdar in; Michael Taylor di nav rawêjkarên rêveberiya nû de cih digire (10).

Stratejiya Dewletên-Yekgirtî di wî warî de ew e ku li Hindistan'ê rola sektora giştî kêmtir bike. Lewre Hindistan ware awantajên tekane ye: cotyarên feqîr ku ne di rewşeke wisa de ne ku beramber tovên ku ji wan re têne firotin pirs û kêşeyan saz bikin; erd û zeviyên çandinbar ên gelek berfireh; bazareke bi potansiyeleke dêwane; rayedarên payebilind ku di rexekî re gelek dilxwaz in ji bo her çi cûre çareseriyên teknolojîk û di rexê din re hindî ku bêjî bizdiyayî ne beramber tirsa ji birs û xela û pabendiya derekî. Lê belê, şirketên pir-neteweyî yên amerîkayî ne bi tenê ne jî bo dariştina pîlan û projeyên derbarê îmkanên ku xwemalîkirina kiştûkalê pêşkêş dike. Şirketên ewrûpayî Syngenta, Bayer CropScience, Carrefour, Tesco, herwiha grûbên hindistanî Tata, Bharti, Reliance û Mahindra, digel gelekên din, di rêzê de ne.

Bi taybetî Tata'yê, bi şirîkatiya Cornell University'ê, li ser modêla amerîkayî, Tata Educational Development Trust ava kir –ku Ratan Tata yê rêveberê grûbê xwendina xwe li wê zanîngeha navhatî biribû serî. Di 2008'an de, wî 50 milyon dolar dan saziya navhatî –ku nîvê wî pereyî çû ser hesaba Tata-Cornell Initiative in Agriculture and Nutrition, saziya ku li ser Hindistan'ê xebatên xwe bi rê ve dibe; nîvê din jî wekî bûrs li şagirt û lêkolînerên ciwan ên li Cornellê qeydkirî tê belavkirin. Her di wê çarçoveyê de, şirketa Rallis, lîderê kîmyaya ziraî ya Hindistan'ê û jêrşaxeke grûba Tata'yê, "biryar da ku bi awayekî cidî dest bavêje bazirganiya tovên" melez û pempûyê genetîk-guhertî (11).

Hesab û helsengandinên amerîkayî tesdîq dikin ku Hindistan "dikare bi têra xwe hilberîne di warê berhemhênana xurekî de bi rêya sepandina biyoteknolojiyê di warê çandiniya xurekî de (12)". Ev qas hêsan e gelo? Bi ya raporteke –"Helsengandina navneteweyî ya zanist û teknolojiyên kiştûkalê ji bo geşedanê" (IAASTD)– ku Unesco"yê (Rêxistina Neteweyên Yekgirtî bo Perwerde, Zanist û Çandê) di nîsana 2008'an de belav kiriye, bi kêmî çarsed zanyar û bispor jê biguman in.

IAASTD alarmê lêdixe ji bo rewşa xerab a sîstema hilberîna berhemên çandiniya endsûrtiyel: "Bi salan, agronomî (zansita kiştûkalê-kiştûkalnasî) li ser esasê berbelavkirina teknolojiyan hatibû danîn ji bo bilindkirina hilberîneriyê di warê çandin û birêvebirina zevî û erdan de; herwiha zanista navhatî bala xwe dida ser bazar û mekanîzmên sazûmaniyê, ku tê de modêla giştî li ser esasê nûkirina daîmî bû, û ser daxistina bihayê kirrîna ji hilberîneran. (13)" Beramberî netîceyên pozîtîf ên di warê hilberînê de zerereke mezin gihiştibû yeksaniya civakî, şiyana kollektîfên deverî bo çêtirkirina sine'eta xwe û çandiniya xwe, û jîngehê ku êdî gihiştibû hed û hidûdên xwe yên berhemdan û wergirtinê. Raporta Unesco'yê fikarên cidî pêş dixe sebaret bi çareseriyên bes teknolojîk û bikêriya hilberîna OGG'yan dixe jêr pirsyaran û balê dikêşe ser xeterên wan ên potansiyel. Qet ne cihê heyirînê ye ku Dewletên-Yekgirtî bi taybetî hevbîrnebûna xwe sebaret bi van netîceyên raportê aşkera kiribe.

Wisa diyar bû ku qeyrana cîhanî ya heyî dê dergehê sîstema New Delhi'yê bêtir bigirta li dijî argumanên amerîkayî. Lê belê, wekî ku civîna herêmî ya Forûma Davos'ê, ku di mijdara 2009'an de li Hindistan'ê bi rê ve çû, nîşan da, rayedarên Hindistan'ê ji hemû gavên berê zêdetir ketine ber tesîra şirîkatiyên sektorên giştî û taybet; herwiha veberhênerên biyanî vexwendine welatî da ku têkevine nav bazarê û ji bo wê jî her zêdetir aboriya xwe lîberalîze kirine.

Bi heman awayî, çaverê bû ku soza xweşik a Barack Obama ya sebaret bi gorankariyeke rasteqîn di siyaseta derekî ya Dewletên-Yekgirtî de, heta dereceyekê di baskê kiştûkalê de jî xwe nîşan bide. Lê belê bi pêçevane, wezîra karûbarên derekî Hillary Clintonê rê û rêbazên berê xurttir kirin, û niha, bi pîşandina Rajiv Shah bo serokatiya USAID'ê –ku Rajiv Shahî berê çi li USDAyê û çi li Fondation Gates'ê bi pêşxistina OGG'yan alî û helwêsta xwe aşkera kiribû– girîngiyeke zêdetir dê bikeve para endazyariya genetîk di "geşepêdana" welatên feqîr de.

Lê belê, di serî de Monsanto, gewre-şirketên agroalîmenterê, qet hesab nekiribûn ku bizav û çalakvaniyeke wiha dê pêk bê li dijî bacanêreşa OGG. Berî girtina biryara xwe ya paşxistin û hilawistina sepandina projeya bacanêreşa OGG, Jairam Rameshî civînên giştî çend beramber zêdetir kirin. Wî guhê xwe da hemû argumanan, hetta yên hûrde-hilberîneran jî, –ku ji hemûyan bêtir di bin gefê de ne– û ev gengeşî gelek bi berfirehî di medyayê de hatine belavkirin. Di beyana xwe ya çapemeniyê de, di 9'ê Reşeme ya 2010'an de, behsa şefafiyê, hizirînê û bi taybetî behsa girîngiya hişyarî û îhtiyatê dike berî wergirtina biryarê. "Gava ku hevbîriyeke zelal nebe di civata zanistî bi xwe de, ku muxalefeteke xurt hebe di nav hukûmetên dewletên cihê de, ku rayedarên komelgeya medenî her zêdetir pirsên girîng bikin bêyî ku bersivên tetmînker wergirin, ku raya giştî ne layengirê bacanêreşa Bt be (...) û ku hîç eceleya xistina wê ya nav bazarê nebe, berpirsiya min e ku guh bidime prensîba îhtiyatê û biryara moratoryûmê bigirim (14)."

Werger ji fransî
Ergin Opengîn

(1) www.absp2.cornell.edu

(2) B. V. Mahalakshmi, " Cornell researchers get nod for Bt brinjal trials ", Financial Express, 25 Îlon 2007.

(3) www.sathguru.com/management_consulting.php

(4) Li ser malpera wezareta kiştûkalê ya Hindistan'ê: http://dare.nic.in/usa.htm; li rexê Dewletên-Yekgirtî: www.fas.usda.gov/ICD/india_knowl_init/factsheet.asp

(5) www.fas.usda.gov/icd/india_knowl_init/board.asp

(6) Di 1960'an de, % 92'yê alîkariya aborî ku Dewletên-Yekgirtî li Hindistan'ê kir di rêza alîkariya xurekî de bû.

(7) Hubert H. Humphrey " Food and Fiber as a Force for Freedom ", Raporta bo Senatoyê (Public Law 480, 83D Cong.), Washington, 21 Nîsan 1958; http://bulk.resource.org/gao.gov/83-480/000042EC.pdf

(8) Bixwînin Bénédicte Manier, "L'eau en Inde, un enjeu social et géopolitique", Planète Asie, 1 Reşeme 2010.

(9) David C. Mulford, "Indo-US Economic Cooperation: Developing a Strategy for Closer Partnership", New Delhi, 6 Adar 2007

(10) Jeffrey Smith, "Obama's Team Includes Dangerous Biotech 'Yes Men' ", Huffington Post, 30 Mijdar 2008

(11) Yassir A. Pitawala, "Rallis plans foray into seeds business", Financial Chronicle, Bombay, 16 Adar 2009.

(12) Sourav Mishra û Abishek Shankar, "GM crops can meet India's food, biofuel needs", Reuters India, 25 Reşeme 2008.

(13) Raporta IAASTD'yê: http://www.agassessment.org/

(14) Jairam Ramesh, Ministry of Environment and Forests, Decision on Bt-Brinjal, 9 Reşeme 2010.

http://moef.nic.in/downloads/public-information/minister_

Rustem Aghale

Di sala 1969'an de li bajarê Koy'e ji dayik bûye.
Di sala 1989'an de li koleja hunerên ciwane beşa wênekêşiyê tewaw kiriye. Di navbera salên 1989 û 2000'an de li Koy, Silêmenanî û Hewlêr'ê 12 pîşengehên taybetî vekiriye.

Di navbera salên 1993 û 1997'an de jî li welatên wek Swêd, Amerîka, Awûstûralya, Brîtanya, Awûstûrya, Îtalya, Fransa tevlî gelek pêşengehan bûye.

Di sala 2002'an de wek nûnerê Kurdistan'ê tevlî festîvala Binenalle bûye.

Rustem Agale niha li bajarê Silemanî li Galeri ya Zemwa xebatên xwe didomîne.

PIRTÛK

Salên bîstî li Havana'yê

FRANÇOISE BARTHÉLÉMY

Various - Cuban art dancers - Efekt LMD kurdî

Çend seyr û ecêb e biservebûna vê romana nayab a nivîskar Enrique Serpa (Havana, 1900-1968), ku klasîkeke edebiyata kûbayî ye. Di 1938'an de hatiye belavkirin û ev yekem car e tê wergerrandin bo zimanê fransî. Roman dîmeneke têr û tesel a Kûba ya destpêka sedsala bîstan dide. Lê belê dewlemendiya wê, ji bilî pirsa civakî, ji ber tehlîla wê ya ruhê mirovî ye ku vê yekê bi rêya gelek kesayetên romanê, ji wan keştîvanê qisetkerê pirhêl û kompleks, dike. Ewê ku kesên derûdora wî bi tinazî jê re dibêjin "Amîral", an jî "xweşikê deryayan", guhê wî gelek li ser zerafet û şayîkiya xwe ye lê hergav nerihet e ji halê xwe, tim şik û heqaretê li xwe dike, her li dû ye ku bê naskirin, çi ji aliyê deryavan û masîgiran ve û çi ji aliyê wan fahîşeyan ve ku digel wan sihheta xwe wêran dike.

Hizrên xwe dişibîne "mar û marîjokên kor" û li xwe mikur tê ku tu tiştbala wî nakêşe. "Dil û hinavên min xalî bûbûn, mêjiyeke mijî, min nema dikarî qedeman bidim ber xwe, mîna keştiyeke bêdûmen ku ketibe ber pêlan bê ber û bê armanc diçûm." Sê keştiyên masîgiriyê yên bavê wî jê re mîrat mabûn, lewma dev ji karê xwe yê kîmyageriyê di American Sugar Company'ê de berdabû da ku bibe pişkdarê qedera ekîba La Buena Ventura'yê, şixûneke (cûreke keştiya bi çend tîrikan) ku berê keştiya geştê bû û piştî hingî bûbû ya masîgiriyê.

Lê kîjan karker dikare wê çaxê bi vî karî debar bike? Mal ji teleb û pêwîstiyan zêdetir e, bi taybetî ji ber "chinetoque"'an ku li peravê bi cih bûbûn, bêmalbat bûn û daxistina bihayê masiyan pir bi kêrî wan dihat. Herwiha ji ber "ew keştiyên bêxêr ên bisarinc ên Amerîkî" ku bi tonan masiyan bi erzanî difiroşin. "Amerîkî li vir wekî ku li mala xwe ne û me mîna mirîşkan dirûçikînin", dibêje Pablo Alonso, yek ji wan deryavanan ku "zarokên wî bêderpî ne û ji nêza dimirin." Heman sefalet li nava welatî jî heye, wekî ku li gundikê Boca de Jaruro, "mêr, jin û zarokên zeîf wekî darikan, ji nêza li ber mirinê, çerm lê zer û bêreng û giyan lê req û bêtaqet di nav kox û kûrikan de dijiyan."

Gelo çawa dabîn bikirana pêwîstiyên jiyanî, çawa têbikoşiyana beramber bêdadiyên civakekê ku dewlemendên kevn û nû lê diçerixîn, beramber xemsariya hikûmeta ku piştî hilbijartinan hemû sozên xwe ji bîr dikirin? Bi rêya rêkxistina karkeran. Û bi grevê. Şarezayê bêqusûr ê herêmê Enrique Serpa, ji îstifaya Martinê pîr bigire heta digihe çalakvaniya fedakarane ya Pepe le Catalan'ê ku li şûna gotarên anarşîst-sendîkalîst ên ji Spanya'yê hatî xwe dispêre hewl û çalakiya komûnîstan, hemû çepera hizr û bîrên cihêreng pêşkêş dike.

Gelo rêyeke aqilane bû ya wan yên dawiyê? Wisa difikire ku, "herçend hizrên wan pir seyr û xerîb bin jî, ji halê heyî xerabtir nabe." Lê belê, şoreş ne di bîr û xeyala herkesî de ye. Nemaze şoreş ne li ber guhê Requinê patronê La Buena Ventura'yê ye.

Ji bo bidestxistina edaletê dixwazin dest bavêjine qaçaxçîtiya alkolê berev Dewletên Yekgirtî û hemû rûdanên ku têne serê wan û di romanê de têne qisetkirin li dora vê projeyê dizivirin. Pêwendiyên seyr ên di navbera Amiral û Requin de dibine sebebê berhevbûna gelek hestên nakok ku nivîskar pir bi hostayî û deqîq lê dikole. Bo nimûne, ev hevoka hanê ku ji bo derbirrîna ezameta xwezayê lê dike: "Hingur sor û nerm bû wekî guhên heremasiyan û, li deverinan, wekî zikê sedefeke mezin." Bedewî veniştiye ser van rûpelên lerzan ku ji nişkê ve "aramiyeke bêdawî" lê der dibe bi ser dilê qaçaxçiyî ve gava ku nazikî û zerafeta dayîka xwe ya ku jê re çîroka pîroz digot bi bîr tîne.

(Wergera ji spanî Claude Fell û pêşkêşkirina Eduardo Manet; Zulma, Parîs, 2009, 327 rûpel, 20 euro)

Wergera ji fransî
Ergîn Opengîn

Le Monde Diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

Editorê giştî
Faysal Dağlı

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH

Kaiser-Wilhelm-Ring 27-29
50672 Köln / Almanya

Desteya rêvebirîyê
Murat Satık
Rıza Dinç
Metin Göktepe
Faysal Dağlı

ALMANYA
Le Monde Diplomatique kurdî (kurmancî)

Şêwirmenda weşanê
Berîvan Aymaz

Asîstanta edîtor
Semra Polat

Asîstantê weşanê
Sharo İbrahim Garip

Werger
İbrahim Seydo Aydoğan, Ergîn Opengîn, Lokman Turgut, Azad Kurdî

Rêvebirê hunerî
Hasan Hüseyin Deveci

Designer
Mehmet Nazmi Demir

Tlf: 00 49 (0) 221 56 94 162
Fax: 00 49 (0) 221 56 94 200
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

KURDISTAN
Le Monde Diplomatique kurdî (soranî)
Ji aliyê Rûdaw Media Company ve tê weşandin

Tlf: 00 964 (0) 750 488 56 96
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media Company
Caddeyî 100 Metre, Hewlêr,
Kurdistan / Îraq

FRANSA
Le Monde Diplomatique

Damezrêner
Hubert Beuve-Méry

Rêvebir
Serge Halimi

Sernûser
Maurice Lemoine

Cîgirên sernûser
Martine Bulardi, Philippe Rivière, Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh, Mona Chollet, Pierre Rimbert, Dominique Vidal

Rêvebirê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand, Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH
Post Bank
Konto: 371219609 - BLZ: 50010060
IBAN: DE84 5001 0060 0371 2196 09
BIC: PBNKDEFF

Almanya:
Salane: 40 euro - 6 meh: 20 euro
Dervayê Almanya:
Salane: 50 euro - 6 meh: 25 euro